

NÜDEM

NO 1-1992

Kıvıra Huneri, Edebi ü Candi

www.netewe.com

NÛDEM

NO 1-1992

Kovara Hunerî, Edebî û Çandî

Xwedî û berpirsiyarê giştî: Firat CEWERÎ

NAVEROK

ÇEND GOTIN- Firat CEWERÎ	3
RONDIKÊN ÇAVAN - H. KILIÇ	5
BIHARA HELEPÇE - H. KILIÇ	8
ÇEND WÊNE JI XWELIBAKIRINA HELBESTVANEKÎ ÇAR SALÎ- Ehmed HUSEYNÎ.....	10
BEYAN - Arthur RIMBAUD	16
MORÎKÊN ŞÎN ... EWR Û DÛRBÛN- Mihemed Effî HUSEYNÎ	18
EVÎN - Derwêş M. FERHO	21
PERUK - Lokman POLAT	24
ELA 'EDDÎN SICCADÎ DI DERHEQA MELEYÊ CIZIRÎ DE - M. MAYÎ	26
TERMÊN EDEBÎ - Rojen BARNAS	29
EDEBIYATA KURDÎ YA SURGUNÊ - Firat CEWERÎ	37
CIHEKÎ PAKIJ Û ROHNÎ - HEMINGWAY- werger: Dr. POLOÇO	52
DI BASÊ DE - Hussên HEBEŞ	55
NISÊBÎNÊ - Musa ANTER	57
MEZOPOTAMYA - Edward PETÊŞKA- Werger: Loran CENGÎN	58
ŞEV Û ROJ Û XOZÎ - B. AKREYÎ	61
VICTOR HUGO - Werger: Firat CEWERÎ	65
ŞERÊ AZADYÊ - Bareş BATTE	68
EHMEDÊ XANÊ - Zeynelabidîn ZINAR	71
YÊN BAWERMEND Û "HINDIYÊN SOR" - Şahînê B. SOREKLÎ	77
BA YÊ PAYIZÊ - Arjen ARÎ	80
KURDINO, BI KURDÎ BIXWÎNIN - Îbrahîm AL	82
ETNOGRAF Û FOLKLORÎST FARUK HAFÎD -Dilower MÊQERÎ	84
QAMÎŞLOKA BAVÊ FELEK - Mervanê KELEŞ	88
YILMAZ GUNAY - Koyo BERZ	91
J.P. SARTE Û EST BÎYAYENI - Faruk YAKÛP	100
KARÎN BOYE - Wergernayîşi: Faruk YAKÛP	103

Hevkarê Swêd: Dilower Mêqerî • Hevkarên Swêd yê beşa Zazakî: Koyo Berz, Faruk Yakûp
Hevkarê Danîmarka: Hazim Kiliç • Hevkarê Awistralya: Ş. B. Soreklî • Hevkarê Belçika: D. M. Ferho
Navnîşan: Gamla Landsv. 36, 740 41, Morgongåva, Sweden • Tel: 0224-61428 • Telefax: 0224-61428
Şerdên abonetiye ji bo salakê: Swêd 190 Skr. • Tirkiye 140 000 TL. • Ewropa û Rojhilata navîn 50 DM.
Amerika û Awistralya 39 \$ • Reklam: Rûpela dawî bi reng 2000 Skr, rûpelên nêvî 1200 Skr, nivêrûpel 750 Skr.
Çap û pergela rûpelan: APEC- TRYCK & FÖRLAG

Wêneya bergê: Lala Abda Amîn Rahim



Abdul-Karim Ali - "Einstein" (1989, 195 x 130 cm)

ÇEND GOTIN

Firat CEWERÎ

Ev demek dirêj bû ku em li derxistina kovarek hunerî, edebî û kulturî difikirîn. Erê, em lê difikirîn lê me dernedixist. Her cara ku em bi hin hevalên nivîskar û hunermend re dihatin ba hev, em bi saetan li ser valahiya kovarek hunerî, edebî û kulturî dipeyivîn, me li ser derxistina wê pîlan çêdikir, me li ser belavkirin û abonetiya wê nêrînên xwe digotin, me xweş li hev dianî, lê piştî ku em ji hev diqetiyên û her kes diçûne malên xwe, me her tişt ji bîr dikir, an jî ku me ji bîr nekira, me digot, di demek wilo de derxistina kovarek di vî celebî de gelek zehmet e û me derxistina kovarek dihiştê rojên pêş. Ev neh-deh sal di ser wan rojan de derbas bûn, hê jî ew kovara ku em lê difikirîn derneket. Her çiqas di navbera van salan de kovarin kurdî yên hêja û bi qîmet derketin jî, dîsan ew kovara ku di bîr û hizra me de bû, ku hemêza wê ji hemû hunermend û nivîskarên kurd re vekirîbe, derneket. Bi armanc û hêviya dagirtina wê valahiyê me xwest em li arşiv û pirtûkxana kurdî berhemek din jî zêde bikin. Wek tê zanîn ev kovar ne ya pêşî ye û ne jî wê bibe ya dawî. Lê wê bixwaze di vê govenda ku

diherike de bibe serkêş. Armanca wê a sereke ew e ku di riya gel de be, ji bo vejandina zimanê kurdî û ji bo pêkanîna edebiyata kurdî ya nûjen bibe bingeş.

Her çiqas di vê hejmarê de em negihîştin navê hemû hevkarên binivîsin, lê hevkarên kovarek ji hemû perçeyên Kurdistanê ne û bi vî awayî em ê bi hêsanî bikaribin di derheqa edebiyata kurdên Iraqê, Iranê, Sûriyê, Sovyetê û Ewrûpayê de nûçeyên nû bibihîzin û kovar wê bixwaze bi vî awayî di navbera kurdên perçekirî de bibe pireya hevdu nasîn û hevdubihîstinê. Ger wek em fikirîne em bi ser kevin, wê kovara me bi xwe re ekolekê bigihîna. Ev ekola ku bi kovara me re bigihê, hêviya me ew ku di pêserojê de navên wan di rex navên nivîskarên dinyayê yên navdar de bêne dîtin.

Her çiqas hin hevalan xwestin ku em kovarek ji mehê carekê derxin jî, dîsan biryara jî sê mehan carekê hate dayin. Me got, em bi sozên mezin karên biçûk nekin, lê ku ji me bê em ê bi sozên biçûk karên mezin bikin. Vêca di pêş de me dît, ku hebûna kovarek bi vî babetî hewce ye û ji bo derxistina wê jî me hin îmkân bi

dest xistin, wê çaxê bê şik e, ku em ê ji mehê carekê derxînin.

Ji bo kovarek wilo em heya niha bi pîrraniya nivîskar û hunermendên kurd re peyivîne; bersivên pîrraniya wan jî her erîfî bûne û ji bo her celeb alîkarî piştgiriya xwe nişan dane. Vê yeka ha jî hêvî da me û em hê bêtir li derxistina kovarek wilo gurr kirin. Lê dibe ku me hin nivîskar û hunermendên kurd di vir de ji bir kiribin, bila li me bibûrin, ger me ew ji bir kiribin, tenê jibîrkin e û ne tişteki din e. Ji niha ve em ji wan hevalan uzra xwe dixwazin û em li bendî alîkarî, piştgirî û berhemên wan yên hêja ne.

Wek em fikirîne, wê kovara me "NÛDEM" bi kurtayî ji van celebivîsan pêk were: Çirok, helbest, perçeroman, rexne, hevpeyvîn, lêkolîn, werger, edebiyata dinyayê ya modern û klasik, klasikên kurdî, xelatên navneteweyî, sînema, tiyatro, nivîsên li ser edebiyat, huner û kulturê, wêne, karîkator û hwd. Ji bilî van jî

beyî ku em ji çarçeva kovarê bi dûr kevin, em ê di pêşerojê de bikaribin hin nivîsan lê kêm, an jî lê zêde bikin. Ji bo vê yekê jî em bi hevalan şewirîne, me raya wan girtiye û ji gelek fikran ev fikra ha derketiye.

Wek gelek heval pê dizanin, ku aboriya vê kovarê ji keda şexsî peyda bûye. Lê ji bo ku kovarek wilo berdewam be û jiyanek dirêj bijî, wek her karî ji bo wê jî alîkariya aborî lazim e. Alîkariya aborî jî abonetî ye. Ger em li kovara xwe xwedî derkevin, wê biparêzin, wê bixwînin, belav bikin, bibin abone û jê re abonan bibînin, wê kovara me nemire, jiyanek dirêj bijî û bibe "HAWAREK" nû.

Ez jî niha ve ji hemû kesên ku alîkarî û piştgiriya xwe ji kovarê re nişan dane, spas dikim û herweha ji nivîskar û hunermendên kurd re jî spas dikim, ku bi berhemên xwe yên hêja kovara me xemilandine.

Heya hejmarek din bimînin di xweşiyê de.

(Name; ji keçzarokeke Helepçe)

RONDIKÊN ÇAVAN...

H. KILIÇ

*Bila xanî neyên xirab kirin careke dî,
Bila kes balefirên bombebarandinê nizane.
Bila şev tîjî bin bi xewê.
Bila bêceza be jîyan.
Bila negrîn dayîk.
Bila mirov mirova nekujin.
Bila herkes xwe bide ser karekê.
Bila herkes serbilind be bi kiryarên xwe
Bila bi dest bêxin ciwan xwestekên xwe
Bila kal jî bi xweşbînî bibînin.*

Bertolt Brecht

14-Adarê ez çûme dibistanê. Piştî te'ûla dawîya heftûyê me dîsa dest bi dibistanê kir... Ez gelek hej dibistanê dikim. Ji hevalên xwe, ji dibistanê pir hez dikim... Mamosta me jineke pir baş û delal e. Wek dayîkeyê ye ji bo me hemûya... Çiku destpêka heftûyê bû, mamosta me digel me yarî kirin, hezkirina xwe nîşanî me da, yek bi yek destê xwe bi serê me da anî... Roja me bi şahî derbaz bû. Em jî pêk ve bi şahî çûn malên xwe... Lê belê mamostê, ji bo roja dî spartinek dabû me ku em li mal hazir bikin. Babeta spartinê wêneya cejna Newroz'ê bû. Her yekê ji me dê li gor xwe wêneyeke şahî û pîroziya Newroz'ê çêbikira...

Piştî ez hatime mal, dayîk û babê min pirsra dibistana min kirin, ka çawa borîye... Min jî gote wan ku spartinek min heye. Babê min pir keyfxweş bû. Got ku ez'ê hevkarîya te bikim. Wê şevê min wêneyeke Newroz'ê bi hevkarîya babê xwe çêkir û bi qelemên rengareng boye kir...

Lê mixabin... Bû spêde min nikarî biçime dibistanê çiku dayîka min nexweş ketibû...

Anku 15'ê Adarê ez li mal bûm. Min nikarî wêneya Newroz'ê bibim nîşanî mamosta xwe, hevalên xwe bidim. Lê belê min wêne li mal bi dîwar ve hilawîst ku ne dirhe daku roja dî bibime dibistanê...

Wê rojê min hevkarîya xwe kir. Dayîka min ne nexweşeke giran bû, lê belê janeserekê ew girtibû ku nedikarî rabe ser xwe, karê malê bike.

Dilê min gelek pê ve dima. Dilê min nedigirt ku ez dayîka xwe wisa bi êş û jan bibînim... Babê min jî çûbû ser karê xwe li çarsûyê. Li milekê dilê min bi dayîkê disot, lê li milê dî jî min berrîya dibistanê û hevalên xwe dikir... Mamosta me, hevalên min... Dema bêhnvedan li navbera dersa dihat, me çawa xwe davête ber deriyê dibistanê... Em çawa dileyizin, me çî yariyên ji hev xweştir dikirin...

Rastiyê bêjim, min ew roj çawa kire êvar niza-

nim. Dayîka min, ji ber ku ez rojekê ji dibistanê dîr mabûm êcarî berxwe diket. Carekê gote min ku ez biçime derve digel zarokên cîrana bileyizim. Dayîka min çawa wisa got, min bi bayê bezê xwe avête derve. Çûme hewşa cîrana lê zarokên wan hêj jî nehatibûne mal. Vêca, êcarî dilê min qûsya. Bi lez hatime mal û çûme ber serê dayîka xwe... Çavê min her li wêneya bi dîwar ve hilawistî bû...

Babê min wê şevê piçekê direng hat... Herşev zû dihat. Nizanim bo çi wê şevê direng ma. Piştî hat, ez nivandim. Berî xewê behsa Newroz'ê dikir babê min... Digot ku dê vê sale bi şahîyeke mezin Newroz'ê pîroz bikin. Bo min libasên nû û spehî kirî bûn. Dayîka min jî dê serê min xena bikira û kezîyên min jî bihûnandina... Wisa digot, hem jî çil kezî... Min gote babê xwe, ew wêneya ku me pêk ve çêkirî bikete nav cantê min yê dibistanê daku ez ji bîr nekim...

Babê min çawa ez maç dikirim... Ecêp, belkî ji leh caran jî zêdetir ez maç kirim... Bi vê lişahiye ez di xew çûm.

Spêdê zû ji xew şîyar bûm. Baş têr xew dibûm... Çawa ji nav nivîna derketim, bezîme nik dayîka xwe... Ve baştir bû. Ew jî rabû, me pêk ve têşt hazir kir. Babê min dîsa direng abû. Bo çi... ecêp. Hal çi, her car zû radibû... Me pêk ve têşt xwar. Paşê ez çûme dibistanê... Berî ku ji mal derkevim, dîsa min li cantê xwe lêrî ka wêne tê da ye an ne...

16 Adarê bû... Çûme dibistanê. Çende dilşa û reyfxweş bûm. Çawa çûme sinifê heval li dora min kom bûn. Pirsîn, ka bo çi ez dûhî nehatibûm. Min jî gote wan ku dayîka min rexweş bû, lewma ez nehatim...

Dersê dest pê kir. Mamosta me hat, rojbaşî di ne da. Berî ku ew tiştêkê ji min bipirse, bi lez min ew wêneya Newroz'ê bir danî ser masa vê. Wisa şa bû... destê xwe bi serê min da anî, reyfxweşî di min da... Hej wêne kir, wisa xûya likir...

W roja me jî wekî rojên dî gelek xweş û bi ahî borî. Mamosta me digot ku ev sale dibistana me xwe amadeyî pîrozîya Newrozê dike. Daku şahîyeke mezin, xweş û geş pêk binin...


Sirûdên li ser Newroz'ê bi me didan ji ber kirin. Hazirîyeke ecêp dihate kirin...

Wekî em di dersê da, me hind bihîst ku gurmînek ji derve hat. Wirwîrek ji esman dihat ku mirov ji ber ker dibû. Herwekî dibistan dile-rizî. Zingezing ji caman hat. Çendek jê şkestin. Me xwe mat kir. Kipînek ji me nedihat. Mamosta me got ku em nederkevîne derve... Ew çû derve ku bizane ew çi deng û gurmîn bû... Paşê hat got ku ew deng, dengê balefirekê bûye hem jî balefireke cengî. Dîyare ku bombe avêtine derdorê Helepçê... Tirs û lerizîneke mezin em girtibûn. Deng ji me dernediket. Qederek çû, mamosta me got ku em biçine malên xwe û qet ji mal dernekevin. Lê belê herweha digot ku em ne tirsîn û roja dî jî dîsa bêne dibistanê...

Wê rojê em verevîn ji dibistanê û çûn malên xwe... Dayîk û babê min jî ji ber min bi xofa ketibûn. Çiku hêj jî tirsî rojê li ser min bû. Ji xwe wan jî bihîstibû ew dengûdor... Wê şevê jî li ser hemû hala, em dîsa bi dilxweşî nivistin. Babê min, dayîka min behsê tiştên pêkenok dikirin daku ez xwe ji bîr ve bikim...

Bû spêde. 17'ê Adarê bû. Babê min zû rabibû û çûbû ser karê xwe. dayîka min têşt hazir kir, ez rêk û pêk kirim û rêkirim dibistanê... Belê wisa melûl melûl li min dinêrî... Berî ku ez ji derî derkevim, ez hilgirtme koşa xwe, maç kirim, maç kirim û rondik ji çavên wê werîyan... Ecêp, çu cara dayîka min wisa nedikir. Ez jî wê rojê bi dilxemî çûme dibistanê... Hevalên min jî wê rojê wekî rojên dî ken û şahî nebûn... Mamosta me jî li me nêrî ku hewayê sinifê ne wekî rojên dî ye... Piçekê hizirî û got ku em biçine teniştê bajêr gestê bikin... Me jî dixwest ji xwe ku em biçine derve, nav gul û kulîlka, mêrg û çîmena, hewayê biharê tijî nav dil û hinavên xwe bikin...

Em bûne rêz, bi dûv hev ketin û çûne betena hindava bajêr. Hewa gelekî germ bû. Der û dor heşîn bibûn. Bêhna biharê ji her derê dihat... Em çawa ghiştne betenê, her yekê ji me xwe li derekê vezeland. Mamosta me jî, ji me ra



behşê biharê, gil û gîya, dara, gul û kulfilka,
mêrg û çîmena, av û çema dikir...

Aha wê gavê bû... Dîsa bû wîrewîra balefira li
ser bajêr. Mamosta me bi dengêkî bilind q'îrya
ku em hema xwe di cihê xwe da deverîyî erdê
bikin... Min jî wisa kir û bêhemdî xwe bi
destên xwe serê xwe girt...Gurmîn û gure
gureke mezin dihat. Lê min tenê ewqas
bihîst... Bêhneke giran bi ber kepê min ket û
êdf ez bêhiş mabûm... Wekî min çavên xwe
vekirî ez li nav bireke leşker û pêşmerga da
bûm...

Dest û pîyên min, piştî min neku sotî,
herwekî kelî bûn... Bêhna min hema dihat
diçû... Eş û jan bêhisab bû. Ji grîn û nalîneke
giran pê ve min tiştek nedibihîst li dorberê
xwe. Ne axiftin, ne grîn ji min bi xwe nedihat.
Tenê ez dinalîm...

Çend ez li wê derê mam nizanîm... Paşê em bi
otomobîlê anîne bajêrêkî Kurdîstana Rojhilat li
Îran'ê... Brîndar gelek bûn...

Paşî midehekê ez piçekê bi ser xwe ve hatim.
Bêhnçikîya min baştir bibû... Belê cihên sofî...
Nexêr, nexêr ew qenc nabin... Nikarim xwe

bilivînim. Baştirîya min ewe ku tenê hişê min
hatîye serê min... Min ew tişt anîn bîra xwe...
Ew çi bû... Çi hat serê me... Piştî ku min ev
tişt anîn bîra xwe, êdî min guh neda jan û eşên
xwe...

Dayîk û babê min li kî derê ne ...Niha ew
bûyne kul û kesera min... Nalîn ne besî min
bû, niha qêrîn jî lê zêde bû...

Babê min, dayîka min çi dikin... Ez dixwazim
biçime nik wan... Gelo mamosta me, hevalên
min çi lê hatin... Ew jî niha wekî min
brîndarin... Ez bo çi li vê derê bi tenê me...

Dayîka min... Spêdehîya wê roja reş çawa ez
maç dikirim... Ez çawa givastibûm di koşa
xwe da wê rojê... Babê min jî wan roja ez
gelek maç dikirim... Di çêkirina wênaya
Newroz'ê da gelek hevkarîya min kiribû... Her
digo "ez gorî" ... Wekî ne digote min "ez gorî"
herwekî min hilgire nav dil û hinavên xwe...
Ka dayîk û babê min... Ka mamosta min... Ka
hevalên min... Wênaya Newroz'ê çi lê hat...

[Name: ji kurzarokekî Helepçe]

BIHARA HELEPÇE

H. KILIÇ

Berî salekê vê demê, meha adarê tîrêjên rojê çawa tîr û germ bûn.

Esman sîrsahî, xwezayê şahîyek dîyarî me kiribû. Hêlma axê, dar û bera, gil û gîya, bêhna gul û kulîlka warê me, ev warê bab û bapîrên me herwekî kiribû goşeyekî beheştê.

Cih û warê me, bi giştî Helepça me bi salane ji xwe tijî jîn û jîndarî bû. Lê belê çu cara hindî wê salê li min xweş û spehî nehatibû. Bi salane em li helepçê dijîn. Bihara wê salê: bêhna xwezayê, tîrêjên rojê, sahiya esman, cûdayî salên dî bû. Vê bijûnahîya xwezayê, jîn û jîndarîyeke xweştir, germ û geştir dabû me hemûyan. Tiştêkî ecêp bû... wiçîna çivîka, jebîna kewa, xwendina bilbila, karîna karik û xerxa jî ne wekî salên dî bû. Leyiza me zarocan jî cûdayî salên berê bû. Ew bihar, bihareke redîtî bû, heçku bihareke taybetî bû... Helepçe rindî bûye Helepçe, bihareke wisa germ, geş û îndar nedîtî bû. Spehîfî û delalîya wê biharê xiftîna rojê bû li her malê, li her kolana xajêr... wê biharê xwûngermîyek, rûkenîyak nezîn dabû me xelkê Helepçe. Keyf û seyran, şahî û dîlan ji tax û malên Helepçe kêr nedîbûn... Em zaro bi hezkirineke mezin û ji

dil diçûne dibistanê...

Xweşî û şîrîniya wê biharê em serxweş kiribûn, em pêk ve herwekî efsûnî bibûn... Dilê me ji xem û xîyala dûr, lê belê bi hêviyeke paqij tijî kiribû. Kal û ciwan: jin û mêr û me hemû zaroka tenê tiştêk tîna bîra xwe: Ev bihare dê xêr û bereketê, azadiyê û xweşiyê bîne ser axa me...

Ma kê ji me dizanî ku dê ev keyf û şahîye di difna me da bêtin. Ma kê ji me dê bizaniya ku şûna xêr û bereketê dê jahr û mirin bibare ser ax û jîna me...

Di qedîm û zeman da tîrêjên bilind û germ yê ronahîya rojê, xemlê delalîya xwezayê, hêlm û bêhna axê, gil û gîya, gul û kulîlka her bi xwe ra xweşî anîye... Ma kê ji me dê bizaniya ku ev bihare dê li me bibe jahr û gor...

Belê bi serê me hat. Şûna xêr û bereketê, derd û kul û bela: şûna hêlm û bêhna jîndar, jehra kîmyayî: şûna tîrêjên rojê, tîrên mirinê, kuştinê: şûna qebîna kew û xwendina bilbila, gurîna balefirên cengî... U paşî vê êrişa nemi-rovane kane jînê hate çik kirin... Helepça rengîn, xweza xemlîn, jîyana bijûn vemirî...

Rûhberek nema di kuçe û kolanên Helepçe da,
di xewşên malan da...

Ezî dilborî bi dengê nalîneke kûr û giran bi ser
xwe ve hatim... Belê mixabin: ew nalîn ne
nalîna xwûşk û birayên min, ne nalîna dayîk û
babê min, ne jî ya cîranên min bû... Ez
dinalim. Bi nalîneke giran û kûr...

Yên mirin û xezab li me barandî gihîştibûn ar-
manca xwe... Avahî xirab nebibûn, stûnên
elektrîkê ne çemyabûn... Belê gul çirmisî bûn,
mirov fetisî bûn û landik nedihējîyan...

Belê vêca wêrankera tişteke ji bîr kiribû. Ava
bajêr çik nekiribû. Serûkanîya avê li çîya bû.
Di nav ewrên jahr û mirinê da kesê nikarî di
hawara me bîn. Lê balê avê xwe ji me nekir.
Hawara me bû ew av. Serûkanî peqî, av fûrya,
tam û zelalîya xwe berda coyê û bi ser Helepçe
da herikî. Jehra dijmin xwe li ber zelalî û pêlên

gur yê avê negirt. Ava paqij û bijûn gihîşte
bajêr. Edî lûle û borîya têra avê nedikir. Av di
wan da bi cih nedibû. Kuçe û kolanên cendek
ragirtî êdî bibûne dola avê... Gurmîn û fitîna
pêlên avê mizgînîya jîn û jîndarîyeke dikir...
Xweza livî, baranê bijûnahî û geşî anî: ax
germixî li ber tûrêjên rojê, bêhna hêlma bijûn
bilind kir: gul û kufîlka, gil û gîya erd hemi-
land...

Belê... Rika jîyanê zora dijmin biribû.
Helepçeyê nû li ser xwûna xwecihên xwe
dîsa bejn dabû

Jîyan didome... Hêvîyeke xurt û qewî em
rapêçane, dil tijî kirine... Eve ne xewne,
Helepçe dê dîsa ava be...

Adar 1989

ÇEND WÊNE JI XWELIBAKIRINA HELBESTVANÊKÎ ÇAR SALÎ

Ehmed HUSEYNÎ

-1-

Li rojhilatî bakurî Firansayê, li bajerekî biçûk "ŞARVÎL" helbestvan û damizirvanê helbesta nûjen RIMBAUD (RAMBO) têt dinê. Sal 1854'e, şev tarî û zîz e, xuşîneke nermin bi canê xuristê dikeve, qîrîna zarokêkî nûhatî zerdana payîzê dorpêç dike gerdûn, hebûn û îleka rûreş, her yek ji milekî ve, û bi hev re, xetresî û renckêşanê li ser eniya vî zarokî dizolin. Rambo pir bilez mêvaniya li cîhanê cûta dike, temenekî alozî û kin. Lê li çar tenarên dinê, pirsekê bê bersiv dihêle: Rambo eytanekî bû ango firîşteyek bû?

-2-

Bi kotekî xwendina xwe ya pêşîn û lîsê li distanên "Şarvîlê" bi dawî dike. Zû bi zû xwe ji merbendên malbatê û ji întengiya dibistanê aza dike. Xwe dadihêje liyana meşextî û sergerdanê. Bav serbaz li talrûniştî ye, ji nişkê de ji ber çavan winda îbe ango xwe ji ber sertî û pevçûna bi dayika

rambo re, dide alî. Rambo ê zarok û nûbişkivî di vê demê de hildiperike astengên nivîsînê, helbestan diafirîne û ji hêlekê ve jî, xwe dadide xwendina berhemên feylesûfên sosyalist. Çendûn car ji Şarvîlê winda dibû. Bê armanc û mebest, bi rojên dirêj ji jiyaneke kambax, digeriya, ji çarmedora sade û bêtam direviya, lê pê re xetîreya raman û hîşyarîyê geştir dibû. "ÎZAMBAR" mamostayê xwe nas dike, pirtûkên wi yên felsefî edebî û guft û gayên wî yên olî, cînsî û politîkî li gel Rambo, dibin sedem ku Rambo careke din bireve Parîsê.

Sal 1871 e, imperatoriya Napilyonê sêyem hilweşyaye. Rambo evîna komûna sor ya Parîsê, ya ku bi kurî li kuç û kolanên Parîsê dorpêçkirî û têkçûyî jiya, di xwe de hest dike. Lewra dest bi nivîsandina helbestên şoreşgêrî dike. Pîrozbahiya xebat û têkoşîna çînî û bi hozanî wekû baweriyên diafirîn e.

Dayika Rambo dighêje Parîsê, wî vedigerîne şarvîlê, lê Rambo dilşikestî û melûle, bêhêz û radest e, bi tenha helbest ji pêjnên wî dipijiqin.

Rambo navdartirîn helbesta xwe di vê vegeê de



*Ji
objektiva
Carjat
Rimbaud(1871*

dinivîsîne "qeyika sermest" û destnivîsekê rê dike bo VÊRLÎN ta ku nêrînên xwe ji Rambo re diyar bike. VÊRLÎN bersivêkê ji Rambo re diguhêze "bilez were Parîsê" û dîsa banga helbestê wî dihejîne, daxwaziya revê di cergê wî de dilebite. Bê guman di vê demê de dil hebû ku peywendiyên cinsi ên çewt û bê rê biparêze, çaresereke li beramberî rewîşt û bendên civak û malbatê. Bêrya meyxanan û sergerdanê dike. Naveroka dilê wî li tev hevîye, şoreşe, naskirina gunehkarîyê ye, azadî û rizgarî ye.

Di vê dema lertzokî û dijwar de nama pol VERLÎN diguhêze ŞARVÎLÊ "were Parîsê". Ew bi xwe dil ketiye helbestê û xwediyê helbestê jî. Zû bi zû destê xwe ji pîrozmendiyê dişo, xatirêkî li ser piyan ji malbat û bûka xwe dixwaze, destê xwe davêje". Rimbaud û bi hev re salên penaberî, meşextî û astengan hildibijêrin. Li xaçerêkan, li kuç û kolanên Ewropayê, bi stêrkên helbestê re dilxoş dibin, bi jiyana azad û bê berpirsyarî, dûrî bendên civak, malbat û

ramanên edebî ên rewşenbîrên Parîsî, serxoş dibin. Îro li Îngilistanê ne, çend rojên din wê li Belcîka diyar bibin.

Rojekê pevdîçin, çend rojan levtên. Her yek ligel evîna dijwar ya ku wan bi hev çesb dike, dixwaze ê din wêran bike.

Şevêkê bi dû serxoşî û gazinan de, VÊRLÎN berê debançê dide hevalê xwe "an yarê" xwe lê gulle riya kuştinê şaşdikin. VÊRLÎN têt girtin û Rambo vedigere ba diyika xwe. Bêhêvîye, şikestî ye, lêgerîne li razên wî şeytanî yê bi le net yê ku berê wî dide daristanên helbestê û gunehkarîyê, revê û hewarê, dike. Vi beşê dawî ji jiyana xwe bi şeweyekî bêjeyî "Nesrî" dinivîsîne û bi nivîsandina vê berhemê rehêr xwe ji zemîn û xaka edebiyatê dibirre ango j sala 1873 an Rambo ji bilî çend nameyan ku j dayik û xwişka xwe re hinarti bû yekcar hev dinivîsîne. Husa pirtûka wî ya bi navê "Dem salek di dojhê de" bûye pira dawîn di navber Rambo û cîhan edebî de.

Ji nûve Rambo bi rêç û kolanan dike ve. Mebest ewe ku ji bîranînên xwe ên zarotî û ciwanîyê bireve. Vê carê bi koç danîna li Elmanyayê dest pê dike. Hewl dide ku bi bazirgan be û hîmî zimanê elmanî bibe. Paşê xwe li Holandayê dibîne, wekû serbazekî beştarî ordiya leşkerî dibe û berê Rambo didin doravên Hindistana rojhilat. Lê zû bi zû ji leşkerîyê direve û li hawirdorî Çakartayê di gemîyekê de dibe melevan, bi vê gemiyê xwe dighîne Feransayê û di şeva sersala 1877 an de li şarvîlê bi malbata xwe re dişadiyê dike. Lê şeytanê revê herdem bi Rambo re dijî. Careke din xwe amade dike bo rêwîtiyê. Gernameyêke dijwar xwe dispêre xewn û hestên wî, li Ostiryê, Holandayê, Swêdê, Siwêsrâyê, geh karker e, geh bêkare. Carekê siware û pirê caran peya, birçî, bê cî û war bê xwedî û armance.

Çiriya pêşîn 1878 an Rambo li Qubrusê ye û wekû berdest bi avahîkarekî re dixebite. Bi îfoîdê dike ve, ji bê çaretî vediger e Firansayê. Lê dirêj na ke û reşê wî vê carê li Misrê diyar e, kar bi destmakeve, berê xwe dide Yemenê û di firoşgeha mirovekî Riransî de kar dike. Ta ku beşekî firoşgehê li Hebeşistanê damizirîne. Rambo berî dide Hererê. Dest bi hînbûna hendezê dike û dayika wî pirtûkên zanistî jê re bi postê dişîne.

Sal 1882 ye, xwedanên kargehê berê Rambo lidin Qûmîstana Ogadînê ta ku nameyêke zanistî bo wan biguhêze. Hêdî-hêdî bi rê ve çûna rojane ya Rambo dihat guhertin. Peywendî yê bi "Mînilîkê mezin" şahîşahê Etyûpyayê re girêdida, karwanên tang û topan amade dikir û mebest hergav ewe ku: xurçika çêran ya ku Rambo di bin çengê xwe de vedî art mezintir bibe.

Lî tişt ji destê xwe ber ne dida û ji nişkê ve nexweşiya dijwar belû dibe. Bi derd kêşaneke xê hempa xwe dighîne nexweşxanê. Endamên aşê Rambo didin ber jêkirinê û di çiriya pêşîn a sala 1891 ê de dergêhên jîndariyê li Rambo ên girt

Temenekî kurt (37 sal) bi pêşbazî û bê hedan, bi dudilî, bi raperîn Rambo dibe wêranker û desthilatkarê zimanê fîrasî. Helbestvanekî xanedan û pirbuha dibe leşker, bazirgan û herdem şeytanê revê pê re dijî. Gelo Rambo li çi digerya?

Bêguman bersiva vê pirsê Rambo bi xwe ye. Ev mirovê ku bandûreke kûr li seranserî edebiyata ewropî kiriye. Rambo li şeweyekî jiyandî digerya, şeweyê ku bikaribe azadiya bê sinor biafirîne û bi dest xine ku bikari be rastiya bê aso bidêyê. Rastiya Rambo ne hevrêbûna raste-rast bi hebûnê re bû, lê melevaniya di hundirê mirovan de bû, lêgera wênayên hundirînî yên çav wan nabînin û guh wan nabihîzin bû. Lewra şîir di raman û baweriyên Rambo de, ferhenge jibo xewnên taybetî:

"Meyxana ku ez li ser kenarên çemekî av şelû dibinim, ew bi xwe mizgeftêki bilind e li ser çemekî ronak e"-Rambo.

Ji serdemên dastan û efsanan ta tevgera kilasîkîya nû, her gav şîira ewropî di çarçewa sin'etkariyê de wînda di bû. Lê Rambo bi damizirandina romaîfîkeke nûjen hemî dibistan û teoriyên edebî di şewê û berhemên xwe de bi gewde dike. Helbestên wî Tove'n xwe berdidin zemîneke realist û ji rexê din ve di esmanê xeyalê de dighêjin asoya şet bûn û sermestiyê.

"pêwiste em bi awakî mutleq nûjenvan bin" Bi vê cegerdarî û sergermiyê Rambo dibe pêşewa û helbesta nûjen bi navê wî ve têt girêdan. Tu carî bawerî lêkolîn û lêgera li naskirina mijara (me'na) peyvên bihêrs û viyan ên ku ji dil û canê helbestvan û ji xweşikbûna ziman têne der, ne dianî. Mane peyv û wişe di her xwendinekê de mirovan digihînin rewş û pêjn û hestên curbecur. Di pirtûka xwe de ya binavê -demsalek di dojhê de - kurte jiyana xwe bi awakî helbestî pêşkêş dike. Jiyana rteq û engîz, rojên zîvar û nakam, şevên Tox û Tarî T'ne Zimên. Di xêz û hevokên xwe de berevajiya li

hemberî hertişî dide diyarkirin, cudabûn û dijîti, ne wek heviya bi gel re, bi rabirdû re, bi aniha re, her tişt sext û çewte û çarmedor bi awakî kelê, bê tendûrustî û bê xweşikbûn hatiya pê, lepên xelkê bi xwinê qirêjbûyîne, dîrok di ser dev re çûye bi fort û derewan û Rambo dixwaze ji vê Torê, ji vî mîrasî aza bibe. Li rêçên teze û nûhatî digere, li çirên geştir, li mirovin paqijtir bi wicdan û dîlnerm, li peywendiy in mirovane dîlkêş û şahmaz dipirse. Lê her kes bi xwe daketiye, tişteki bi ser û ber nemaye, cîhan li ser kinarên derya xwinê û bi payebûn rawestyaye.

"Va li nik Tixûbên Firensayê me... de bera çirên bajarên vêkevin, roja min derbaz bû? Ezê koça xwe ji ewropayê bar kim... wê derya bi bayê xwe kezeba min bikewîne, wê roka koçergehê çermê min li bake, ezê nemaze ez ê çixaran bikêşim, ezê meya kevnar ya mîna hesinê hilyayî bi ser xwe dakim, wekû bapîrên xwe ên wusa dikirin li dor agir" û "çûkê zêrîni" an Rambo dest bi dastana rêçên tenhatî û belengaziyê dike. Gernameyeke bê ser û bin di hişê Rambo de têt hûnandin. Bi rîkin û serhişkî li pîrsîgîrêkên hebûna mirovan digere. Xatir ji cîhana miriyên jîndar dixwaz e. Cîhana sext ya çand û bajarvaniyê. Giyanê xwe ji rewîştên mirovê nûdem dadiweşîne, "ji vê kêlikê de, eger giyanê min şiyarbûyî ma, emê zû bi zû bighêjin rastiye ya ku niha em dorpêçkirine bi firîştîyên xwe ên kelogirî !... eger giyan şiyarbûyî ma ba û ta niha, ezê radestî daxwazên xwe ên nimiz ne bûna, ên demek ji bîrbûyî! Eger giyan herdem şiyar bûya, bi hemî hozaniya xwe min ê melevanî bikira"

Wusa ji gulîstana hêviyan koçê bar dike. Kifîta dilovaniyê wînda bûye, lewra giyan jî pê re gihîştîye xalên nimz û qunaxên Tarîstanî. Herdem Rambo li pêşrojeke Zelal dipirsî, ku mirov têde kê mîrovî be, lê di helbestên xwe bi tîrsê disote. Wê mirov têkbiçe wê bikeve, wê bişike û banga Rambo bê sûde ye:

"Tu sûda bangê nîne, bê guman wê bixeniqin". Rambo wek helbestvanekî xwedî piroje dibe kurê hemî çand û tora navnetewî. Di Rambo de rojhilat û rojava dihingivin hev ango bi hev re

tên girêdan, girêdana aqil û hozaniyê û aqil û hestan. Li vira Rambo dibe dorbîn û neynika ku agir û avê tev li hev dike. Şiyar û hêza helbestên Rambo hovane ne, xerizîne û dest pê kane ne. Biwî awayî bangin, bo çirandina sînor û derbandan.

"Çekdarbûm li dijî dadperweriyê

We xwe da alf ey sihirbazno

Ey belengazî

Ey kîn

Ji bo we ye soza xezîneya min.

Min xwe mîna cenawerekî goştûr berda ser xweşiyê ta ku bixeniqînim"

Ev helbesta ku xwe dighîne kûrbûna mirovatiyê helbesteke na-yîmî ye.

" Helbesta wî û ji dest pê kê de, rapêrîni bû. Mîna ku evînek berçûyî bû, mîna ku daxwaza evîneke nû be-iv BONIVYA"

-4-

Di helbestên xwe de, hewl dide ku cewherê mirov bivejîne. Herdem pêjnên berevaj, hestên cur be cur diafirîne. Reş û sipî, jîyan û mirin, hêvî û bedyamî, bilindahî û ketin, çare û asteng, hêrs û hêmin, evîn û zikreşî, xewn û real û bîyî hebûna destên alîkarîyê Rambo bi xewn û efsanan re teyrekî per mezin e. Ji bo ku xwe ji penc û lalên mirovan, ji hustxwar kirina li hember cîhan û ramanan, azad ke, pêwîste xwe çemke himbêza rewewkê û pêxêra xewn û pîrebokan. Mîna zarokê dan û stendîne bi hawirdor û tiştan re dike, bêcir, serhişk, sersar û zîyan hez e. Di pirtûka "qeyika sermest" de, wê zarok bûnê bi şewekî spehî û helbestî vedigerîne û ji bo ku meriv bikaribe wê pirtûkê şirove bike, pêwîste mirov vegere û ji nûve bi zarok be û husa jî na be! Helbestên Rambo wekû keskesorekê rengî-rengî ne, gelek cîhanên saykolojî di çarçewa xwe de diafirînin. Li paş helbestên wî, her gav, perdeyeke qalind raxistiye, ev perde zaroktiya li ŞARLVİLÊ ye, tenhatî û dayika sert e.

"Ji pêşîn de zarokê helbestvan (Rambo) bawerîya xwe ya bi civatê wenda kir. Zû bi zû



G. Gorvel: gravura Rimbaud

fenbazî, derew, hemû nexweşiyên civatê nas kir. Vana ew dehî da ku bêtir bi tenha be. Wilo tiştan ji bo wî tama xwe û me'na xwe wenda kir û wilo jî pir bi lez ew dehî da ji bo dagirtina asoya vala, ku me'neyên nûjen biafirîne, ji bo wek hevîyeke nû pêjn û hestan, neguhdan û bêkesî di gelek şopan de xwe dide xuyanî kirin, bi taybetî di helbesta "zarokî" de. Û dawîya dawî va hinek hene ku bera te didin dema tu birçî û tî biçiqasî ev peyvên han mirovan agahdarî birîneke kûr di giyan de dike. Çiqasî kêmbûna evîne û pêwistiya evîne ji helbestvan re di zarokîyê de, dide diyarkirin. Çiqasî

pêwiste ku banga wî ji nûve li cîhanê bê te afirandin-bi karanîn ne xuşka xewnê ye-îv BO-NIVWA"

-5-

Di 19 e saliya xwe de, Rambo peywendîyên xwe û edebiyatê û hetanî roja dawîn ji temenê kurt, dibirre. Bi awakî din Rambo giyanê xwe berda. Ligel ku mirovekî efsanewî bû jî, di sê salên nivisandinê de hemî serdemên hunermendiyê bikaraniye "tê bê qey gelek jîndariyan di xwe de diparêze-jak privé".

Rambo xwe bi xwe di "demsalek di dojhêde" dibêje "ez bûme operayêke efsanewî" û berê xwe dide gergerînokê. Li seranserî ewropayê digere, li ser piyan xwe ji gemiyekê davêje ya din, pirê caran nexweş dizîvir e û bê pere jî hezar karî dîke 12 e zimanan hîn dibe, di şûna ku bi peyvan re bide û bistîne, bi qehwê re, bi dermanên xwarinê re, bi çerman re, zêr û tiving û dîl û bê amanciyê re, lêgerîne re, girêdana bi xelkê re, bi babetan re, bi netewan re, dide û distîne û herdem kar, karê ku jê hez nake û herdem bîntengî.

Hinî mêler di pirtûka xwe ya bi navê Rambo û serdema gîhakêşan - wusa jiyan û destana helbestvanakî bi navê Rambo tîne zimên:

"Bi awakî mûtleq em di rabirdû de dijîn. Em bi ramanên mirî, baweriyên mirî, zanistiyên mirî tîen avdan. Em di bin zordestiya rabirdû dene, ne ya dahat û de, dijîn. Rabirdû herdem vedigeriya, herdem wê vegere-helbestvan. Gava ku Rambo ji cîhanê filitî bû dibe ku giyanê xwe ji encameke pîstir ji ya Hebeşistanê, aza kiri be." Helbestên Rambo wekû rojên dawîn ji jiyana wî ne. Rojên bêzav. ên bi azar û êşa dijwar. Destê rastê hişk dibe, ê çepê pûç dibe. Derdekî tûnd di lingê rastê de kûrtir dibe û yê çepê têt birrîn. Hest dîke kû mizgînîyêke nû xwe li nik giyanê wî datîne. Sergêj û sermest dibû. Diket kabûs û bê hişiyê bi nexweşiya "endamên laş ên jêkirî" diket û bêhay digot: Wê bûyer in pîstir bi serê laşê min bên xwe wîndî dikir û di sekretê de, peyvên xeyalî li hev siwar dikir. Lê wê carê xeyal û fentazyaya wî ji bêhişîya realist bû, berya niha bi 18 e salan wekû helbestvanekî derbaz dibû bêhişbûnê, lê xewna mezin ji mêjve li ber ba çû bû. Mane wî bi xwe digot "Ev çi jiyane, jiyana rast

wîndî ye. Em ne li jiyane ne"

37 salî koça xwe bardike. Çar salan dinivîsîne û piştî wî hew dihingi ve sînorên aferandinê. Vê yekê pîrsgirêk û serêşeke bê hempa li ber rexnegir û lêkolîngeran raxistiye û vaye sed sal dibûhure bêyî ku kes bighêje bersiveke mantiqî, ligel ku pirtûkên li ser Rambo hatine nivîsandin "Rêberiya telefonan ya bajarekî dadigrin" wekû ku Corc Blan dibêje. Lê pêwîste mirov çend nêrnan ên ku li ser vê pîrsgirêkê hatine nivîsandin diyar bike. Hinî Mêler bi kurtasî husa dibêje: "Rambo cîhana edebî berda ta ku biçê jiyane"

Lê nêrîna helbestvan û rexnegir ê Feransî ÎV BONUVWA jî warî de nirxêke wê ya taybetî haye "Rambo raewestya gava ku zarotiya wî kuta bû. Ev kutabûn bûye sedem ku hêviya Rambo bi guhertina cîhanê wîndî bibe. Helbestvan Rambo di vê demêde dev ji pirojeya guhertina jiyan û cîhanê, berda û jiyana mirovên normal ji xwe re hilbijart"

Sed sal ji mirîna helbestvane kî pêşewe derbaz dibe. Helbestvanakî ku di xêz û hevokên wî de, di nameya wî ya rojane de û di aferandin û berhemên xwe de nas dikir bê çi rojên reş û tirajîdî li pêşya mirovan henin. Li ser kenar û qiraxa jiyana rast û dirust radiwestiya lê tu carî derbaz nedibû vaverok û hundir, ber çav dikir û bangî jiyane paktir û dilovantir dikir û di dawî de lal dibû, di bêdengiya hisînî de digevizî û xwe bi xwe dikir kurtepîst - mane ez jî mirovim - çar salan bêhedan û bi kiftelefteke afsanewî nivîsiye, tev ji boyî ku bikaribe guherînekê di cîhana xwe de bi gewde bike. Hê banga wî li dar e:

"Bo çi em dinivîsîni eger ne ji bo guhertina jiyana me be"

-BEYAN-

Arthur RIMBAUD

Ma rojekê ji rojan ez ne xortekî çeleng bûm, ne mêrxas bûm, ma germame û jiyana wî xortî ya rojane î nazenîni li ser rûpelên zêrîni nehatibû xêz kirin -Ma ez ne xweş bext bûm! Îca min çi guneh kiribû, min çûkê kîjan xwedayî peritandibû. Ta ku ez bibim hêjayî vê têkçûna îroyîn? Ey kesno! kesên ku hûn didin diyarkirin ku hêsrên renckêşanê ji çavên lawiran diherikin û ku hin nexweş radestî bêhêvî bûnê dibin û mirî bi xewnan bînteng dibin. Hûn, hewl bidin ku çîroka şkestin û mirina min ji bibînin. Lê ez ji wî parsekê ku kurte pistê ranawestîne. Ji wî bêtir nikarim bibîfinim û bi gewde bikim. Xwedayo, ey Meryem... hew dikarim bipeyivim! Ez di wê baweryê de me ku îro min çîroka dojeha xwe kuta kiriye, bi rastî dojeh bû,

dojeha kevnar ya ku lawê însan dergêhên wê vekirîye.

Ji wê beyabanê bixwe. Ta wê şevê bixwe, herdem çavên min yên zelûlî bi ser stêrka zîvîni de vedibûn.

Bêyî ku qiralên jiyane pê mat mayî bibin, hersê mecûsî -dil- giyan - û hiş. Kinga emê herin, ta ku em li paş çolistan û Sîpanan, şahiya rojçêbûna karê nû û ya pend û şarezayîya nû bikin. Şahiyê bi reva xwînmij, zordest û şeytanan bikin. Bi bidawîhatina fort û xapan bikin, em şahiyê lidarxînin -berya her kesî - bi cejna rojçêbûnê li ser gerdûn?

Ahengên nermîn ên esman û bi pêşveçûna gelan! Em mirovên kole, pêwîste tu carî em nîfiran li jiyane nekin.

STIRANA KELEHA BILINDTIR

De bila bê.. De bila bê
Serdema ku em tê de dibin xwedan...

Demeke dirêj min aram kêşa
Arameke ku Tucarî ji bir nakim
Derdkêşan û tirs
Li ber ba çûn
Û tî bûna qirêjbûyî
Xwîna min şelû dike.

De bila bê.. De bila bê
Serdema ku em têde dibin xwedan

Wekû mêrgan
Mêrgên ku radestî ji bîrbûnê bûbin
Mêrgên şînbûyî û gulvedayî
Bi bixur û zîwanê
Ji boyî vine vîna hovan e
Ya mêşên gemarokî..

De bila bê.. De bila bê
Serdema ku em tê de dibin xwedan.

Û dilketim beyaban û bîstanên şewitandî û firoşgehên tar û mar bûyî û
meyên qurmiçî û li kuç kolanên genî bûbûm sergerdan. Bi çavên girtî min
xwe da rokê, min xwe da xwedanê agir û gure gurê.

*Ji pirtûka Rambo "demsalek di dojhê de" ya û bi zimanê erebî hatine wergerandin

Cavkanî:

Rimbaud û serdema gihakêşan, Henri Miller
Rimbaud-demsalek di dojhê de, Yonon Gesis
Rimbaud damezervanê helbesta nûjen, Kata
Rojnama rojhûlatanavîn 4722-20.11.1991

MORÎKÊN ŞÎN... EWR Û DÛRBÛN



Mihemed Eflî HUSEYNÎ

Êvarekê te ode bi serserîtiyê mişt kir...
Tu dûr bûyî
Zarok in... Û toza zarokbûnê jî dûr e...
te ode bi serserîtiyê mişt kir
û min hebûna te di nava xwe de herikand...
Ma raste...!
Gul hêjayî dîlokan in
û tu jî hêjayî pesindanê yî, dema
ku navan jibîr dikin û seqaya çeleng..
an rojhilatek ku xwe dirêjî
rûnişteka dawîn dike...
Havînê di xanîkî de ku
bi navê hebûnê tê nasîn
û aheng bi navên zarok û bavan
tên naskirin...
Û tû...
Odê bi katjimêr û çekan mişt dikî.
Kê baskên tûbûnê bi ser te de vegirtine!!
Kê xwe dahiştiye pesindana te ya bê ser û bin!!?
Û tu li paş pencerê yî
bajar di nav destên te de diqermeçe...
Û mirî tûn bîra te, mîna ku
ez dayika xwe û posterên şehîdan tûnim bîr xwe..

...çemekî me heye /
û rewa xanî /
Û sistin pesindan /
bi alî cîgehekî dereng mayî de
Li beramber tiliyên te î zirav
û gume gume camê...
Wê sist be
zemîna şevbuhêrkên me
Serdanên payîzê û ên qehwa hevalan...
Serbilind dikin jîndariya sirûdê,
û hevrêşîma bîranînan:
Av bo lingên mirîyan
Seqa bo destên te ên pêçayî
bi kebrîtê, bi not û neh navên xwedê..
Hêviyek mîna şîr
û bixûra şûnwarên pîrozî,
Ta ku sorgulên dayîkan û bîna cilên kevnar
pars bikim...Ezê dayîka xwe pir bînim bîra xwe!
û odeya ku di êvarekê de te
bi serserîtî û ewran mişt kiribû
û bi morîkên şîn...

Û bêdengiya ku niha têt rijandin bi ser
pencerê de,
û tu jî paş pencerê
bi tenha yî
wekû şîniyan...

BEHIYA

Bê sedem. Katjimêr li nik
serpêhatiyên te rawestiya
Destekî ji hinê
û neviyên bi terîşên zêrînî
De bila pîroztir bibe bîna te...
Dîwarê ku te pala xwe dayê û
sînor jî!!
De bila pîroztir bibe
destên ku kew hilgirt in...,
Maça ku bi kalkê min re çû gorê
De bila pîroztir bibin
çîrokên ku ji me wina bûn
Em neviyên te bi terîşên zêrînî
Zarukên bê guneh
Dizên çîrokên te û bîna te ya kevnar
an canê te yêku di mermera goristanê de
winda bû
Û bê sedem!!
Çîrok jî rawestyan.. Gava me xwe davêt
himbêzên dayikên li metvexan
yên xweşiya xwe dikiri in
zarok çêdikirin
Û tu diçû... Diçûyî gorê,
Çîrokên te hindik bûn..
Lê em pir bûn û bê sedem
tu dimrî
Em serpêhatiyên te dinivîsinin
Em pir dibin
Bîna hinê ji terîşên me yên zêrînî difûre
Terîşên ku di rengê çîrokekê de ne
Çîrokek bi navê BEHIYA

Roj dihile
ronahî û dîlan
av û ax
tev dikenin

Meriv aza
roj dilxweş
jîn serfiraz
evîna reben geş dibe
ji nuh ve dixemile

EVÎN

Derwêş M. FERHO

EVÎN

Çawa tê gotin
ev evîn
ev hesreta mezin
di zinaran de
di ewran de
li ser zikê ezmên
bizir daye

Evîn girtû
hêvî di zîndanê de
roj li ser me
ji loriyên me westayî
şermokî ye

Çawa tê gotin
jana di ser dilê min de
xwîn dikele
hewar fetisî
evîn birîndar
evîn bêçare



EVÎNA DI NAVA MIN DE

Evînek di nava min de
mîna delaltirîn stêrka li ezmên
bi bayê azadiyê re govendê dike
û bi jînê re devbikin

Evînek di nava min de
mîna rojê ronak
û ronahiyê dide tiştan
tenha ye, zelaî û ciwan

Evînek di nava min de
mîna şev û rojê, tev jîn
tev jîn jê der tê
û bi zemên re sohbetê dike

www.netewe.com

EVÎNA ME

Evîna me
li ser mitikên çîyan
di bin kel-kela rojê de
tovê xwe çandî ye

Ne di zîndanê de
ne di tariya şevên sar de
delaliya evîna me hunda nabe

Ew, li ser lêvên paqij neqîşkîrî
di reşîka çavên belek de
li ser dilê bi xwîn
di hinarkê ruyên ciwan de diçirise

Evîna me
di koka hebûnê de şîn dibe
bê tîrs, bê şik û bê kîn

PERUK

Lokman POLAT

Li ser ezmanê Hekariyê ewr hêdi, hêdi belav dibûn, rojê tirîjên xwe berdabû ser çiyayê Hekariyê. Li newalan li ber avan û li çiya gul vebûbûn, her der bi gul û kulfilkan hatibûn xemilandin, ew hêşinayiya ku çêbûbû bêna biharê dixistê pozî meriv.

Gelê Hekariyeyê feqîr nîv têr, nîv birçî bi zor jiyana xwe berdewam dikir. Di aliyekî de ji bo jiyana xwe dixebitîn, kar dikirin û di aliyê din de ji li dijî tehde û zilma kolonyalîstan disecînîn û wezîfên xweyê niştiman perweri danin çih û têkoşîna xweya siyasî li dijî kedxwariyê pêşta dibirin.

Mizgîn serê sibê ji mal derket û çu çarşiyê. Çarşiya Hekariyê pir piçûk bû, tê da hinekî çerîya û çu wê qehwa kû hemû merivên welat-arêz, pêşverû û şoreşger diçûnê. Mizgîn li qehwê rûnişt û ji xwe re çayek xwest hew me-rekir, ku memûren Adliyê Attilla di pêşiya qehwê da derbas bu û pîs, pîs li hundirê qehwê nêze kir.

Attilla hê nû hatibû Hekariyê. Piştê ku hat Hekariyê xwest, ku dîtîne xwe yê paşverû û aşîst li der û dorê bela bike. Temamê Hekariyem êdî zanîbûn ku Attilla merivekî faşîst e. Ji bo ku atilla dîtînen xwe yê faşîst bi eşkera li

her derî digot û nav çarşiyê jî dest û mi lê xwe li ba dikirin û digeriya, wek hemû pêşverûyên Hekariyê, moralê Mizgîn jî xirab bûbû. Mizgîn berê bi hevalên xwe ra axiftibû ku vî Atillayê faşîst şevêkê li ciyêkî bigire têr lêxe û dersekê baş bidiyê.

Wê rojê moralê mizgîn ne baş bû û gava dît ku wa ye, Atilla dipêşiya qehwê de diçe. Moralê wî bicarekê xerab bû û ji xwe re got: "Hela bila bibe êvar, tarî bikeve erdê, wê demê tu ê bela xwe bibinî, niha tu milê xwe li ba bike û bigere".

Mizgîn zanîbû ku Atilla bi şevan diçû qehwê û hetanî saet yanzdehan disekine û paşê tê mal. Mizgîn wê êvarê hinek zû ji qehwê rabû û derket çu pêşiya mala Atilla û di kuça teng de li hêviya hatina Atilla sekinî. Mizgîn du-sê cixare kişand û piştê ku hebekî sekinî, mêze kir, ku Atilla wa ye ji wê derê tê. Mizgîn yekî dirêj, hebekî zexim û herî jêhatî bû. Atilla jî yekî kinê du bust û burokratê kî bajarî bû.

Gava Atilla li kuçê Mizgîn dît, hema di çî de zer û zuwa bû û ji tirsan canê wi lerizî. Mizgîn hat ber Atilla û got: "Faşîstê pisê murdar, tu nizanî ku vir Kurdistan e, tu dîtîne xwe yê faşîst ji gel re bêji û tu jî hemûyan ra bêjin

hûn jî Tirkin."

Piştî ku Mizgîn vana got, destên xwe avêt serê Atilla, bi porê wî girt û bi destê xwe yê dinê, heya ku hukma wi hebû kulma xwe li ser û çavi wi xist. Gava kulma Mizgîn wek hesin li ser û çavê Atilla ket ew di ci de kete erdê û ji xwe çû. Gava Atilla ji ser hişê xwe çû û li erdê dirêj bû mizgîn di xwe da his kir ku tiştêk di destê wi de ye. Gava li destê xwe yê çepê, destê xwe yê ku bi serê Atilla girtîbû mêze kir, dît ku di nav lepê wi de seriyêk û por heye. Mizgîn ci de ricifî û ji wê derê bazda, gava bazda, di tarîtiyê de mêze kir, ku ew seriyê bi por hê jî di destê wi daye, ji tirsan hema ci de ji destê xwe ew tiştê avêt û berê xwe da mala birayê xwe.

Mizgîn wê şeve qet raneza, ji xwe re fikirî "Gelo çawan bi kulmêkê serê mêrik jê kiri bû " Carna jî ji xwe re hêrs dibû, bi xwe-xwe, di hundirê xwe de, xeber ji mêrik re dida û di got: "Madem ku stûyê wî ewqas çirûk û sist bû, min jî baş kir ku serê wi jî stûyê wî jêkir."

Mizgîn serê sibê rabû û ji birayê xwe re got: "Gava ez do êvarî hatim mala we, ez pê hesiyam ku di mehela dinê de serê merivekî jêkirine. Hela tu here çarşiyê û qehwê mêzeke xelq di nav xwe da çî xeber didin. Hela ku bê kê serê wî mêrikî jê kiriye, hukmat pê zane an na? Van tiştan hîn bibe û were"

Birayê Mizgîn piştê van gotinên Mizgîn çû çarşiyê û paşê jî çû di qehwê de rûnişt, mêze kir ka kes qala tiştê wile nake. Hevalekî wî yê baş hebû, bang wî kir jê pirsî û got: "Dibêjin do êvarî serê mêrikekî jê kirine, gelo haya te ji vî tiştî heye, tu bi tiştêkê wa hesiyaye an na? "Hevalê wî got: "Na, tiştêkî weha nebûye, eger ew tişt rast ba û serê yekî hatiba jêkirin, wê hemû kes pê bihesiyana. Te viya ji kuderê bihîst, belkî ji xwe bi te yarî kirine."

Birayê Mizgîn baş fam kir, ku tiştêkî ewaki nebûye. Hat mal û bi hêrs ji Mizgîn re got:

"Hekariyê serê kesî jê nebûye, tu ji ku hînî vê deravê bûyî?" Mizgîn di bin tesîra êvarê de bû û kir înat got: "Birayê min, wallahi do êvarê serê jêkirine; ez baş zanim, ka tu carek din jî here çarşiyê û hîn bibe." Mizgîn kir înat û carkê din jî birayê xwe şiyand çarşiyê. Lê çî feyde, birayê wî çû çarşiyê û dîsa jî tu tiştêk hîn nebû, ji ber ku li Hekariyê serê tu kesî nehatîbû jêkirin.

Birayê Mizgîn ser vî tiştî pir zor da Mizgîn û got: "Îla tu vî tiştî ji kuderê hin buyî dive tu min re bêjî." Mizgîn mêze kir, ku tu çarêk tune; ji serî hetanî binî ji birayê xwe re got: "Serê wî mêrikî min je kir." Birayê wi go: "Wallahi tu dîn bûyî." û bang jina xwe kir jê ra got: "Here bang mele Ahmet ke bila bê, Mizgîn dîn bûye, bila jê ra nivîstekê binivîsîne û em bikin paşila wî, belkî parîkî baş bibe."

Mele Ahmet hat ji Mizgîn re nivîstek nivîsand û kir paşila wî û paşê jî perê xwe ji birayê Mizgîn stend û çû. Mizgîn ji ber vî tiştî hêrs bû û got: "Kekê min, ez dîn ninim ku tu ji min re nivîsta çêdikî. Di Adliyê de memûrêk heye, navê wî Atilla ye, min serê wî jê kir. Tu here Adliyê û mêzeke, eger ew mêrik nemiribe wê çaxê tu heklî ye."

Ser van gotinên Mizgîn, birayê wi hema ci de rabû û çû Adliyê, li wê derê yekî nasê wî hebû, ji wî pirs kir, ku Atilla îro hatiye Adliyê yan na? wî got: "Xêre tu çira pirsra wî merivî dikî? Gelo karekî te pê heye? Ha bisekine, Atilla waye, tu tiştêkî bêjî ezê jê ra bêjim." Birayê Mizgîn pir baş li Atilla mêze kir û paşê rabû ji nasê xwe re got: "Na spas, tu karê min pê tune; dive ez niha biçim mal, de hûn bimînin di xweşiyede."

Mizgîn ji bo ku di umrê xwe de û di jiyana xwe de peruk nedîtîbû gava ku li Atilla xistîbû û Atilla ketîbû erdê, ew tiştê ku di destê wî de mabû, nizanîbû ku tenê, peruk e ji wî webû ku serê mêrik di destê wî de maye.

ELA EDDÎN SICCADI DI DERHEQA MELAYÊ CIZIRÎ DE

M. MAYÎ

Mamoste yê hêja û nemir Elaeddîn Siccadi di sala 1952 an de pirtûka xwe ya pir giranbuha (Dîroka Edebiyata Kurdî) li Bexdayê çap kir. Ev pirtûka wî bûye serekanîyek here giring ji her kesê ku bixwaze tiştêkî li ser edebiyata kurdî bizane, yan jî binivîse.

Wî di pirtûka xwe de behsa jîyan û berhemên şairên me yên klasîk jî kiriye. Ew di vî warî de weha dibêje.

"Em dixwazin bi nobet behsa şairên kurdine herî mezin bikin, hê ji zemanê zû de, heta nîva yekem ji sedsalîya bîstê. Behsa wan bikin yên ku me karîbû nivîsarên li ser wan bidest xwe bêxin, û qala jîyan, psîkolojî, sedemên ku ew kirine helbestvan û qala helbestên wan bikin û wan şirove bikin "

Ew bi nobet behsa van helbestvanan dike:

- Babe Tahir 935 - 1010
- Melayê Cizîrî 1407 - 1481
- Bisaranî 1641 - 1702
- Ehmedê Xanî 1650 - 1706
- Nalî 1797 - 1855
- Salim 1800 - 1866
- Mewlewî 1806 - 1882
- Melayê Cebbarî 1806 - 1876

- Sey Yaqo 1808 - 1881
- Kurdî 1809 - 1849
- Hacı Q. Koyî 1815 - 1892
- Mehwî 1830 - 1904
- Şêx Reza 1835 - 1909
- Salimê Sine 1845 - 1909
- Mecdî 1849 - 1925
- Herîq 1851 - 1907
- Edeb 1859 - 1912
- Piremêrd 1867 - 1950
- Hemdî 1876 - 1936
- Narî 1874 - 1944
- Tahir Beg 1875 - 1917
- Ziwer 1875 - 1948
- Ehmed Muxtar 1897 - 1935
- Bêkes 1905 - 1948

Mamoste E. Seccaddî derheqa Melayê Cizîrî weha nivîsandîye.

Gewherek, mîna momika şevê, li serê çiyayên bilinde Botanî ye. Navê wî Ehmed Kurrê Şêx Mehemedê, ji Cizîra Botan e û her li wê derê miriye. Rupelên jîyana Şêx Ehmedê Cizîrî nediyare û gere lêkolîn liser bên kirin. Lew, emê di despêkê de wan gotinan binin yên

ku di derheqa Şêx de hatine kirin û wan şireve bikin, paşî em dê bawera xwe jî bêjin ku, ez bawerim ku wê demê dê ew perda tarî rabibe û dîmek ronahî bikeve ber çavan.

Dr. Bilç Şêrko di pirtoka "Doza Kurdî" de dibêje; "Melayê Cizîrî, navê wî Şêx Ehmed e, xelkê Botanê ye, di sala 1160 de her li Cizîra Botan mirîye, wî pir şîr li ser xezel, Îlahîyat û Tesewifê hene .."

Emîn Zekî Beg di Tarixa Kurdî Kurdistanê û meşahirên kurd de dibêje: "Melayê Cizîrî, navê wî Şêx Ehmedê li Cizîra (Îbîn Omer) di nîva dawî ji sedsaliya şeşê a hicrî, di zemanê Îmaduddîn ê hakimê Mûsilê de jiya ye... Dîsa ew dibêje ku piştî "Camî" hatiye dinyayê û diwana şîrên xwe bi diyarî ji bo Xanê Xanan ku li Tewrêzê bû, şandiye..."

Dîsa mamoste Mehemed Elî ewnî her di Meşahirê de gotinek heye dibêje; "Cizîrî, ku behsa şîra Seîdî. Camî û Hafizî kiriye, ev ne yên wî ne tê xistine nav diwana wî"...

Rojhilatnasê Rosî "Miseo Ogst Jaba" di pirtoka xwe de "gotin ji kurdan" de dibêje: "Melayê Cizîrî xelkê cizîra Îbîn Omer e, di salên (540 - 556) hicrî, di zemanê Îmaduddinê Zengî da jiya ye..." Rojhilatnasê Almanî "Fon Harthman" ku di 1904 ê de diwana Melayê Cizîrî li Berlînê çap kiribû, û pêşekî ji bo wê bi Elmanî nivêsebû û wînek (resmek) î Şêx Ehmedî jî xistibû têde, we diyare ku bawera wî jî mîna yên din bû... Derheqa Melayê Cizîrî ev belge-name (dekument) di destê me de hene. Dimîne ku em lêkolîna li ser van bikin, da ka em digihin kû derê û ew serdem çawa derdikevin.

Melayê Cizîrî :

Ger lo'î lo'î menthor ji nezmê tu dixwazî

Wer şîra Melê bibin te bi Şîrazî çî hacet

Li vir Mela qala wê dike ku eger tu şîrên xweş û dilveker dixwazî, were şîrên min bibîne, haceta te tune tu herî Şîrazê û bi dû şîra Hafîz de bigerî...!

Eger em li zemanê Hafîz binêrin, em dê bibînin ku ew di dawîya dema paşatîya Sultan Ebo Sêid kurrê Sultan Mehemedê Xudabende de bû. û ji binemala Holako bû, û di dema paşatîya (Îxaniyan) de jiya ye, û di sala 1391 zayînî de miriye. Di dema wî de, binemala

Ebasîyan li Bexdayê ber bi dawîya xwe diçû, li alê din jî wî dewra Sultan Mehemedê Fatîh ditîye, yê ku sala 1452 an bajarê Qostaîniye girtibû. Ger em li gor gotinên ku wan gotine li mirina Melayê Cizîrî û Hafîzê Şîrazî binêrin, Mela di sala 1160 an mirî be û Hafîz 1391 an, xuya dibe ku Mela 231 salan berî Hafîz mirî ye. Ev jî ne raste, ji alekî din em dibînin ku Mela qala şîrên Hafîzê Şîrazî dike ! Ango, bê-goman tarîxa 1160 ê ne raste û Melayê Cizîrî piştî Hafîzî bûye. Ne her piştî wî, lê bi kêmanî gerek 30 salan paşî Hafîz hatibe. Çûnke di wê demê de, Hafîzî şîr li Şîrazê gotibin, heta ku bigihîjin Kurdistanê, di nava xelkê de belav bin ku navê Hafîzî belav be, bi kêmanî 30 salan dikêşîne....

Ger em bêjin ku, dibe ew Şîrazîye ku Cizîrî behs dike ne Hafîz be, lê Şaîrekî din jî Şîrazê be. Ew jî ne raste, ji ber ku ne di niha û ne jî di wê demê de, çî şaîrên din yên Şîrazî di nav kurdan de bilav ne bûye. Bi tenê Şaîrê ku jî Şîrazê û dinava kurdan de navbang be, he Hafîz bû. Eger em bêjin ew Se'îdî Şîrazî bû dîsa ne raste, Ji ber ku Se'îdî jî berî wî bû, çûnkî ew di dema Ebabakan de, mîna Se'îdî zengî û Ebo Bekrê kurrê wî de jîyaye ku di sala 1257 an de bû, ew jî gelek berî Melayê Cizîrî bû.

Ya "Camî" jî, Camî sala 1413 an hatiye dinê, sala 1472 di nav kurdan de çûye hecê ev di Hewlêre re çûye. Sala 1492 an mirîye. Ew di rêya xwe ya Hecê de ku dinav kurdan de derbas bûye, di qala şîr û edeb de dibêje ;

Pîre merdî bi dîdem zi Cizîr

Nîme merdî bi dîdem zi Herîr

Diyare, pîremêrê ku wî ditibû Melayê Cizîrî bû, ce çî Mela çûbû ser rêya wî yan jî ew çû bû Cizîre, ew ne xweya ye her çend ya baştir dil qebûl bike ewe ku ew çûbit Cizîrê Nivemêr jî Elî Herîrî bû.

Camî ev şîre di 1472 an de gotibe û mirina Melayê Cizîrî (mîna serekanî dibêjin) di 1160 z de be, 312 sal ferqî heye. Ango 312 salan Melayê Cizîrî berî Camî bûye ! Ger ew qas sal Mela berî Camî be, çima Camî dibêje, min pîremêrek dî ji Cizîrê ?! Ango, gerek Mela di dema Camî de be û bi kêmanî 60-70 sal jîyê

Melay bin lew Camî ji wî re gotiye pîremêr. Di nava kurdan û Farisan jî de, mêr kêmtir ji wî umrî na bêjin pîremêr û jin jî 50-60 salî kêmtir nabêjin pirêjin.

Ew maye ya ku di (Meşahirul Ekrad) da gotiye "Melayê Cizîrî dîwana xwe bi diyarî ji bo xanê xanan şandiye, ku ew li Tewrêzê bûn. Ev bawerî ji wê hatiye ku mela di du beytên şîra xwe de gotiye ku destpêka yek ji wan dibêje:

(Ey şahen şahî mu'ezem heq nighdarê te bî
Sorey inna fetejna dewr madarê te bî)
ya din jî:

(Xanî xanan lamî necma te her pir nor bî keş-tiya Bextê te jî bayê muxalif dûr bî ji bo xwediyê vê bawere wesa xweya bûye ku, Melayê Cizîrî navê Xanê Xan anîye ku ew hakimek bû li Tewrêze !!

Lê ez ji vê bawerê dûr im: Ev Xanî Xanan e, ger ew bît ew gelek berî Melayê Cizîrî bû. Ew di dema Îmaduddinê Zengî de bû, ku Melayê Cizîrî 150 sala paşî wî hatiye dinê.

Ew ne merce ku hema navê Xanî Xanan got, êdî ew ewe yî ku hakimê Tewrêzê. Xanî xan navek bû şaşran ji bo padşahan bikar anîye, nemaze ji bo tirkên Osmanî ew nav hatiye bikaranîn. Lew li gor bawera min Melayî Cizîrî di beyta yekê de mebesta wî Sultan Husên Bayeqire ku sultanê dawîyê bû ji Teymoriyan,

tên ku salên 1403-1506 li Îranê paşayetî kiribûn.

Di beyta duwem jî de behsa Sultan Mehemed Faatihê Osmanî ye ku di salên 1450-1481 bi bilindî rêberîya hikmeta Osmanî kiribû. Yan jî bo Sultan Bayezîd Xanê duwem gotiye ku di salên 1481-1506 an de karûbarên hikmetê birê birine. Di şêweya şûrên wî de diyare ku ew pîrozîye li kesekî dike ye ku ji nû li ser textê hikmî rûniştî.

Ango dibe ku he Bayezîd Xan be. Ew jî inkara wê nake ku hemû padşahên Osmanîyan navê "Xan" hebû. Ango, bi awayek (teqrîbî) ne dûre ku melayê Cizîrî di sala (811 H. 1407 z) hatibe dinê û sala 886 H - 1481 z. miriye.

Mamoste Ela`ddîn Siccadî bi dirêjî di pirtoka xwe (Tarîxa Edebyata Kurdî) de behsa Melayê Cizîrî kiriye ku ew pirtok di 1952 an de li Bexdayê çap bûye. Eva ku me wergerandî ev çende ya ku derheqa bûn û mirina Melayê Cizîrî de hatîye nivîsandin.

TERMÊN EDEBÎ

Rojen BARNAS

Zengîniya zimanekî ji zengîniya bêje û termên di wî zimanî pêk tê. Term, nav an nasnavê mefhûmên ilmî û hunerî ne. Edebiyat ji alîkî ve jî hunermendî ye. Ji bo nasîn, lêkolîn, nerxpedan û bi nasîn dayina ilmekî an hunerekî hewcedariya meriv bi van nav an nasnavên taybetî (term) heye, ku ji vê hewcedariyê termînolojî hatiye afirandin, da herkes ji gotinekê an ji nasnavekî eynî tiştî fêhm bike.

Wekî her zimanê zindî û yê afirandina hunerê, hewcedariya zimanê me jî bi termînolojiya şaxên ilmê û hunerê cihê cihê heye. Ji vê dîtinê em bi rê ketin û me xebata bihevghandina termên edebî da ber xwe.

Me bernameye xwe ya "termên edebî" ji edebiyata klasîk ber bi edebiyata nûjen danî.

Hin term hene ku ew bi xwe erebî ne; wekî *xezel*, *qesîde*, *mesnewî* ku di giştî edebiyatên Rojhelata Navîn de wisa tên binavkirin, ji bona wan navekî kurdî danîn ewçend ne pêwîst e.

Kurmanciya termên vê xebatê bi tenê di maneya wan a edebî de ye. Hin term gengaz e ku di zimanên dinê de ji bilî edebiyatê di hin şaxên ilm û hunerên de jî bêne bikaranîn û maneyên wan ên cihê hebin. Lê kurmanciya wan

her di maneya wan a edebiyatê de hatiye danîn. Divê xwendevan lê miqate bin.

Di amadekirina vê de, min metoda "rêber" an "ansîklopedî" an "rêbera termên edebî". ji vê bonê heta diva me bi nimûne û şema terman îzah kir.

Hêvidar im ku ne îro be jî siberoj bi kêrî hewcedaran bê.

Edebiyat: Di maneya fereh de navê giştî yê hemî tiştên devkî û nivîskî yên hunermendî, zanistî û pêşeyî ye.

Edebiyatabedew: Navê giştî yê hemî hunerên devkî û nivîskî ye ku şîir, roman, çîrok û h.w.d dikevîne navê.

Edebiyata pêşeyî: Navê giştî yê nivîsarên zanistî (tîb, matematîk, fizîk) û yên pêşeyî (meslekî) ye.

Pêş: Kar, meslek

Vegotin: (vêbêje)/**vegêrîn** (vegêre) **Çîrokek**, bûyerek, serpêhatiyek gotin.

Vebêj/vegêr: Ew kesê ku tişteki vedibêje.

Riyênvegotinê: Riyên ku meriv xwezî û daxwaziyên xwe pê vedibêje, ku ev dido ne

1. *nesr* / *peşan* Vegotina bê kêş û aheng, wek axaftina rojane.

2. nezm Vegotina bi kêş û beşavend.

Mezûr: Berhemên bi nesrê hatine vegotin.

Menzûm: Berhemên bi nezmê hatine vegotin.

Edebf 1. Tiştê ku bi edebiyatê re têkildar e, 2.

Berhema ku di warê hunermendiya edebiyata bedew de xwedî rûmetekî ye.

Kêş: Wezin, pîvan

Kêşên çendahîn: Weznên bi jimarên kîteyan çêdibin.

Çendahîn: Kemmîyet, kantite

Kêşên çawahîn: Kêşên ku li gora hêjayiya kîteyan-wek kîteya dirêj û kurt, ya vekirî û girtî-çêkirî.

Çawahîn: Keyfîyet, kalik.

Kêşa kîteyî: Kêşa ku li gora jimara kîteyan çêdibe.

Di kêşên kîteyî de cihê rawestîne ye. Herwekî di kêşeke $4+4+3=11$ de, rawest di pey kîteya çaran û ya heştan de tê. Ku kêş $4+3+4=11$ be wê gavê rawest di pey kîteya çaran û heftan de heye. Ku kêş $5+6=11$ be rawestek bi tenê heye û ew jî di pey kîteya pêncan de tê.

Kanî Dêrşew/ka Herekol./ka Kepir

Ka zozanên/Bavê-Têlî/ka kê bir

Dibêjin ku/Birca-Belek/hilweşî

Text û bextê /botiyan de/ka geşî

(Herekol Azîzan)

Rewest bi nîşandeka (/) hatiye nîşandan.

Kêşærûzê: Kêşeke çawahîn e, ku li ser bingehê dirêjî û kurtî, vekirîbûn û girîbûna kîteyan çêdibe. Ji edebiyata ereb derbasî edebiyata faris û ji edebiyata faris jî derbasî edebiyatên klasîk ên welatên musulman biye. Nezmên edebiyata kurd ên klasîk gişt bi vê kêşê hatine nivîsandin.

Qalib: Kêşa rêzeke nezmê ye, ku ji çend perçeyên (<cu>) kêşê pêk tê. Herwekî

Di feşla nûbiharê da digel dîlber biçin geştê

Ji ew xwestir"umur nabit, li min ew qewî

xweş tê.

(Xanî)

Di fes la nû bi har ê da di gel dîl ber bi çin geş tê

Ji ew xweş tir u mur na bit, li min ew hal qe

wî xweş tê.

Me fa î lun me fa î lun me fa î lun me fa î lun

/ / / / / / / / / / / /

cu>

qalib

Pevgihandek: Ji bona vekirî xwendina kîteyeke girtî, dengdara (konson) dawîya bêjeyekê jê veqetandin û bi gihandina bêjeya di pey a ku bi dengdêr (vowel) destpêkirî xwendin e.

Herwekî

Hin gul û hin enber in, hin şîrîn û esmer in

(Cizîrî)

Meriv dikare vê rêzê bêje ji hevûdu veqetandî (bi<fesil>) bixwîne;

Hin/gul/û/hin/enber/in,/hin/şîrîn/û/ esmer/in.

û meriv dikare bi awayê jêrîn bixwîne;

Hin gu/ l û/hin /enbe/ r in/ hin şîrî/n û esme/ r in

Li vê derê di <gu/ û>, <r in>, <n û> de pev-gihandek hatiye kirin ku dengdara dawîya <gul>, <enber>, <şîrîn>, <esmer> bi dengdêra serê bêjeya ber xwe ve bi riya xwendinê hatiye gihandin ku pev-gihandek ev e. Ji vê re <wesil> jî tê gotinê.

Jêveqetandek: Jê re fesil jî tê gotinê ku berevajiyê pev-gihandekê ye. Çi pev-gihandek û jêveqetandek ji bona ahenga kêşê tê kirinê. Jê re <fesil> jî tê gotinê. (Binerê li nimûneya pev-gihandekê).

Kîteyavekirî: Kîteya ku bi dengdêrekê diqede, herwekî ba, şe, rê, bi, ko,du.zû.

Kîteya dirêj: Kîteya ku bi dengdêreke dirêj (a,ê,i,û) diqede.

Kîteya kurt: Kîteya ku bi dengdêreke kurt (e,i,o,u) diqede.

Kîteyagirtî: Kîteya ku bi dengdarek (konson) diqede, herwekî kal, berf, zêr, cil, pîr, bor, kûr, cur.

Beşavend: qafiye. Drûvpêketina dangan a di kîteya dawin a bêjeyan de ye.

Beşavendaçaryek: beşavenda ku bi nêzedeng-darekê diqede <gu> û <ka>.

Nivbeşavend: beşavenda ku bi dengdareke wekhev diqede <mil>, <pal>, <bel>.

*Tu yî qadir bi yek emrê te yê <kin>!
Mukemmel bûye alem bêserûbin
(Şêx Eskerî)*

Beşavendatam: beşavenda ku bi dengdêrek û dengdarek wekhev biqede <mil>, <ki>, <dil>.

*Îd e îro bê qerar im ez ji feqda dêmdurê
Bê hebîb im, bê hebîb im, bê hebîb im, bê hebîb*

Herkesek ba yarê xwe d' meşyan di sehrayan li rê

Pur keîb im, pur keîb im, pur keîb im, pur keîb

(Şex Evdirehmanê Axtepî)

Beşavendazengîn: beşavenda ku dawiya wan bi diduyan zêdetir dengdar û dengdêrên wekhev biqede <man>, <zeman>, <deman>, <guman>.

Gelî biran werin cengê

Bişoyin dil ji vê jengê

Bibêjim ez heta kengê

Nehin yek j' me bi vê rengê

(Mustefa Ehmed Botî)

Beşavendahev deng: beşavenda ku bi du an zêde gotinên dengdar û dengdêrên wan wekhev, lê maneya wan cihê tê çêkirin

Şahîngêhê textekê Medîne

Mu' ciz ji te ew qeder medîne

(Xanî)

Beşavenda rast: beşavenda ku wek rêza aa,bb,cc,dd... li dû hev tên.

Binve xweşiya dil û du çavan (a)

Dadê ji te re her ro nîgehban (a)

Da zû tu mezin bî Bedirxan (a)

Binve kezeba min bin ve lo! lo! (b)

(Emîr Alî Bedir-Xan)

Beşavendaçeprast: beşavenda ku wek rêza a b a b, cd cd, tê danîn.

Hê ji min dil herişandê (a)

Suhtiyê arê te me (b)

Hiş û aqil şewişandê (a)

Sews û bîmarê te me (b)

(Osman Sebrî)

Beşavendapêçayî: beşavenda ku li rêza a b b a a tê danîn.

Bedewî çilmisî f`ber pêlên zeman (a)

Lê şabaş! di dêlvê jûrtî geş bû (b)

Dilbera ku di wextê de keleş bû (b)

*Gula geş e, li baxê aqilmendan (a)
(R. Barnas)*

Redif: bêje an kîteyên di nivîsandin û maneyê de wekhev ên di dawiya beşavendê de tên.

Bizan ko min yar ti wî

Dil jî birîndarti wî

(Feqiyê Teyran)

yar û birîndar beşavend in.

ti wî redif e.

Rêz: rêza nivîsarê ya nezmê an nesrê.

Malik: beyit. Durêzeyaya nezmê.

Azade: rêza bi serê xwe ya nezmê ku ne bi malik an bi perçekî nezmê ve ye.

Takemalik: malika bi serê xwe ku ne di nav xezel an qesîdeki de ye.

Malikadestpêkî: metle`. Di xezel û qesîdeyan de malika destpêkirinê.

Xweşmalikadestpêkê: husnî metle`. Malika diduyan a xezel an qesîdeyê.

Xweşmalikadawiyê: husnî meqte`. Malika diduyan a paşî ya xezel an qesîdeyê.

Malikadawîn: meqte`. Malika dawîn a xezel an qesîdeyê ku di xezelan de navê şair di vê malikê de derbas dibe.

Şahmalik: şahbeyt, beyt ul xezel. Malika herî bedew a xezelê.

Bend: koma rêzên nezmê ku ji çar, pênc, şeş... deh rêzan pêk tînin.

Xezel: teşeya sereke ya nezma edebiyata dîwanî ye. Ji malikan pêk tê. Bi gelemperî, bi hindiki ji pênc malikan dest pê dike û heta bîst, bîst û pênc malikan jî dirêj dibe.

Numûne

XEZEL

"Er" er xerame bi qedd û qamet

Yek bûse dame bi sed qiyamet

malika destpêkî (metle`)

Yek bûse bexş ewwel bi îhsan

Axir li min kir cirm û xeramet

xweşmalika destpêkê (husnî metle`)

Ji jeng û zergê da dil bişotin

Cama sedef bîn rind û keramet

Ji herdû çeşmên te y`mest û xûnrêz

Nûra du çeşman kê di selamet

*Li derdû êşan peykan û nişan
Me j'herdû çeşman kifş in "elamet"*

*Ruswayê "işqê tenha ne ez bûm
Kes dî zemanan hub bê melamet
şahmalik (beyt ul xezel)*

*Du secde ferz in filhal bibin ber
Dema xuya bit ew qed û qamet*

*Da eybê rindan nekî bi badî
Nufûsu qewmîn biha tesamet
xweşmalika dawiyê (husnî meqte')*

*Mela li "umrî bêfayde bûrî
Kêşa bi zoran qehr û nedamet*

malik dawîn (meqte')

(Melayê Cizîrî)

----- a

----- a

----- b

----- a

----- c

----- a

----- d

----- a

----- e

----- a

----- f

----- a

Xezelarêzkirî: xezela ku rêzên wê di nîvekê de ji bi beşavend e û gava meriv rêzê di nivî de dişkêne malik dibe kerte. Jê re xezela musammat ji tê gotin.

Numûne

Serwînazê **serfirazê** şubhê zêr remza **mecazê**
Dame ber çakûç û gazê dil ji min bir dil ji min

(Melayê Cizîrî)

Serwînazê serfirazê

Şubhê zêr remza mecazê

Dame ber çakûç û gazê

Dil ji min bir dil ji min kerte

Nezîre: carina şair ji xezelekê ku şairek din nivisandiyê gelek hez dike. Ji ber vê hezkirinê an ji ber rêzgirtina wî şairî, şair xezelek dinivîsîne ku ev xezel bi babet, kêş, beşavend, redif, di dirûvê wê xezelê de ye.

Qesîde: Ji curên nezmê yê edebiyata dîwanê ye ku bi mebesta pesindayin an navnokirina yekî an tiştêkî tê nivisandin. Teşeyê qesîdeyê wek yê xezelê ye, ji malikan pêk tê. Malikên qesîdê ji sihî heta not û neha ne. Lê yê zêdetir ji hene.

Avakirina qesîdeyê bi gelemperî li gora vê rêzê çêdibe

1. Xweşkirin (teşbîh) bira pêşî ya qesîdeyê ye, ku şair bi teswîrkirina tiştêkî dest bi qesîdeya xwe dike. Ev teswîr dibe a cejn, bihar, bajar, şûr, roj, gul, havîn, payîz, zivistan, hesp, sunbil, remezan û h.w.d be.

2. Gurîzgeh malika derbasok a ji bira <xweşkirin> ê derbasî bira mebestê ango pesindanê bûn e.

3. Pesindan (medhiye) bira bingehî ya qesîdeyê ye ku mebesta şair di vê de kom dibe. Şair di vê birê de pesnê merivekî mezin dide.

4. texezzul xezela di pey pesindanê de ye.

5. Xwepesindan (fexriye) di vê birê de şair pesnê xwe dide.

6. Tacmalik malika ku navê şair tê de derbas dibe, ku ev malik di dawiya bira xwepesindanê (fexriye) de tê.

7. Hêvî (du`a) di vê birê de şair ji bo ew kesê ku pesnê wî daye duayên qenc dike, û bi vê birê qeside diqede.

Mesnewî: yek ji teşeyên nezmê edebiyata dîwanê ye, ji malikan tê honandin û her malik di nav xwe de hevbeşavend e. Di babetên dirêj û çirokan de ev teşeyê bikaranîn. Mem û Zîn û Mewlûd bi vî teşeyî hatine nivîsandin.

Kerte: qit`e. Bi hindikî ji çar rêzan pêk tê.

Sêyîn: perçeyên sêreze ne. Hevaxaftina Melayê Cizîrî û Faqiyê Teyran bi sêyîna ye.

Çarîn: rubaî

Çarane: murabba`. Ji bendên çar rêz pêk tên.

Pêncane: muxemmes. Ji bendên pênc rêz pêk tên.

Şeşane: museddés. Ji bendên şeş rêz pêk tên.
Heftane: musebba`. Ji bendên heft rêz pêk tên.
Heştane: musemmen. Ji bendên heşt rêz pêk tên.

Nehane: mustessa. Ji bendên neh rêz pêk tên.

Dehane: muşşer. Ji bendên deh rêz pêk tên.

Çaranekirî: terbi`, Bi du rêz zêdekirina li malikên xezela şairekî dinê çêkirina çarane ye.

Çaraneyahevrêz: Çaraneya ku rêza çaran a benda pêşî di dawiya her bendî de tê tekrar kirinê.

Çaraneyahevbeşavend: çaraneya ku rêzên dawîn ên her bendê bi rêza dawî ya benda pêşî re hevbeşavend e.

Serdeyî: ji bona çêkirina çaranekirî (an pêncanekirî, şeşanekirî, ... dehanekirî) li serê malikên xezela dê bê çaranekirin (û yên din) zêdekirina bi du rêzan e. Di pêncanekirinê de sê, di dehanekirinê de heşt rêz tên zêdekirin.

Nêvdeyî: ji bona çêkirina çaranekirî (an pêncanekirî... dehanekirî) di nav rêzên malikên xezela dê bê çaranekirin (an yên din) zêdekirina bi du rêzan e. Di pêncanekirinê de sê rêz, di dehanekirinê de heşt rêz lê têne zêdekirin.

Numûne

-----malika xezela ecibandî

XXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXX
XXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXX du rêzên çaranekirinê yên şair

XXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXX
XXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXX (serdeyî)

----- çaranekiriya serdeyî

XXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXX
XXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXXX (nêvdeyî)
----- çaranekiriya nêvdeyî

Pêncaneyahevbeşavend: terdiye. Pêncaneya ku rêzên pêncan ên bendan ne hevrêz in û ne jî hevbeşavend in.

Vegerbend: terc`î bend. Teşeyek ji teşeyên nezmada dîwanê ye ku ji bendan pêk tê. Her bend bi drûv mîna xezelê ye û malika dawîn a benda pêşî di nav xwe de hevbeşavend e, ku ev malik (vegermalik) di pey her bendê de bêguhartin tê.

Vegermalik: malika di dawiya bendên vegerbendê de ye, ku erka wê bi vegera li ser benda pêşiyê bendan bi hev ve girêdide.

Girêbend: terkîbî bend. Wek vegerbendê ji bendan pêk tê. Malikên di dawiya her bendê de bi serê xwe hevbeşavend e û erka wê girêdana du bendan e.

Girêmalik: malikên di dawiya bendên girêbendê de nê.

Hunerênedebî: hunerên gotin û vegotinê ne.

Hevdengî: hunerê hevdeng çêkirinê (binêre li hevdeng).

Hevreh: hunerê bikaranîna gotinên ji rehekê ye.

Pircare: tekrîr. Ji bona xurtkirina tesîra gotinê, hin gotin an hevokan pir car dîsakin e. Herwekî <merheba> yên di Mewlûdê de.

*Merheba ey sirrê Furqan merheba
Merheba ey derdê derman merheba*

*Merheba ey canê baqî merheba
Merheba "uşşaqê saqî merheba*

*Merheba ey alî sultan merheba
Merheba ey kanê "îrfan merheba
(Melayê Bateyî)*

Jêwergirtin/Jêveguhastin: îqûbas. Ji bona bihêzkirina gotina xwe, bikaranîna gotinêk ji yekî dinê ye. Di edebiyata dîwanî de ev bi piranî bi bikaranîna ayetek an heftêkî pêxember dihat kirin.

Pêç û belav: lef û neşir. Berê vebîrandina du an çend tiştan e, û di pey de gotina tiştên ku girêdayê bi wan ve ne. Bi vî awayî sîmetriya bêjeyan tê çêkirin.

*Bes niye her dil te xûyê Pîrê Sen`anî mesel
Bendê benda kafirê bê dîn û bê îmanekê.
(Pertew Begê Hekarî)*

Lêveger: hunereke edebî ye, ku meriv gotina

dawîn, an gotineke bingehîn a dawiya rêza an malika berê di serê rêza an malika nû de dubare dike û bi vê, li rêza an malika berê vedigere.

.....

*Berê xwe da bi min carêk hilîna xadimê çarîk
Me dît hilbû ji wê nalek çî ku zêra şefeqdabû*

Şefeq dabû me qenc dîtin guhar û berben û tîtin

*Mixalîf new`û texlîf in, muresse`cumle
lêdabû*

Muresse`teyr û qemçî ne, rex û rex belg û rêşî ne

Hemî zêr û mirarî ne, li ser eniyê temenna bû.

(Bekir Begê Erzî)

Nezaniya bi zanîn: tecahul ul`arif. Tevî ku meriv bi rastiyê dizane lê ji bo zêdekirina hêza pêjnê, xwe li nezaniyê datîne.

*Xoceyê Xidrî xelet çû kaniya ava heyat
Lêvê le`lê te y`şeker-rêz bê guman ew kanî ye.
(Cegerxwîn)*

Xweşbehane: husnî ta`lil. Bûyîna tişteki an bûyerekê, ne bi sedemê wê yê rastîn, lê bi bahaneke xweş nîşandayin e.

*Telbe kir weslê ji dilber me bi "inwanî zekat
Go tu ebd î û bi ebdê xwe zekatê nadim.*

(Melayê Cizîrî)

Kesandin: teşxîs. Kesayetiya (şexsiyet) mirovan dayina tiştên neheyber wekî dar û ber, û heywanan e. Di şîr û çîrokên de heywan, û tiştên ne heyber (bi ruh) wek ku xwedî kesayetiya mirovî bin, ango wek mirov bin bi mirovan re didin û distînin an wek mirovan dilivin.

*Tawis bi wî şiklê melîh şermendeyê saqê di
reş*

*Ew qijika gûxwir binêr, qîj qîj dîkî<elwan
im ez>*

(Axayok)

Şermendebûn (berxweketin) û pesindarî taybetiya mirovan e, perçeki ji kesayetiya mirovan e ku bi heywan û tebayan re peyda nabe. Lê li vê derê şair kesayetiya mirovan daye tawis û qijikê ku tawis şermî û qijik jî qure ye.

Peyivandin: întaq. Heywan û heyînen neheyber wekî ku mirov bin, bi peyivînin dayin e.

*Rovî gotê ez xulam Ji Kurdistan heya Şam
Min nedîn wek gurê zer Bê mêjî û zirt û ker
(Roviyê Jir-Osman Sebrî)*

Lîhevî: tenasub. Bi hev re bikaranîna du an çend gotînen ku ji aliyê mane, babet an cureyî ve têkiliya wan bi hev re hebin.

*Serxweşê cama şerbetê dêm şubhê şem`a zul
metê*

*Horiya d`baxê cennetê serdarê çendîn
mehweş e.*

(`Eliya Herîrî)

Di vê malikê de serxweş - cam(piyan) - şerbet(mey), şem` (find)- zulmet(tarî), horî-baxê cennetê û mehweş(mîna hîvê/heyvîn) ji aliyê mane, babet û cureyî ve têkildar in.

Pirs: Ne ji bona bersîv stendina tişteki ku meriv pê nizane, lê ji bona balkişandin û xurtkirina pêjnê hunera gotinê ya bi riya pirsê ye.

*Ew çî bejn e, ew çî qamet, ew çî qedd e, dil
ruba?*

*Ew çî exbar in, te can de, ew çî durr in, pur
buha?*

Ew çî narinc û turunc in, ew çî sêv in, sîneca?

*Ew çî mehtab in, binagûş, ew çî subh e,
nûrfeza?*

Rohniya şama firaqê, şem`û mala kê yî tu?

(Macin)

Niçlêdan: taariz kirin. bi mebesta tinaz pêkirinê an yekî piçûkxistinê an jî niçlêdanê, gotina xwe bi maneyeke bi temamiyê bervajiyê wê gotinê gotin e. Herwekî ku ji yekî derengmayî re meriv bêje, ev çî heliza te bû tu çima ew çend zû hati.

Niç: taariz (t) dokunma (f)satire (e)satire

Dirûvpêxistin: Teşbîh. Du tiştên an kesên ku dirûvê wan bi hev kevin, dirûvê yê qels bi yê xurt xistin e. (t)benzetme (f)allégorie (e)allegory

Herwekî: Zozan wek gulekê xweşik e.

HÊMANÊN DIRÛVPÊXISTINÊ: Çar hêmanên dirûvpêxistinê hene.

1. **Dirûvpêketî:** Mûşebbeh. Yê dirûv pê dayî (yê qels). *Zozan wek gulekê xweşik e. Zozan dirûvpêketî ye.*

2. **Dirûvdar:** Mûşebbehun bîh. Yê diruv pê xistî (yê xurt). *Zozan wek gulekê xweşik e. Gul dirûvdar e.*

3. **Dirûv:** wechî şebah. Aliyê an awayê dirûvpêketinê ye. *Zozan wek gulekê xweşik e. Xweşik aliyê dirûvpêxistinê ye, dirûv e.*

4. **Daçekê dirûvpêxistinê:** edatî şebah: *Zozan wek gulekê xweşik e.*

<Wek> daçek e û li vê derê daçeka dirûvpêxistinê ye. Ji bili <wek> ê daçekên dirûvpêxistinê ev in: mîna, nola, asa, misl, manend, weş, goya, sankî, meger, çawa, çend...

CURÊNDIRÛVPÊXISTINÊ:

1. **Dirûvpêxistinateveki:** Teşbihî mufessel: dirûvpêxistina bi her car hêmanane; dirûvpêketî, dirûvdar, dirûv û daçeka dirûvpêxistinê pêkve hene. Herwekî: *Zozan wek gulekê xweşik e.*

2. **Dirûvpêxistinakurtane:** teşbihî mucmel. Dirûvpêxistina ku bê hêman dirûv tê çêkirin. Herwekî: *Zozan wek gul e.*

3. **Dirûvpêxistinaxurtkîrî:** teşbihî muekked. Dirûvpêxistina ku bê daçek tê çêkirinê. Herwekî: *Bi xweşikbûnê Zozan gul e.*

4. **Dirûvpêxistinarewan:** teşbihî belîx: dirûvpêxistina ku bi tenê bi dirûvpêketî û dirûvdar tê çêkirin. Herwekî: *Zozan gul e.*

5. **Dirûvpêxistina kurt:** teşbihî mûcez: teşbiha bi gotinên herî hindik tê kirin.

Hinarîk gul, temorîk gul, çav û dev pêkve gil xonçe.

Ne guldan e dilbera min, lê gulistan e, rinda min. (R. Barnas)

Di vê numûnê de : hinarîk wek gulê sor e, temorîk mîna gulê bi xweşbihne, çav nola gulê geş e, û dev jî mislê gulê lihev, xwezîbij û dilkêş e. Ji van heryek bi awakî dişihîbin gulê. Ev piranî jî dibe di gulekê de bi serê xwe peyda nebe, lê bi tenê di gulistanê de hebe.

6. **Dirûvpêxistina nimandî:** teşbiha temsîlî. Di

navbera dirûvpêketî û dirûvdar da carina gelek aliyê dirûvê hene ku hunermend ne bi tenê bi aliyekî lê bi gelek aliyên dirûvdayinê dirûvpêxistinê çêdike. Ji vê dirûvpêxistinê re dirûvpêxistina nimandî tê gotin.

Mecaz: bikaranîna gotinê ya ji maneya wê ya bingehîn bi maneyeke dîtir e. (t) mecaz (f)métaphore (e)metaphor

Mecazahinartî: mecazî mursel: Bê mebesta dirûvpêxistinê bikaranîna mecazê ye. (t)mecazi mursel (f)métonymie (e) metonymy

Îstiare: dirûvpêxistina ku bi tenê an ji dirûvpêketî an jî ji dirûvdar pêk tê.

Îstiaravekîrî: îstiarêî musarraha. Îstiareya bê dirûvpêketî (mûşebbeh) ye.

Îstiaragîrî: Îstiarêî mekniye: Îstiareya ku bê dirûvdar tê çêkirinê.

Mezmûn: îstiareyên vekîrî ne. Dêlva çav ahî, dêlva bijang tîr, zulf, kafîr, perîşan, dev, hoqe, nuqte.

ÇEŞNÊN EDEBÎ

(t) edebî turler (f)genres littéraires (e) literary genres

1. **Çeşnên bingehîn:** Ji bilî şîrê li gora mebest û teknîkên xwe, ji sê koma pêk tên.

a. **Çeşnê vegotinê:** Destan, çîrokên xeyalî (bi perî, dêw, cin), çîrokên gelêrî (serpêhatiyên mirovîn ên gelêrî);

fabl: (çîrokên ku qehremanên wan rawir in), kurteçîrok, mesnewî, çîrokên hunerî (yên nivîskarî), roman.

b. **Çeşnê rapêşiyê:** Çeşnên şanûgeriyê (tiya troyê).

c. **Çeşnê ramanî:** Nivîsarên wek bend, cêri bandin (Fr. essai), subbet.

2. **Çeşnên alîkar:** Çeşnên alîkar hem di nav çeşnên bingehîn de wek hêmanek alîkar têne bikaranîn, hem jî bi serê xwe lixweser hene: Biografî (jînenîgarî), bîranîn, ger, name, gotar, rexnenivîs, dîrok.

Destan: (t)destan (f)épopée (e) epic

Destanf: (t)destansal (f)épique (e)epic

Efsaney: (t)efsane (f)légende (e) legend

Efsaneyî: (t) efsanesel (f)légendaire (e)legendary

Bend: (t)makale (f)article (e)article

Gotar: (t)nutuk (f)discours (e)speech

Cêribandin: (t)deneme (f)essai (e)essay

Dram: Afirandina tiyatroyê ya dîlpêşewitîn û pêkenîn pêkve heye (t)dram (f)drame (e)drama

Dramnivîs:Nivîskarê dramê.

Komedî: Afirandina tiyatroyê ya pêkenînê ye.

Komedînivîs: Nivîskarê komediyê.

Trajedî: Afirandina tiyatroyê ya dîlpêşewatê ye.

Trajedînivîs: Nivîskarê trajediyê.

Şanûgerî:tiyatroyê

Şanû: (t)sahne (f)scène (e)stage

Şanûger: Listikvanê tiyatroyê.

Ramana sereke: Di nivîskarê de fikra esasî, fikra bingehîn. (t)ana fikir (f)idée principale (e)main idea

Hevûp: (f)Anagramme. Hunera bikaranîna gotinên ku tîpên wan wek hev in, lê mane û xwendina wan cihê ye.

Herwekî: Selma û Elmas, Nisan û Nasîn, Ber û Reb.

Deredemî: Hunera bûyerekê an kesekî bi zanîn

di tarîzeke dîtir de nişan dayin (f)anachronisme.

Bênav: Nivîskarên ku nivîskarên wan ne diyar in, û wek malê gel gişt bi kar ûnin. Çîrkên bênav; çîrokên gelêrî. (t)anonim (f)anonyme (e)anonymous.

Bênavî: (t)anonimlik (f)anonymat (e)anonymity

Navber: Di leyistika tiyatroyê de navbera du perdeyan (t)fasîla (f)entracte (e)intermission.

Peyvnasî: termînolojî.

Vegotin: (t)anlatmak (f)conter, raconter (e)to relate, to tell

Çîrok: (t)hikaye, masal (f)conte (e)tale, story.

Çîrokbêj: (t)masal, hikaye anlatan

Rapêşî: (t)gösteri (f)représentation (e)performance.

Rapêş kirin: (t)temsîl etmek (f)représenter (e)to perform.

Leylîzvan, listikvan: (t)oyuncu (f)acteur, comédien (e)actor, comedian.

Şadîk: (t)eglendirici (f)ameuseur, divertisseur (e)entertainer.

Hevmane: (t)deşanlı (f)synonyme (e) synonymous.

EDEBIYATA KURDÎ YA SURGUNÊ

LI SER EDEBIYATA KURDÎ YA SURGUNÊ
Û
LI SER ROMANÊN MEHMED UZUN,
FIRAT CEWERÎ BI MAHMÛD LEWENDÎ, XELÎL DIHOKÎ
Û
MEHMED UZUN RE PEYIVÎ

FIRAT CEWERÎ

FIRAT CEWERÎ: Bi hatina 12'ê Îlonê re hem tevgera kurdî, hem jî tevgera demokratîk a Tirkîyê darbeyek mezin xwar. Bi hezaran mirov di îşkenceyên nedîtî de derbas bûn. Pîr ji wan hatin kuştin. Hinekên jî xwe bi hoyin gellek zehmet gihandin Ewrûpa. Îro, bi alîkariya wan kurdên ku xwe gihandine Ewrûpa mirov dikare behsa edebiyateke kurdî a nûjen bike. Bi dîtina hin kesan hatina 12'ê Îlonê ji vê yeka han re bû sedem. Gelo hatina Cûntayê ji bo geşkirina ziman û edebiyata kurdî baş bû, Mahmûd Lewendî ?

MAHMUD LEWENDÎ: Ji bo ku kek Xelîl jî li vê derê ye, ez nabêjim edebiyata kurdî bi tevayî, lê ez ê bêjim edebiyata kurdên Tirkîyê. Ji ber ku edebiyata kurdî li Kurdîstana Iraqê heye û berê jî hebû. Ji aliyekî de mirov kare bêje, ku piştî heştêyî grûpek ji kurdên Tirkîyê ku xwe gihandin Ewrûpa, di warê edebiyatê de hin tişt kirin. Lê gelo cûnta nehata wê çawa ba ? Berî cûntayê jî edebiyata kurdî hebû. Qels ba, siyasî ba, yan ê grûban ba jî, Roja Welat hebû

bi kurmancî û Tirkî bû. Tîrêj hebû bi kurmancî û dimilî bû; Têkoşer hebû derdiket. Têkoşîn hebû derdiket. Kovara Özgürlük Yolu hebû cih dida Kurmancî. Kovara Rizgarî hebû cih dida Kurmancî. Ger cûnta nehata, dibe ku edebiyata kurdî li welêt bêtir geş bibûya. Di şertên herî xerab de li zindanên Tirkîyê kurdan di navbera sala 1980 û 84'an de car heb kovar derxistin. Hin ji van kovaran bi kurmancî, hinek jî bi tirkîbûn. Ez dikarim bêjim, mirov dikare li eksê wê jî bifikire. Lê jiyana surgunê tiştin din nişanî me daye. Em hatin Ewrûpayê, mumkune, ku ew tesîra welatên Ewrûpa, tesîra ku me gellek tiştên din yên kurdî dît, ku me li Tirkîyê nîkarîbû bidîtalî me bûye. Me têkîlî bi kurdên Iraqê û perçeyên Kurdîstanê yên din re danî; bi vê yekê, mirov dikare bêje, ku edebiyatek li derveyî welat çêbû, edebiyatek kurdî ji bo Kurdîstana Tirkîyê. Lê eger cûnta nehata mumkun e, ku ev yeka han li Kurdîstana Tirkîyê geş bibûya. Ji ber ku me got ya, bi Tîrêjê dest pêkir, bi Roja Welat dest pê kir, bi Rizgarî dest pê kir, dîreksiyona vê karîbû

bihata guhertin. Ji ber vê yekê, ez dibêjim, mirov nikare bêje, ku baş bû cûnta hat û bi vê yekê edebiyata kurdî derket. Lê di gel her tiştî mirov kare bêje ku edebiyata Kurdî li derveyî welêt pêş de çûye û mirov vê yeka han jî ji kovar, rojname û pirtûkên Kurdî ferq dike.

FIRAT CEWERÎ: Giraniya sohbet û gotûbêja me ya îro wê li ser edebiyata Kurdistanê Tirkîyê be. Yanî bi gelemperî li ser edebiyata Kurdistanê Tirkîyê ya surgunê û bi taybetî jî li ser romanên Mehmet Uzun. Tu bêjî nebêjî edebiyata Kurdî li Kurdistanê Tirkîyê berê jî hebû. Wek heval Mahmut Lewendî jî got, li Tirkîyê Tîrêj derdiket, Roja Welat derdiket, Rizgarî derdiket... Ji nav van hersê kovaran ya xwerû bi kurdî û hunerî û edebî bû, Tîrêj bû. Hem di nav hevkarên Tîrêjê de, hem jî di nav yên derveyî Tîrêjê de gellek mirovên jîr û jêhatî hebûn, ku karibûn di warê huner û edebiyata kurdî de tiştên pirr baş û bi qîmet bikirana.

Lê bi hatina çûntayê re ev agirê ku karibû gurr biba, hate vemirandin. Pirr mirovên me mecbûr man ku koçî Ewrûpayê bikin. Ew tevgera Kurdî ya ku ji aliyê çûntayê ve darbe Xwaribû, di hundirê xwe de jî darbeyên mezin xwarin û bi vî awayî valahiyek siyasî çêbû. Weke ku li gellek welatan bûye, Kurdan jî xwestin şûna valahiya siyasî bi edebiyatê dagirin. Yanî piştî heystêyî demekê siyasî têkçû, lê edebiyat geş bû. Mirov vê yekê jî ji weşanên Kurdî ye piştî heystêyî ferq dike. Piştî heystêyî li Ewrûpa bi dehan kovar û rojnameyên Kurdî, bi sedan jî pirtûkên Kurdî çap bûn. Bi vê yekê re jî di her şaxî de nivîskarên Kurd çê bûn. Gava mirov çavekî davêje paşeroja xwe û li avakirina Cumhuriyeta Tirkîyê dinihêre, mirov dibîne ku ji avakirina cumhuriyetê û heta bi sala 1980'î, ji çaran yekê weşana Kurdî, ku di van deh salên dawî de li Ewrûpa pêk hatiye, li Tirkîyê pêknehatiye. Di demek wilo kurt de, di bin hoyên demokratîk de edebiyata Kurdî ewçend pêş de çûye, ku mirov kare bêje di warê pêşketina edebiyata Kurdî de ev yeka şoreşek e. Kek Xelîl Dihokî tu çi dibêjî ?

XELÎL DIHOKÎ: Bi rastî ez bi xwe jî vê yeka han di warê edebiyat û rewşenbîriya Kurdî de şoreşeke mezin dizanim. Li Kurdistanê Iraqê, ez dikarim bêjim, li devera me ya Behdîna, me li sala 1970'ê de hêdî dest bi edebiyata Kurmancî kir. Hingî bi rastî hemû xwendina me bi erebî bû. Lewra bi rastî di salên 70'ê de tu tiştî jî Kurdistanê Tirkîyê nedigihîşt destên me. Ne helbestek, ne romanek... Ji ber hindê jî ev ne sûcê xelkê bû. Ez bawer im, di nav Kurdên Kurdistanê Tirkîyê de jî bi hezaran rewşenbîr hebûn, dinivîsandin, lê nivîsandinên wan bi Tirkî bûn. Li Kurdistanê Tirkîyê, ji avakirina Cûmhûriyetê û vir de Kurdî qedexe bûye. Yanî te li welatê xwe nikaribû bi Kurdî biaxifta, bi Kurdî binivîsanda. Ji ber vê yekê edebiyat bi pêş nakeve, rewşa siyasî bi pêş nakeve, rewşa civakî bi pêş nakeve. Bi hatina cûnta leşkerî, pîrriya rewşenbîrên Kurdên Tirkîyê yên hatin girtin, di zîندان de tade û neheqiyên mezin dîtin, yan jî bazdan derveyî welêt. Ev însanên ku hatin derveyî welat, hemû însanên şoreşger bûn, hemû însanên welatperwer bûn. Ev însanên ha nikaribûn li malên xwe rûnên û tiştêkî nekin. Divabû ku tiştêkî bikin û xizmeteke mezin bo welatê xwe pêşkeş bikin. Û bo cûnta û hemû kevneperestan misoger bikin, ku ev xelkê şoreşger, ev xelkê welatparêz, erê jî welatê xwe reviya ne, lê her tim welatê wan di dilê wan de dijî, her tim fikra pêşde birina welatê wan li bîra wan e. Ez yek ji wan kesa me ku vê pêşketina ha dibînim. Bi rastî di hundirê van deh salan de gellek tiştên bi qîmet derketine. Weke ku we jî behs kir, ku bi dehan kovar û rojname derdikevin. Tê bîra min, berî niha bi deh salan hin hevalên Kurdên Tirkî li Kurdistanê Iraqê li dev me bûn, wan nikaribûn bi hêsanî bi kurdî bipeyivin. Niho ez wan hevalan dibînim, ku nivîskar in, rojnaman derdixin, kovaran derdixin. Bi rastî Kurdên li derveyî welat zehmetî dane xwe, xwe êşandine, ku edebiyateke kurdî biafirînin.

FIRAT CEWERÎ: Gelo em karin çi navî li vê bikin ? Ma em karin navê "Edebiyata Kurdî ya surgunê" lê bikin ?



Mehmed Uzun, Mahmud Lewendî, Fîrat Cewerî û Xelîl Dihokî

Foto: Şaneşîn Cewerî

XELÎL DIHOKÎ: Bi baweriya min, herdu bi hev ve ye. Nivîskarên Kurd nikarin xwe ji welatê xwe bi dûr bixin. Nivîskarên Kurd, rewşenbîrên Kurd, heta siyasetvanê Kurd, gava ku li derveyî welat dijîn, hemû fikir û hizrên wî ber bi welatê wî de diçe, ber bi Kurdistanê diçe. Ji ber hindê ew ji Kurdistanê xwe nahitiye cûda kirin. Erê, rast e ev tiştan li derveyî welat, li surgunê têtê kirin, lê ez nikarim, bêjim, ku ev ji welêt cûda ye. Yanî ku ev surgun bûn, lema wan ev tiştan kirin. Lê dibe ku ev xelka li welatê xwe bûna, dibe ku wan afirandinên baştir bianîna pê. Çunku gava insan ji welatê xwe derdikeve, ji nav mirov û dostên xwe derdikeve, azar û derd û xemên wî pirr dibin. Ji ber ku her roj xeberên nexweş dibihîzin, dengê lêdan, îşkence û neheqiyê tê guhê wan.. Ji ber vê yekê jî ew her xwe perçeyek ji welatê xwe dibînin. Ew tu caran xwe ji miletê xwe mestir nabînin. Ez bawer im ku siberoj rewşa welêt

baş bibe, ew ê pirr ji van hevalan veşerin welatê xwe û ew ê li welêt tiştên hîn baştir biafirînin. Ji ber ku ew diçin nav cergê miletê xwe, diçin nav derd û kul azarê miletê xwe. Li vê derê gelek tişt hene ku mirov nabîne, tenê mirov bi riya radyo, televizyon û rojnaman dibihîze. Ji ber hindê, bi rastî ev qonaxa hanê ku piştî heystêyî li derveyî welêt, li Ewropa dest pêkiriye, ji bo kurdên Kurdistanê Tirkiyê şoreşek mezin e. Berî sala 1980 mirov berê xwe dida kitêbxana kurmancî mirov deh kitêb tê de nedidit; lê niha mirov bi sedan kitêban di kitêbxana Kurdî de dibîne. Mirov bi dehan nivîskarên baş dibîne, bi dehan rojnamevanên baş dibîne. Ji ber hindê ev xebata niha ku di warê edebiyata Kurdî de dibe, ez karekî gelek baş dibînim.

FIRAT CEWERÎ: Wekî têtê zanîn, di nav edebiyata me ya surgunê de di her beşî de gavên

baş hatin avêtin. Helbesta bi forma klasîk li paş ma û şûna wê helbesta serbest û nûjen girt. Jê wêdetir jî gellek çîrok û roman hatin nivîsandin. Yek ji romannivîsê me yê berde-wam Mehmet Uzun e. Mehmet Uzun li dû hev çar roman nivîsand. Romana wî ya pêşî "TU" di sala 1984'an de, "Mirina Kalekî Rind" di 87'an de, "Siya Evîne" di 89'an de û "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê" jî di 91'ê de derket. Di heft salan de çar roman. Ev hîsek çawa ye, Mehmet Uzun ?

MEHMET UZUN: Tu pirsek pîr dijwar ji min dikî. Ez ê nikaribim dîrek bersiva vê pîrsê bidim, lê gava romana min ya yekemîn derket, ez gelek serfiraz û kêfxweş bûm. bê guman, gava mirov kitêbêkê, romanekê, eserekê derdixe weke ku zarokekî nuh were dinyayê, bi mirov re eynî hîs çê dibe. Lê ez bêtir serbilind im, ku kitêbxana Kurdî bûye xwedî çar romanên din û kitêbxana Kurdî dewlemend bû ye.

FIRAT CEWERÎ: Wek me berê jî behs kir ku edebiyata Kurdî bêtir li surgunê şax da. Xuya ye ku ev surgun qedera nivîskar û huner-mendan e. Dîroka surgunê dirêj e, digihîje Yunana Antîk û Romayê. Helbestkar û nivîskarê Romî, Ovidius, surgunî perê Derya Reş bû. Descartes, Gombrowicz, Alberti, Kundera hin ji nivîskarên surgunê ne. Ji xwe di dema Nasyonî Sîsyalîzma Alman de, bi gîrsî nivîskarên Alman surgun bûn, an jî ji xwe re jiyana surgunê helbijartin. Di jiyana xwe ya surgunê de gellek êş û zehmetî kişandin, lê gellek afirandinên nemir jî afirandin. Ji xwe jiyana surgunê pîr êş û zehmetiyan jî bi xwe re tîne. Mirov ji warê xwe, ji heval û hogirê xwe, ji av û hewa welatê xwe diqete; mirov demekê wek peza ku çu li serî ketibe, gêj dibe. Bi vê gêjbûnê û ji welatê dûrbûnê, çawa dibe ku nivîskarek dikare berhemên wilo nemir xîafîrîne, an jî di bin vê tesîra han de te çawan carîbû çar roman binivîsanda Mehmed Uzun ?

MEHMET UZUN: Wek min di nivîsarek we de jî behs kiribû, surgun hem dikare miro-

van bikuje, hem jî bi pêş bixe. Êdî ew girêdayî wî merivî, wê grûbê, an jî wî miletî bi xwe ye. Meriv çawan dikare surgunê bikar bîne, çî armanc û hedef û programa mirov bi xwe heye. Gava mirov nikaribe xwe biguhere, nikaribe civata nû, zîmanê nû, çanda nû, danûstandinên nû fahm bike, xwe bigihîne wan, bi wan re yekîtiyekê ava bike; wê çaxê ez bawer nakim, ku surgun dikare merivan bi pêş bixîne û merivan nû bike. Ez bi xwe ev çardeh sal in ku li surgunê me, çardeh sal in ku ez li Ewrûpayê, li welatê xerfîyê me. Romanên min hemû li surgunê derketine û ez bi xwe jî li surgunê bûm nivîskar. Berî ku ez derkevim surgunê, ez ne nivîskar bûm. Ji ber vê yekê, ez bawer im tesîrek gellek baş û pozîtîv li min çêbûye. Tesîra surgunê pîr baş li min çêbûye. Berî du salan min jina Gombrowicz li vê derê dîtibû. Gombrowicz bi xwe nivîskarekî surgunê bû. Eslê wî ji Polonyayê bû, lê ew jî welatê xwe dût, li surgunê jiya. Bi qasî bîst û çend salekî li Arjentina bû, paşê hate li Firansayê bi cih bû. Jina wî hebekî ji min re behsa Gombrowicz kir. Digot, Gombrowicz her gav bi hesret bû, bi hesreta welatê xwe dijiya, lê di eynî wextê de bi xurtî li bûyerên der û dora xwe jî dinihêrî. Tiştên ku li Arjentina dibû, Tiştên ku li Firansayê dibû, gellekî bala Gombrowicz dikîşand. Gombrowicz ne derveyî bûyerên der û dora xwe bû. Yanî Gombrowicz ne li derveyî Firansa û zîmanê firansîzî bû, ne li derveyî zîmanê Îspanî û edebiyata Îspanî bû. Ew baş hînî zîmanê Îspanyolî nebûbû, lê bi nivîskarên Arjentinî re, bi nivîskarên Firansîzan re radibû û rûdinişt, bi wan re hevaltî dikir, her gav bi wan re bû.


Ez bawer im, ev yeka han dikare surgunê bike meydana xwepêşxistinê. Wekî dinê ez ne bawer im. Yanî bi sedan, bi hezaran, bi sedhezaran jî însan windabûne, têk çûne. Gellek nivîskarên baş hatine, lê li surgunê nikaribûne bi ser kevin, lê têk çûne. Yanî gotina min ew e, divê mirov xwe li surgunê nû bike, ev pêwîst e. Şert û îmkanên vê jî hene. Gava meriv zîmanekî nû hîn dibe, wê çaxê meriv wî zîmanê nû û zîmanê xwe dide ber hev. Gava meriv rastî

çandeyek nû tê, civatek nû tê, meriv yên nû û yên xwe dide ber hev. Bi vî awayî meriv dikare hîn kûrtir, hîn baştir û hîn firehtir yê xwe ji fêhm bike. Ew mesafa ku di navbera meriv û welêt de jî heye, dikare afikariya merivan bike, ku hîn firehtir û xurtir bikaribe bûyerên welatê xwe, meselên welatê xwe, meselê çanda xwe bibîne. Ez carna vê mîsalê didim, ku pîrr caran gava meriv di nav daristanê de ye û li daran dinêre, hingî meriv darekê an du daran dibîne, lê gava meriv li derveyî daristanê ye, em bibêjin, gava meriv li ser girekî, li ser çiyayekî li daristanê dinêre, meriv hemû daristanê dibîne. Surgun dikare wisan be, ku meriv li ser girekî, li ser çiyayekî ye û li daristanê, li welêt dinêre û dikare wê hemû bibîne.

XELÎL DIHOKÎ: Ez dixwazim tiştekî din lê zêde bikim, ku bi rastî jî sohbeta me bêtir li ser mersela Kurdistana Tirkîyê ye, yanî li vê derê tiştê herî girîng ew e, ku li Swêdê, li

Ewrûpayê, ji bo însanên nivîskar azadiyek gellek mezin heye. Yanî berî niho bi rastî li Tirkîyê ziman qedexe bû, mumkun nebû xelk bi zimanê xwe biaxife, qedexebû tu rojname û kovaran derêxî, qedexebû tu kitêban çap bikî, qedexebû tu semîneran pêşkêş bike, ji ber hindê di rewşek wisan de, mirov nikare bi pêş keve jî. Bes niho gelek derî li ber nivîskarên Kurdistana Tirkîyê vekirîye, ku di vê azadiya niho heye de, tu bi azadî dikarî semînera bidî, dikarî kitêban çap bikî, dikarî kovar û rojnaman derêxî, tu dikarî van tiştan bigihênî xelkê jî. Ev pirtûk û kovarên ku ji aliyê nivîskarên Kurdistana Tirkîyê ve tên çap kirin, mirov bi hêsanî dikare wan bigihîne Tirkîyê, bigihîne Sûriyê, bigihîne Îraqê û bigihîne Îranê. Yanî , mirov dikare vê mersela surgunê bike bingehê mezin ku ji vê derê tiştan bigihîne welêt. Li Kurdistanê ev îmkan nîne, lê li vê derê heye.

FIRAT CEWERÎ: Gelo mirov dikare bêje



Mehmed Uzun, Mahmud Lewendî, Firat Cewerî û Xelîl Dihokî

Foto: Şaneşîn Cewerî

ku em kesên li surgunê me hem xwe û hem jî welatê xwe li surgunê baştir nas kir ?

MEHMET UZUN: Berî niha bi mehekê, vê derê, li Stockholmê, sempozyomek edebî hebû. Ev sempozyom ji aliyê komîta Nobelê Akademiya Swêdê ve hatibû amadekirin, gellek nivîskar beşdarî wê sempozyomê bûbû. Yek ji wan jî şairê Mexsikî Oktavio Paz bû.

Ez bi xwe jî beşdarî wê sempozyomê bûbûm. Oktavio Paz di zebardana xwe de tişteki gellek baş got. Got ku em nivîskarên Amerîka Latîni ku bi Spanyolî dinivîsîn, me welatê xwe, zimanê xwe û Amerîka Latîni li Parisê nas kir. Digot, gava em li Mexsikayê bûn, Mexsîka ji bo me cihan bû. Ne hemû Mexsîka jî, lê tenê perçeyekî Mexsikayê. Me Perû nas nedikir, me Kolombiya nas nedikir, me nivîskarên din nas nedikirin, lê em li Parisê gihîştin hev, me mêze kir, ku em hemû endamê malbatekê ne. Yanî hemû nivîskarên Amerîka Latîni, mîna endamê malbatekê ne, mîna ferdê malbatekê ne. Yanî bi vî awayî dikare gellek fêda surgunê bibe. Lê mîna millet, mîna gel, kurdan baş ji surgunê îstifade nekirine. Du milletên gellek jî hene ku ji surgunê gellek destkewtî bûne, yek Cihûne, yek Ermen in. Van herdu miletan surgun pîr baş bikar anîne û jê pîr baş îstifade kirine.

FIRAT CEWERÎ: Heval Mehmet Uzun mînakek ji gotinên helbestkarê Mexsikî Oktavio Paz da, ku bi gotina Paz wan xwe û welatê xwe li Parisê nas kirin. Niha heval Xelîl Dihokî, ku ji paşnavê wî jî tê fêhm kirin, ku ew jî Dihokê ye. Berî vê jiyana Surgunê gelo me çiqasî Dihok, Zaxo, Silêmanî, Mehabat, an jî cih û perçeyên Kurdistanê yên din nas dikir. Wek hûn dibînin ku vê jiyana surgunê em kirine endamê malbatekê. Kurdên Mêrdînê, Yên Wanê, Yên Swêregê, yên Çolemêrgê, yên Xarpêtê, yên Diyarbekrê, yên Mûşê, bi kurtayî yên her quncika Kurdistanê Tirkîyê hevdu pîranî li derveyî welêt nas kirin. Lê wêdetir jî Kurdên her perçeyê Kurdistanê li derveyî welêt gihan hev, li derveyî welêt hevdu

naskirin. Wan bi hev re komele avakirin, bi hev re kovar derxistin, bi hev re zewicîn... A niha pîr ji me Kurdên Tirkîyê hînî soranî bûne, pîr ji hevalên Kurdên Iraq û Îranê jî hînî zaravayê me yê kurmancî bûne. Gava em ji vê yeka han bi rê kevin, gelo em karin bêjin, ku me Kurdistana mezin, ziman û edebiyata wê li derveyî welêt baştir nas kir ?

MAHMUT LEWENDÎ: Rast e, me baştir nas kir. Ji bo min derveyî welêt kare Sûrî be, kare Iraq be û dikare Ewropa be. Gava em ji welêt derketin, me gellek kurdên perçeyên din nas kir. Êdî her kesî li gor xwe bi Kurdên derve re têkîlî danîn. Kurdên siyasî bi yên siyasî re danîn, yên ku ji edebiyatê hez dikirin, bi yên ku bi edebiyatê mijûl re dan û standin. Hema ez xwe mînak bidim, berî ku ez derkevim derveyî welêt min soranî nebihîstibû. Ez derketim min soranî bihîst. Min bihîst ku li Kurdistanê Iraqê bi hezaran tişt derketine, kitêb derketine. Gava hevalên Kurdistanê Iraqê ji me re behs dikirin, ku li Kurdistanê Iraqê lîse heye, unîversîte heye, bi kurdî ye, em ecêbmayî diman. Me ev hemû li Ewropa bihîstin. Yanî ji aliyekî de em pêş de çûn, gelo ji aliyekî de jî em ji koka xwe nehatin birrîn ?

XELÎL DIHOKÎ: Mirov dikare bêje ku pîraniya nivîskarên Kurdistanê Tirkîyê li Ewropa dest bi nivîskariyê kirin. Bi baweriya min van demên dawî di navbera nivîskarên kurd yên li Ewropa û di navbera xelkên li welêt danûstandinek çê dibe. Ev yeka han gellek girîng e. Ez bi xwe çûm Kurdistanê û min bi dehan pirtûkên Kurdî bi xwe re birin. Yanî mirov niho bi hêsanî dikare pirtûk û weşanên Kurdî bigihîne welêt. Gava ev welê be, fêdeyên surgunê pîr in. Lê eger tiştên ku li vir derdikevin negihîjin welêt, mirov dikare bêje, ku zerara wê heye, mirov ji koka xwe diqete. Bi baweriya min nivîskarên kurd ji koka xwe neqetiya ne. Li vir salê bi çendan pirtûk û kovar çap dibin, kitêbxana Kurdî dewlemend e, lê mixabin xwendevan kêmtir in. Ez bi xwe yek ji

wan nivîskara me, ku gellek li ber dikevim ku xwendevanên min kêr in. Lê eger li Kurdistanê ba, wê ne wilo ba. Berî niha bi sê mehan ez çûbûm kurdîstana Iraqê, min li wir li ser edebiyata Kurdî hin semîner dan, bi hezaran xelk dihatin. Li bajarekî wekî Dihokê me mêhrîcanêke edebî kir, bi hezaran kes hatibûn guhên xwe dida me. Li vê derê, li Stockholmê em semînerêke dikin, bîst kes tên, sîh kes tên. Divê ku nivîskarên Kurd vê hizrê bikin ku ew ne ji bo Swêdê dinivîsin, ew ji bo Kurdistanê dinivîsin, û ev kitêbên ha her wê bigihîne Kurdistanê. Ji ber ku niha rê hene. Ji ber hindê ez bawer im, nivîskarên nû fêde ji jiyana surgunê kirine. Lê divê em zehmetiyê bidin xwe û nivîs û berhemên xwe bişînin û bigihînin nava welat. Ez bawer im em ê hingî baştir bi miletê xwe ve bêne girêdan.

FIRAT CEWERÎ: Mehmet Uzun romana xwe ya pêşî, ya bi navê "TU" di sala 1984'an de li Swêdê derxist. Roman li ser jiyana xwende û rewşenbîrekî kurd yê nûgihîştî ye. Di gel ku ev romana ha di sala 1984'an de jî derketiye, ez bawer im, wê haya pîr xwendevanên kurd yên li Kurdistanê ji romanê tunebin. Ji ber vê yekê ez bawer im hem ji bo kurdên li welêt, hem jî ji bo kurdên li derveyî welêt wê baş be ku em bîskê behsa vê romanê bikin. Mehmet Uzun, gelo te di nivîsandina vê berhemê xwe ya pêşî de çi zehmetî kişandin ?

MEHMET UZUN: Zehmetiya min ya pêşîn ziman bû, zehmetiya min ya herî mezin dîsan ziman bû. Heya wê çaxê min tiştin bi kurdî nivîsandibûn, lê nivîsarên kin bûn, hindik bûn. Min heya wê çaxê eserek dirêj bi kurdî nenivîsi bû. Bi rastî jî min nizanibû, ka bê ez ê karibim eserek dirêj bi kurdî binivîsînim. Zehmetiya herî mezin ev bû. Zehmetiya dudan jî, di warê nivîsîna romanê de tu tecrube tune bû. Tradisyonek wisan tune bû.

MAHMUT LEWENDÎ: Yanî tradisyonek Kurdî tunebû ?

MEHMET UZUN: Belê, tradisyonek Kurdî, ya Kurdên Tirkîyê tunebû. Min dixwest ez derdên xwe, fikrên xwe, bîr û baweriyên xwe ji heval û dostên xwe re bibêjim, bikaribim bi wan re diyalogekê, danûstandinekê çêbikim, belkî ez karibim ji wan hinek fikir werbigirim, belkî teşwîk bibim, belkî di vî karê min de alîkariya wan jî çêbibe, lê nedibû. Ji ber ku mefûma romana Kurdî di serê hevalên min de tune bû. Diyalog çênedibû, tradisyonek, tecrûbeyekî wisan tunebû. Evana du zehmetiyên min yên esasî bûn.

FIRAT CEWERÎ: Piştî romana te ya yekemîn te sê romanên din jî li dû hev nivîsandin. Gelo ew zehmetiyên esasî ku te ji bo nivîsandina romana xwe ya pêşî behs kirin, ji bo romanên te yên din jî derbas dibin ? An jî ew dost û hevalên te, ku bawer nedikirin, tu ê bikaribî romanekê bi Kurdî binivîsîni, lê te çar roman nivîsandin, niha te fêhm dikin an na ?

MEHMET UZUN: Tu bêjî nebêjî, zehmetî her hene, lê ew zehmetiyên min yên di nivîsandina romana min ya pêşî de hêdî hêdî ji ortê rabûn. Lê di her nivîsandina esereke nû de hin zehmetiyên nû derdikevin pêş mirov. Gava ez paş de vedigerim û li romana xwe ya "TU" dinihêrim, ez zehmetî û kêmasiyên xwe baş dibînim. Ez bi tu romanên xwe jî ne razî me. Kêmaniyên wan gelek in. Lê em bêjin di werê ziman de, kêmanîya di "TU" de pîr in. Gava ez îro lê vedigerim û lê dinihêrim, ez dibînim ku min çiqas xwe êşandiye da ez bikaribim zimanê Kurdî ji bo esereke dirêj bikarbinim.

MAHMUT LEWENDÎ: Ez dikarim di vir de pîrsek biçûk bipîrsim ?

FIRAT CEWERÎ: Fermo !

MAHMUT LEWENDÎ: Tu dibêjî ku te di warê ziman de zehmetî dikişand. Baş e gelo te di warê avakirinê de jî zehmetî nedidîtin ? An jî di warê teknîka romanê de zehmetiyên te tune ne gelo ?

MEHMET UZUN: Na, di warê teknîka romanê de, di nivîsandina romana "TU" de tu diwarzî û zehmetiyên min tunebûn. Bilakîs, min pîr bi hêsanî teknîka romana "TU" ava kir.

Min ew pîr bi hêsanî nivîsî. Lê zehmetiya min çi bû? Nivîskariya min ne nivîskariyek kemilî bû. Ger ez îro "TU" binivîsînim, mumkun e, ku ez gelek tiştan jê derxim, mumkun e ku ez bêtir romanek konsantre jê derxim, mumkun e ku ez hin tiştên edebî lê zêde bikim.

FIRAT CEWERÎ: Mahmut Lewendî, ger tu romana "TU" û romana ku piştî wê derketiye, "Mirina Kalekî Rind" bidî ber hev, tu çi guherînan di romannivîskariya Mehmet Uzun de dibînî?

MAHMUT LEWENDÎ: Her çiqas ez ji romanên fêhm nakim jî, lê dîsan, bi a min di aliyê teknîka romanê de, "TU" ji "Mirina Kalekî Rind" baştir hatiye nivîsandin.

FIRAT CEWERÎ: Gava tu dibêjî "Teknîka romanê" tu dixwazî çi bibêjî?

MAHMUT LEWENDÎ: Di romanê de qehremanê romanê bêtir derdikeve pêş, mirov bêtir meselê vekirî dibêje. Mirov ji tiştên ne diyar bêtir bi dîr dikeve. Di "TU" de ew heye. Wek hûn jî dizanin, ku însanek, di hucreyekê de, bi kêzikê re qise dike û bi wasita wê kêzikê dest pê dike, diçe heta malbata xwe, diçe dewra xwe ya kevn, dîsan tê hepisxanê, rewşa xwe ya pisikolojîk radixe ber çavan, rewşa diya xwe... Mirov bêtir tiştêkî weha modern tê de dibîne. Di "Mirina Kalekî Rind" de min bi xwe ew tê de nedît.


XELÎL DIHOKÎ: Em ê dîsan vegehin ser rewşa miletê Kurd. Rewşa miletê Kurd ya siyasî, ya aborî, ya civakî... Ji bilî van çar romanên Mehmet Uzun miletê Kurd xwedî çend romanên din e? Bavê Nazê hindêk nivîsîne, Mehmûd Baksî hindêk nivîsîne,

Birîndar hindêk nivîsîne, wekî din çend biraderên din hene li Kurdistana Iraqê hin roman nivîsîne. Lê li Kurdistana Iraqê dibistanên Kurdî hene, universîte hene, profesorên zimanê Kurdî hene, bi hezaran kitêbên Kurdî hene, lê bi tenê çend roman hene. Bi nêrîna min eger hin şaşiyên Mehmet Uzun di romana "TU" de hebin jî gelek normal e. Di deh salan de eger mirov bikaribe çar romanên binivîsîne bi a min karekî mezin e. Ez bi xwe yek ji wan kesa me, ku gelek xatir û qîmet didim van nivîskarên me yên li derveyî welat, ku romanên xwe, çîrokên xwe, helbestên xwe û lêkolînên xwe pêşkêş dikin. Gava ez van romanên Kurdî, wek ya Bavê Nazê, "Çiyayê Bi Xwinê Avdayî", "Siya Evînê" dixwînim, bi rastî Garcia Marquez tê ber çaven min. Ev romannivîsên me ne kêmtirî romannivîsên Tirk û Ereban in, romannivîsên mezin in.

MAHMUT LEWENDÎ: Ez di vir de bi kak Xelîl re me. Ji ber ku çavkaniyên min romanên Tirkî ne, gava ku ez "TU" û "Siya Evînê" dixwînim ji min re wek roman tên. Lê "Mirina Kalekî Rind" û "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê" di aliyê teknîka romanê de ne ewçend xurt in.

XELÎL DIHOKÎ: Bi a min ev romanên ha dem di aliyê teknîk, hem jî di aliyê forum û naverokê de bi seketî ne. Cara pêşî min romana "TU" berî niha bi pênc-şeş salan li Şamê dît. Ez hingî jî ber dîktatorya faşîst a Iraqê reviyabûm. Min girtin, lêdan û îşkence dîtibû. Gava min romana "TU" xwend, min xwe û jayana xwe tê de dît. Ez bawer im ku hemû însanên Kurd xwe di vê romana "TU" de dibîne.

FIRAT CEWERÎ: Rast e, di "TU" de her Kurdekî welatêz û têkoşer ku hatiye girtin, lêdan, îşkence û stemkarî dîtiye, dikare xwe di "TU" de bibîne. Di salên 70'yî de tu jî yek ji wan kurdan bû, ku para xwe ji girtin, lêdan û îşkencê dît. Gelo mirov dikare bêje, ku ev roman serpêhatiya te bi xwe ye?



Mahmud Lewendî, Firat Cewerî , Xelîl Dihokî , Mehmed Uzun .

Foto: Şaneşîn Cewerî

MEHMET UZUN: Ev beşek ji serpêhatiya min e. Di hin hêlên qehremanê romanê de hin serpêhatî û tecrubeyên min hene, lê ew ne ez im. Ji min bêtir min xwest ku ez şexsekî tasfîr bikim, ku Kurd karibin xwe tê de bibînin, xelk karibin xwe tê de bibînin. Yanî bibe tecrubeyekî muşterek, bibe hîsekî muşterek... Ji ber vê gelek tişt lê zêde bûne. Tiştên min dîtine, ez jiya me, bi awayekî edebî lê zêde bûne. Beşekî biçûk ji romanê serpêhatî û tecrubeyên min in, lê pirranî çêbûyî ye, ava bûye.

FIRAT CEWERÎ: Tu di romana xwe de jiyana xortekî nûgihîştî, zana, birewer û jêhafî radixî ber çavan. Ev xortê ha yê nûgihîştî pîr ji xwendinê hez dike; hem li der ve, hem jî di girtîgehê de gelek pirtûkan dixwîne, bi mirovên navdar û navsal re dide û distîne, di gel temenê xwe yê biçûk, bi wan re hevalî û dostaniyê dafîne. Qehremanê te bi temen biçûk

e, lê di aliyê fikrê de mezin e. Ew wê mezina-hiya xwe di girtîgehê de bi alikariya xwendin û danûstandina bi mirovên zana û navdar re bi dest dixîne. Carina di sohbetê me yê şexsî de tu her dibêjî, ku girtîgeh ji te re bûbû dibistan, ku te xwe li girtîgehan gihand.

MEHMET UZUN: Gava ev romana min derket, ez li çend cihan li ser wê peyivîm. Carekê yek derket, got, "Tu navê ewqas nivîskaran didî, gelo xortek dikare ewqas nivîskar bixwîne û wan nas bike". Erê, dikare. Ji ber dema ku ez li girtîgeha Diyarbekrê girtî bûm, ew kitêb hemû hebûn. Gava ez hatim girtin ez hîjdeh salî bûm. Min zêde dinya nas nedikir, min Kurdayefî nasnedikir.

Tê bîra min ku min di girtîgehê de kitêba Dimitrov, "Faşizme Karşî Birleşik Cephe" yanzdeh caran xwend. Min kitêba George Politzer, Felsefenin Temel İlkeleri" şanzdeh caran xwend. Wê çaxê tenê şeş kitêben Şolohov bi Tirkî der-

ketibûn, min ew her şeş kitêb di panzdeh rojan de xwend. Hewa û atmosfera hepsê a wê çaxê wisa bû. Hêpîsxana 70'ê tu caran ne wek hêpîsxana 80'ê bû. Ji hev pirr cihê bû. Hêpîsxane ji bo min bû neynika civaka min. Ji ber ku ji her sinif û tebaqê mirov tê de hebûn û em hemû bi hev re bûn. Em sed û şeşt, sed û heftê kes bi hev re bûn. Çavên min li girtîgeha Diyarbekrê vebûn, Kurdayetîya min li wir dest pêkir. Ez vê yeka ha jî heta mirinê ji bîr nakim. Ger hun bala xwe bidin romanê, qehremanê wê pasîv e. Ew bi xwe observator e. Tişt bi tenê li der û dora wî diqewimin. Ew bi xwe nizane bê çima hatiye girtin, lê tê girtin. Ew naxwaze îşkencê bibîne, lê dibîne. Yanî gelek pasîv e. Tenê di xebirdanê xwe de bi kêzê re aktîv e. Min bi zanebûn ew wilo pasîv kiriye, ji bo ku ez bikaribim observasyona wê demê ya civatê bidim. Di vir de ez çiqas bi ser ketime ez nizanim. Lê wisa ye. Tiştêkî din jî heye, ku min di vir de behsa hêpîsxanê kiriye, lê ev sed salên welatê me ye ku hêpîsxane ye.

FIRAT CEWERÎ: Gava min herdu romanên Mehmet Uzun, "TU" û "Mirina Kalekî Rind" xwendin, min pevgirêdanek di navbera wan de dît. Qehremanê romana pêşî ku bi "TU" hatiye navandin, lêdan, îşkence, tade û neheqî dît ye, tê berdand, ji ber zilm û zorê, ji ber stemkarî û neheqiyê bazdide, bi gelek zehmetî û dijwariyan li hidût dixê, derbasî Binxetê dibe û ji wir jî xwe digihîne serbajarê Swedê, Stockholmê, Qehremanê romana pêşî, "TU" di "Mirina Kalekî Rind" de dibe Serdar Azad. Serdar hê berî ku xwe bigihîne Ewropa, ew li Binxetê, li gundekî Qamişlokeê ê biçûk, li Kalekî ecêb rast tê. Kalo bi her awayê xwe ji bo Serdar Azad balkêş e. Serdar Azadê ku rewşenbirekî dema me ye, gelek sirên veşirtî di Kalo de dibîne, loma jî dev jê bernade, bi şevan, bi rojan li dû Kalo digere, û dixwaze wan sirên Kalo yê veşirtî ji xwe re eşkere bike. Ew bi înadîya xwe dide dî wê ramanê û piştî demekê vî kalê xwedî tecrube, zana, sirtijî, geriyayî û kûpê kulturê nas dike. Mirina Kalekî Rind li der û dora Kalo û Serdar Azad dihare û tê. Hêvî û

armancên wan, hîs û xewnên wan, daxwaz û ramanên wan tîne ziman. "Siya Evîne" ku romana te ya sisiyan e, dîsan li ser jiyana rewşenbirekî Kurd yê destpêka sedsala nozdehan hatiye nivîsîn. Ev romana te ya ku bi hostatiya nivîskariyek kemilî hatiye nivîsîn, û ji aliyê xwendevan û hin nivîrxnegiran ve hatiye ecibandin, xewn û xeyal, evîn û hezkirin, edebiyata bedewî, şer, pevçûn, serîhildan, netewehêzî, xerîbî, dûrî te ev hemû di şexsiyeta rewşenbire Kurd Memduh Selîm Beg de civandine. Yanî, gava mirov çavêkî davêje van hersê romanên te, mirov wek tema jiyana rewşenbiriya Kurdî tê de dibîne. Lê te di romana xwe ya çaran de tema guhertiye û derbasî epîkê bûye. Te "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê" nivîsandîye. Wek hûn dizanin her nivîskarek pesnê roman an berhemek xwe dide û jê hez dike. Wek mînak, gava ku Gabriel Garcia Marquez xelata Nobel a edebiyatê bi romana xwe ya bi navê "Tenêtiya sed salan" girt, wî got ku romana ew herî pirr jê hez dike, ne "Tenêtiya Sedsalan" lê "Duşema Sor" e.

Mehmet Uzun, gava mirov pirsek wilo ji te bike, tu ê navê kîjan romana xwe bidî?

MEHMET UZUN: Mixabin, ez ê nikaribim bersiva wê bidim. Ji ber ku min di her romaneke xwe de xwestiye zimanekî nû, teknîkeke nû, sîflek nû bidim. Zehmetiyên her romanek min cihê bû. Û gava ez romanê xwe dinivîsînim, ez berî her tiştî ji bo xwe hin meshûman tesbît dikim û romanên xwe li dora wan radixim. Mesele meshûmên surgunê, humanîzmayê, welatvîniyê, zimanevîniyê, hevaltiyê, evîn bi xwe, îxanet, tiştên weha ez li dora romanê xwe dicivînim. Û di her romanê de hinek ji van li pêş in. Ji ber vê yekê ji bo min pirr zehmet e, ku ez bêjim, ez di wê romanê de, an jî di romaneke din de bi serketime û jê hez dikim. Lê ez karim tiştêkî bêjim, ku ez ji yekê ji wan jî bi temamî ne razî me.

FIRAT CEWERÎ: lê ez bawer im wê Xelîl Dihokî ji yekê ji wan bêtir razîbe, loma ji nav hemû romanên romana bi navê "Siya Evîne"

helbijartiyê, li ser wê dixebite û li ser wê nivîsek dirêj nivîsandiyê. Ji bo çî nemaze "Siya Evînê" û ne romanek din kek Xelîl ?

XELÎL DIHOKÎ: Wek me berê jî behsa Memduh Selîm Begê kir, ku bi rastî jî "Siya Evînê" baştirîn romana Mehmet Uzun e. Ew hem ji aliyê zîman, ji aliyê naverokê, ji aliyê teknîkê ve romanek bi serketiyê. Di vir de ez naxwazim dûr û dirêj behsa romanê bikim, ji ber ku min bi xwe tiştekî dirêj li ser nivîsî ye û ez ê wê di pêş de çap bikim. Bi a min ev roman romanekê girîng e.

FIRAT CEWERÎ: Kek Xelîl tu ê karibî di aliyê girîngbûna romanê de çend mînakên bidî ?

XELÎL DIHOKÎ: Wek min berê jî got, min li ser romanê nivîsek gelek dirêj amade kiriye, û ez ê di nêzik de li ser wê semînerekê bidim. Ji ber vê yekê, bibûre, lê ez ê pîrsa te bê bersiv bihêlim.

FIRAT CEWERÎ: Mamût Lewendî tu di vê derheqê de çî dibêji ?

MAHMUT LEWENDÎ: Wek kek Xelîl got, bi a min jî di aliyê teknîka romanê de mirov dikare bibêje ku roman e. Heya niha çar romanên Mehmet Uzun derketine, lê bi a min tenê du heb ji wan roman in. Ew jî "Siya Evînê" û "TU" ye. Lê herdiwên din "Mirina Kalekî Rind" û "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê" nasibin romanên. Ez karim bêjim ku "Siya Evînê" romana Mehmet Uzun ya herî bi serketî ye. Ew di wê romana xwe de, di gel pîrşer û pevçûn û nexweşiyê jî, dîsan evînê baş bi kartîne.


XELÎL DIHOKÎ: berî niho jî me got, bi rastî di rewşek weha de, ku pîrîniya dergehên li ber me girtine, bi taybetî jî li Kurdistanê Tirkîyê, loma di deh salan de ger mirov bikaribe van afirandinên ewçend mezin biafirîne, qonaxek gelek bilind û karekî pîrîroz e. Gava

tu berê xwe bidî medeniyeta Ereban, Tirk û Farîsan, ku xwedî dewlet in, xwedî bi hezaran weşanxane û enstîtut in, lê ê me nivîskarekî me yê hejar ji hepsê derketiyê, hatiye li Ewropa ji me re çar roman nivîsandine. Bi a min ev karekî gelek pîroz û hêjaye. Ez bi tevayî qîmeta romanên Mehmet Uzun digirim, lê bi taybetî "Siya Evînê". Ez qîmeta hemû nivîskarên Kurd ku ji welatê xwe bi dîr ketine, di gel problemên civakî, aborî û siyasî ku ewçend berhemên hêja nivîsîne digirim. Ez ji romana Bavê Nazê, "Çiyayê Bi Xwînê Avdayî" jî hez dikim. Bi rastî romanek gelek baş e.

FIRAT CEWERÎ: Gava "Siya Evînê" derket, hin kesan pîrsîn, gelo ev "Memduh Selîm Beg" kî ye ? Yanî pîrîniya xwendevanan navê Memduh Selîm Beg bi derketina romana "Siya Evînê" re bihîstin. Gelo bi nivîsandina Siya Evînê, armanca te çî bû Mehmet Uzun ? Te xwest tu perçeyek ji toreya Kurdî ya ku li ber jibîrbûyîne ye bidî pêş, an jî jiyana rewşenbîrekî Kurd zelal bikî ?

MEHMET UZUN: berî ku ez bersiva vê pîrsa te bidim, ez tiştekî biçûk li ser gotina we bêjim. Gava ez nivîkariyê dikim, ez naxwazim ferqê lêxim navbera vê romanê, an jî wê romanê.

Bi a min nivîskarî divê ku berdewam be. Ev yeka han pîrîr pêwîst e, lê mixabin li ba me Kurdan çênebû ye. Yek derketiyê romanek nivîsandiyê, kurteçîrokek nivîsandiyê, helbestek nivîsandiyê, lê paşê maye, dewam nekiriye. Divê mirov berdewam be, bikaribe nivîkariyê ava bike û di nav wê nivîkariya xwe de pênc berhem, deh berhem panzdeh berhem, bîst berhem hebin. Ji nav van jî tenê hin derdikevin pêş. Ew jî ne nivîskar bi xwe, lê xwendevan û rexnegir wan derdixînin pêş. Îro ger ku Marquez bi romana xwe ya "Tenêtiya Sedsalan" ve tê nas kirin, ne ku Marquez ew xwestiyê, lê xwendevanan, rexnegiran û xelkê ew xwestiyê û dane pêş. Nivîskarên dinyayê hemû wîsan e, ji bo wê ez nizanîm, ka kîjan romana min baş e, an ne baş e.



Xelîl Dihokî , Mehmed Uzun , Mahmud Lewendî.

Foto: Şaneşîn Cewerî

FIRAT CEWERÎ: Ji bo çi nemaze Memduh Selîm Beg û ne rewşenbirekî din ?

MEHMET UZUN: Ez ê niha werim ser wê jî. Bi bawerîya min gava mirov romanekê an jî esereke edebî dinivîsîne, şertên ku mirov tê de ne, gelek tesîrê li nivîskariya mirov dike. Tiştê ku tu dinivîsîne, babet dibe ku gellek kevin be, an qet peywendîya wê û şertên tu tê de dijî bi hev re nîn bin, lê dîsa şertê te gelek tesîrê lê dike. Ez niha li surgunê me. Cara pêşî min navê Memduh Selîm Beg li Sûriyê bihîst. Li Turkiyê ez berpîrsiyarê kovarek Kurdî bûm, li der û dora kovarê jî gelek ronakbîrên Kurd hebûn, lê ne min, ne jî hevalên din kesî ji me navê Memduh Selîm Beg nebihîstibû. Gava dûre min navê Memduh Selîm Beg bihîst, bi rastî min ji xwe şerm kir. Û ez pîrr bi jiyana wî êşiyam. Di nav wê neçariya de miriye. Min behsa wê neçariya wî nekiriye. Heger we diqet

kiribe, roman heta salên sî û pêncan tê, esas piştî wê neçariya wî ya mezin dest pê dike. Min nexwest ez zêde bikevim nav wan. Lê gava min wa çavên xwe li jiyana ronakbîrên kurd gerand, min mêze kir, ku jiyana Memduh Selîm Beg mîna jiyana te ye, mîna jiyana kek Xelîl e, mîna jiyana Mahmûd e, mîna jiyana min e. Em hemû Memduh Selîm Beg in. Jiyana ronakbîrên kurd kêm zêde mîna hev e, mîna jiyana Memduh Selîm Beg e. Ji ber wê, min xwest ez bi şexsê memduh Selîm Beg dîsan ta-wîrek kolektîv tasfîr bikim. Tabî tê de armanca min a ku Memduh Selîm Beg ji nû ve bê vejandin, ji nû ve bê nasîn, tasfîra dîroka wê demê, hemû armancê min tê de hene. Lê, berî her tiştî armanca min ew bû, ku ez bikaribim romanek kurdî, li ser şexsê pêşketiyê kurd, lê di eynî wextê de siûda kurdan binivîsînim.

FIRAT CEWERÎ: Wek çawan ku te

Memduh Selim Beg di jiyana xwe ya surgunê de nas kir, me jî ew di jiyana xwe ya surgunê de nas kir. Û nemaze bi derketina romana te ya "Siya Evînê" re navê Memduh Selim Beg roj bi roj hat bihîstin û li ser dema wî, li ser jiyana û rewşenbîriya wî gotûbêj û sohbetên dirêj di nava xwendevan û ronakbîrên kurd de dest pê kir. Pîrr kesan jî me hewcedariya lêkolîna jiyana wî rewşenbîrê kurd ê jîbîrkirî dît. Kek Xelîl, ez bawer im ku te dê jî ev hewcedarî dîtibe, loma te li ser "Siya Evînê" lêkolînek kiriye.

XELÎL DIHOKÎ: Rewşa welatê me hinde xerab e ku nikare li ronakbîr û qehremanê xwe bifikire. Ji ber çî? Em bêjin niha li Kurdistanê Tirkîye, kî dikare, kîjan kovar heye ku bikaribe li ser şoreşa Şêx Seidê Pîran binivîse. Ka kovarek, ka rojnameyek ku bikaribe li ser rewşa Îhsan Nûrî Paşa, yan li ser Cumhûriyeta Mehabadê binivîse? Bi baweriya min, mîletê kurd, bi taybetî ronakbîrên kurd her demekê ku dergeh bo wan bêne vekirin, sînor bêne şikandin, ew dê bo ronakbîr û welatparêzên xwe pîrr bi wefa bin.

MAHMUT LEWENDÎ: Her tim dijmin pêşî li me girtiye. A îro ku li Kurdistanê Tirkîye hebekî nermî çêbibe, ew ê bi sedan Memduh Selim Beg jî nav me derkevin. Yanî hukûmetê nehiştiye em li ser xwe û dîroka xwe lêkolînan bikin. Em bêjin ku Mehmet Uzun ev bi riya romanê kiriye, hinin din dikarin bi riya nivîsin din ronakbîrên kurd bidin naskirin.

FIRAT CEWERÎ: Gelo em karin bêjin, ku "Siya Evînê" jî jiyana Memduh Selim Beg wêdetir, danasîna perçeyek jî dîroka me ya jîbîrkirî ye?

MAHMUT LEWENDÎ: Rast e, mirov dikare bêje ku ev perçeyek jî jiyana siyasîya kurdî ya dema 1920 heta 1930 ye.

FIRAT CEWERÎ: Kek Xelîl, gava te "Siya Evînê" xwend, tu di derheqa jiyana siyasîya Kurdistanê Tirkîyê de çî fikirî û tu hîmî çî bû? An jî "Siya Evînê" çî da te?

XELÎL DIHOKÎ: Di derheqa jiyana siyasîya Kurdistanê Tirkîyê, berê zanebûna me hebû. Me bi komela Xoybûnê dizanîbû, me serhildana Agirî nas dikir, haya me jî serhildana Şêx Seidê Pîran hebû. Lê Mehmet Uzun di vir de rewşa siyasî, bi hunermendî aniye ziman. Wek filmekî li ber çavên me raxistiye. Karekî baş û biserkefî kiriye.

MAHMUT LEWENDÎ: Ez karim vê yekê bêjim ku Mehmet Uzun xwe xistiye şûna Memduh Selim Beg û li ser xwe romanek nivîsandîye. Ew di xeyalên xwe de çûye Şamê, çûye Bêrûdê, çûye Stenbolê. Yanî di vir de ez hin kêmasiyên teknîkî dibînim. Mesele, Mehmet Uzun behsa wê demê û keçikên kehpik dike, ez bawer im di wê demê ev tiştên ku Mehmet Uzun behs dike, tune bûn, lê ev tiştên ku ew behs dike, niha, li Parîsê heye.

MEHMET UZUN: Belê, di wê demê de jî û jî wê demê gelek kevintir jî ew şiklê jiyane hebû. Berî ez vê romana xwe binivîsînim, min li ser jiyana û kultura Mîsrê ya wê demê xebatek dîr û dirêj kir, min jiyana Kahîrê ya wê demê jî nêzik de naskir.

XELÎL DIHOKÎ: Bi baweriya min Mehmet Uzun rast dibêje. Di salên heştêsedî, nehsedî, dema hîn Împeratoriya Osmanî hebû, bi rastî fesadî û pîsî û neheqîya di nava wê Împeratoriya de hebû, li tu tarîxa dinê de nebûye. Ez bawer im ku Mehmet Uzun gelek bi zîrekî nêzikî vê merselê bûye, bi taybetî jî merselê jinê. Em di romanê de dibînin, ku gava Memduh Selim Beg êdî jî bin barên giran ranabe, xwe davêje Hotel û malên jinan. Ev jî heqê Memduh Selim Beg e; jî ber ku Memduh Selim Beg însan e û hîsên wî ên însanîtiyê ne.

FIRAT CEWERÎ: Mehmet Uzun, tu jî



kare bibe çavkaniya rewş û jiyana Evdalê Zeynikê?

MEHMET UZUN: Mîna hemû berhemên edebiyata devkî, stiran û çirokên li ser Evdal ji pîr in û varyasonên wan gelek in. Yanî li gora her varyasonê Evdal ji derekê ye, bi awakî jiyaye, ji derekê hatiye çûye derek din. Ew tiştên li ser wî hatine û tîn gotin hevdu nagirin. Berî ez dest bi nivîsandina romanê bikim, min xwest ku ez hemû varyasonan bicivînim, lê min dît ku tiştekî wa rast û bi cih nîn in. Li gora her varyasonê her kes tiştekî dibêje. Her kes dibêje, Evdal ji vê derê ye, ji wê derê ye. Navê cih û derên ku di stiranên Evdal de derbas dibin, min ew nav danîne. Lê wekî din min tu nav danîne.

Li ku bûye, kengî bûye, li ku jiya ye, li ba kê jiyaye, di vê derheqê de tu malûmat tune ne. Lê tenê min behsa mîrekî kurd kiriye, ew mîr ji xwe çêkirî ye, mîrekî wisan tune ye.

FIRAT CEWERÎ: Ez bawer im wê çaxê ev berhem wê nikaribe ji nivîskar û lêkolînerên kurd re bibe çavkaniya lêkolînê li ser Evdalê Zeynikê.

MEHMET UZUN: Na, wê nikaribe bibe çavkanî ji bo lêkolîna li ser Evdalê Zeynikê. Ji ber ku ev roman e, min xwestiye ez romanekê binivîsînim. Ji sedî nod û pêncê bûyerên, danûstandinên, şexsên qehremanên romanên çêkirîne. Ew hemû xeyalî ne. Lê gava min ev xeyal avakirine, kaniya min Evdalê Zeynikê û stiranên Evdalê Zeynikê bûne. min xwestiye bi alîkariya Evdal hin tiştên din ava bikim. Ji bo wê divê ku ev kitab mîna lêkolînekê neyê dîtin.

FIRAT CEWERÎ: Mirov di vê romana te de nêzikahiyek stûla Yaşar Kemal dibîne. Ger em romana Yaşar Kemal "Efsaneyê Çiyayê Agirî" nehesibînin, di romana wî ya bi navê "Erd Hesin Ezman Sifir" de Evdalê Zeynikê heye. Efsaneya wî heye, qulung heye, vebûna çavên Evdalê heye. Tema herdu romanên nêzikî

jiyana rewşenbirekî kurd derbasî romanek epîk, an jî folklorîk bûyî. Te "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê" nivîsandiye. Li welatê me ye ku navê Evdalê Zeynikê nebihistibe çi bigire tune ye. Lê mixabin kes nizane Evdal kî ye, ji ku ye, çi kes e. Lê wek bersiva vê pîrsa han te hin cih di romana xwe de dane. Te Evdalê ewçend nas, lê dîsan jî nenas bi me daye naskirin. Gelo "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê"

hev in, herdu jî ji kaniya zargotina kurdî dizên.

MEHMET UZUN: Mixibin, min romana Yaşar Kemal "Erd Hesin Ezman Sifir" nexwendîye, lê min film dîtîye. Em ji bîr nekin ku hemû çavkaniyên romanên Yaşar Kemal ji zargotina kurdî ye, stiranên kurdî ne, destanên kurdî ne. Efsanên kurdî, stiranên kurdî, destanên kurdî, çlrokên kurdî, eger em li tarîxa edebiyata xwe binihêrin, emê bibînin ku ji bo me jî çavkanî ne. Yanî edebiyata me li ser wan ava bûye. Bi rastî jî dewlemendiya zimanê me, dewlemendiya gotina kurdî di wan de ye, yanî di edebiyata devkî de ye. Divê ku em xwe bigihînin wê. Yek ji wezîfeyên me jî ew e ku em wê ji nû ve vejînin. Bi sîlên nû, formên nû, teknîkên nû bikaribin qalibekî nû, kirasekî nû li wan bikin û wan ji bo nivîşê nû bikin entresan. Gava nivîşê nû bixwînin hem bikaribin xwe tê de bibînin, hem jî bikaribin bi tarîxa xwe re danûstandinek xurt ava bikin. Gelek nivîskarên pêşketî yê mîletên din weha kirine. Ez mînakekê bidim; James Joyces heye, nivîskarekî Îrlandiye, romana wî ya herfî mezin "Odysseus" li ser destana Odysseus ava dibe. Wî destana Odysseus ji xwe re esas girtiye, lê jiyana Dublinê tasvîr dike. Mînakên wîlo bi hezaran e. Çima em nekin ? Tiştên ku niha ji bo min pirr muhîm û balkêş e, ez dixwazim di zimanê kurdî de gelek sîl û teknîkan bikaribînim. Zimanê kurdî ji bo kîjan sîlan, ji bo kîjan teknîkan rê dide. Ji ber min xwest ez romanek epîk jî binivîsînim.

FIRAT CEWERÎ: Gelo em karin bêjin, gava em behsa modernîzmê bikin, divê em xwe, zimanê xwe, kultura xwe û paşeroja xwe baş nas bikin. Em li ser koka xwe nûjen bibin.

MEHMET UZUN: Belê, her wisa ye. Xwediyê xelata Nobelê Eliot, ku hem modernîst û hem jî tradîsyonîst bû, gotiye : Ew modernîzma ku li ser tradîsyonekê ava nebe, ne modernîzme. Tu nikarî modernîzmê ji ezmanan, an jî ji welatînan din bîni, divê li ser tiştêkî ava bibe. Edebiyata me ya nivîskî ne dewlemend e, lê edebiyata me ya devkî pirr dewlemend e, ev yekha ji bo me kehnîyek e.

FIRAT CEWERÎ: Kek Xelîl tu çi dibêjî?


XELÎL DIHOKI: Em weke mîlet li paş mane, bindest û neçar mane. Hemû medeniyetên me, hemû folklorên me, hemû destanên me, hemû serîhildan û berxwedanên me, di stiran û çlrokên me de ne. Ez bi xwe yek ji wan kesa me, ku gelek qîmet didim stiranbêj û çlrokbêjên kurd. Mirov pirr tiştan di stiran, û çlrokên kurdî de dibîne. Bi baweriya min nivîskarên zîrek dikare pirr tiştan ji stiran, çlrok û destanên kurdî hîn bibin. Ji ber ku bi rastî arşîva kurdî ya nivîskî vala ye. Ji ber vê hindê divê em tiştên kevin bi yê nû ve girê bidin û pêşerojek rohnî jê derêxin.

FIRAT CEWERÎ: Wek hûn jî dizanin, di kurtesohbetek wîlo de li ser edebiyata kurdî ya surgunê û li ser çar romanên cihê cihê peyivîn ne ewçend hêsan e. Edebiyata kurdî ya surgunê bi serê xwe hêjayî gotûbêjek taybetî ye. Her weha, her romanek jî bi serê xwe mijara munaqêşe û sohbetekê ye. Ez hêvîdar im, ku bi vê munaqêşa me, hindik be jî wê haya xwendevanên li welêt ji edebiyat û çapemaniya kurdî ya derveyî welêt çêbibe û bi vê munasebetê hewcedariya xwendina berhemên kurdî bibînin.

CIHEKÎ PAKIJ Û ROHNÎ

HEMINGWAY

Werger: Dr. POLOÇO



Derengê şevê bû; ji peyayekî kal, ku di bin siya dara li bin ronahiya elektrîkê rûniştî bû pêve, kes nemabû. Bi rojan kuçe bi toz bû, lê gava ku tarî dikete erdê, bi hênkaiya êvarê re ew toz ditemirî. Di gel ku ew peyayê kal kerr bû, dîsan ji karîbû ferqiyeta di navbera bêdengiya şevê û qerebalixa rojê de bidîta. Kalo ji rûniştina wir pirr hez dikir. Herdu garsonên çayxanê zanîbûn ku kalo hebekî serxweş bûye. Kalo bi xwe muşteriyekî wan î baş bû, lê gava pirr vedixwar û serxweş dibû, carinan jê bêyî ku peran bide, derdiket û diçû. Ji ber vê yekê herdu garsonan çavên xwe ji wî nediqetandin.

Yekî ji yê din re got :

-Berî niha bi hefteyekê kalo xwestibû xwe bikuje.

-Ji bo çi?

-Bê hêvî maye.

-Gelo ji bo çi?

-Ne ji bo tiştêkî, be sedem.

-Tu ji ku zanî bê sedem e?

-Perê wî pirr in.

Herdu garson li dor maseke li ber derî rûniştibûn û li kaloyê ku li bin siya pelên darê rûniştibû pêve, wan li kursî û maseyên vala, yên li der û dora kalo jî temaşe dikirin. Keçîkek û leşkerek di kuçê de derbas bûn. Ro-

nahiya kuçê demekê li ser sifirê ku bi bersdika çakêtê leşkêr ve bû ve, biriqand. Keçik servekirbû û bi lez di gel leşker dimeşiya.

Yekî ji garsonan got:

-Wê nobedarên şevê wî bigirin.

-Piştî ku tiştê xwestiye bi dest xwe xistiye, ew bê girtin jî xem nake.

-Ger ew biazil be ew ê zû têkeye derekê. Dewriye berî niha bi pênc deqîqan di vir de derbas bû. Ger ew zû nekeve cihekî, ji sedî sed ewê bê girtin.

Kaloyê ku di bin siyê de rûniştibû, bi qedeha xwe li tacikê xist. Ji garsonan yê xort çû ba kalo.

-Kerem bike, got.

Peyayê kal li garson nihêrî û got:

-Birandiyêke din bide min.

-Tu ê serxweş bibî, garson got.

Kalo li garson nihêrî. Garson ji bawî da rê û ji hevalê xwe re got.

-Çavê wî lê ye heta sibehê li vir rûnê. Yê min xewa min tê. Berî saet sisiyan tu caran xew ji min re nebûye qismet. Xwezî berî niha bi heftekê xwe kuştibûya!

Garson ji hundir rahîşt şûşeke birandî û qedehêk nû û bire ji kalo re. Piştî ku qedeha kaloyê kerr dagirt, got:

-Min bihist te ê hefta çûyî xwe bikuşt.

Kalo bi tiliya xwe qedeh nîşanî garson da.

-Hinekî din jî.

Garson qedeha kalo bi dev re tijî kir. Kalo spasên xwe jê re got. Garson dîsan ew şûşe bi paş de bire hundir. Dûre hat li ba hevalê xwe rûnişt û got:

-Serxweş bû ye.

-Ji xwe ew her şev serxweş e.

-Tu zane ku wî jî bo çî xwestiye xwe bikuje?

-Ez ê ji ku zanibim?

-Gelo wî xwestiye xwe bi çî bikuje?

-Xwe bi dar de kiriye.

-Lê kê kindir birrî ye?

-Biraziyê wî.

-Ji bo çî birrî ye?

-Ji bo selametiya ruhê wî.

-Gelo çiqas perên mêrik hene?

-Perên wî pîrr in.

-Ez wa texmîn dikim ku temenê wî li dor heştê salan e.

-Êdê ew biçûya mala xwe. Ez tu caran berî saet sisiyan raneza me. Ma di vê saetê de jî xew dibe?

-Ji ber ku ew jê hez dike loma heya bi dereng rûdinê.

-Ê wî ji ber tenêbûnê ye. Lê ez ne bi tenê me. Yê min jina min li bendî min e.

-Yê wî jî di wextê xwe de jina wî hebû.

-Jin hew ji wî re lazim dibin.

-Ne wilo ye, ger jina wî hebûya e wê hîn baştir bûya.

-Biraziyê wî lêdinihêre.

-Ez zanim, ne te got, biraziyê wî kindir birrîbû.

-Yê min ez naxwazim evqasî emir bikim, kalitî perîşanî ye.

-Lê ne hertim. Ev kala kalekî pakij e. Serxweşê jî, lê gava vedixwe qet vexwarina xwe narijîne.

-Ez naxwazim wî bibînim. Qe biçûya mala xwe. Ew qet li mirovên karker nafikire.

Peyayê kal serê xwe bilind kir û li meydanê nihêrî. Dûre li garsonan zîvirî, qedeha xwe nîşan da û got:

-Birandiyêke din jî bînin.

Garsonê xort çû ba wî. Bi awayekî ku mirov ji kesên bêedeb, serxweş û ji biyaniyan re dibêje, got:

-Birandî nema. Ji bo îşev bes e, êdî em ê bigirin.

-Yeka din jî bîne, kalo got.

Garson bi paçikê di destê xwe de qorziya masê pakij kir, serê xwe kil kir û got:

-Hew, birandî xelas bû.

Peyayê kal rabû ser xwe, tacikên ber xwe hejmartin, cûzdanekî çermînî ji bêrika xwe derxist, û heqê xwarin û vexwarina xwe da; niv pezate jî ji wan re bexşîş hişt.

Garson li rêveçûna wî ya kuçê temaşe kir. Di-hejiya, lê rast diçû, peyayekî pîrr kal bû.

Garsonê ku leza wî tunebû, ji yê bi lez pîrsî:

-Çima te nehişt ew ji xwe re hebekî din jî rûnî û vexwe? Saet hê nebûye dudu û niv.

-Xewa min tê. Ez dixwazim herim malê û

razên.

-Saetek çi ferq dike?

-Ji bo min pirr ferq dike, saetek saetek e.

-Tu ji wekî yekî kal dipeyivî. Bila ji xwe re şûşeyekê bikire û here mal vexwe.

-Lê ew ne eynî tişt e.

Garsonê bi jin got:

-Belê, rast e, ne eynî tişt e.

Wî nedixwest ku heqê mêrik bixwe, lê tenê bi lez bû.

-Lê tu? Ma tu ji xwedê natirsî ku tu hertim berî wextê xwe diçî malê.

-Qey tu hewl didî neheqyan li min bikî?

-Na, na, ez henekan dikim.

Garsonê ku bi lez bû.

-Baweriya min bi te heye, got.

Garsonê bi emir got:

-Tu ciwan î, baweriya te jî heye, karê te jî heye, her tiştê te heye.

-Lê çi yê te kêm e?

-Ji kar pêve her tiştê min.

-Tiştên li ba min hene li ba te jî hene.

-Na, yê min qet baweriya min çênebûye û ez ne xort im jî.

-Neysel, dev ji van bêaqiliyan berde, em dikanê bigirin û herin.

Garsonê bi emir peyva xwe domand:

-Ez jî yek ji wan mirovên ku dixwazin heya bi dereng li çayxane û meyxanan rûnê me. Yek ji wanên ku naxwazin razên. Yek ji wanên ku bi şevan hewcedariya wan ji ronahiyê heye.

-Ez dixwazim herim malê û razên.

Garsonê bi emir,

-Ez û tu ji du cinsên cihê ne, got.

Niha jî kincên xwe li xwe kiribûn.

-Ger tiştên xweş hebûya, ev ne bi tenê pirsek tortanî û baweriyê ye. Bi fikira ku belkî yekî hewcedar were, ez her êvar ne ji dil derî digirim.

-Camêr, hin bar hene heta bi sibehê vekirî ne.

-Tu fêhm nakî, ev cih cihêkî xweş û pakij e.

-Cihêkî rohnî ye. Ronahiya vir pirrî xweş e, xaşê siya pelên daran jî heye.

Garsonê xort,

-Şevbaş, got.

-Şevbaş!

Garsonê bi emir lampe vemirandin û bi xwe

xwe dipeyivî. "Ronahî pirr girîng e, lê divê cih jî xweş û pakij be. Tu hewcedarî bi muzîkê tune ye. Divê ji bin de muzîk tune be. Mirov bi hemû şexsiyeta xwe jî nikare li ber deriyên baran şîpya bisekine". Di wê saetê de tenê cihên vekirî ew der bûn. Ma ew ji çi ditirsiya? Bi rastî ev ne tirs bû. Ev yeka han tişteki ku wî pê dizanîbû. Mirov jî hîç bûn. Tiştên lazim ev bûn; ronahî, pakijî û bi rêkûpêkbûn bû. Hin kes di hundurê vê de dijiyan, lê pê nedihesiyan. Lê wî zanîbû ku her tişt nada y pues nada y pues nada y nada û pues e. Hiçitiya me ya di hiçe de, bila navê te heç be, ya ku hiçe dike hiçe di mîrîtiya hiçe de. Îro hiçitiya roja me bide me û hiçitiyên me efû bike, wek çawan ku em hiçên ku li hemberî me hîç kirine efû dikin. Me nespêre hiça, lê me ji hiça azad bike. Hiçe ku ne tu hiçe e, pîroz be navê te. Garsonê bi emir bi rûkenî li ber bareke ku aşikê wê ê qehwê bi keldûmanê dişuxulî, rawestiya.

Barvan jê pirsî :

-Kerem bike.

-Nada

Barvan,

-Otro loco mas, got û berê xwe guhert

Garson,

-Fincanek, got.

Barvan qehwa wî dayê.

Gerson,

-Ronahî pirr bi şewq û xweşik e, lê ser barê şewq nade, got.

Barvan li wî nêrî, lê bersiva wî neda. Ji bo peyvê pirr dereng bû.

-Tu qedehek din jî naxwazî, barvan jê pirsî.

Garson,

-Na spas, ez naxwazim, got û derket der.

Wî ji bara nefret dikir. Çayxaneke pakij û bi şewq tişteki cihê bû. Êdî bêyî ku zêde bifikire, ew ê biçûya malê, oda xwe. Wî dê xwe li ser nivînê xwe dirêj bikira û bi derketina rojê re ew ê xilmaş bibûya. Bi xwe-xwe jî got, "belkî nexweşiya bêxewîtiyê ye, ev nexweşî bi pirr kesan re heye".

DI BASÊ* DE

Hussên HEBEŞ

Bihara Kurdistanê û ya Rûssiya bi nav yek in û herweha di salnamê de bi hev re dest pê dikin û bi hev re jî kuta dibin, ji bilî van herdu taybetvaniyan tiştine din hevpişk tune ne.

-2-

Di rojê biharin de ji sala 1983'a li Mosko Nazliyê mizgîn da mîrê xwe ku dolman jê re durist dike; Xanedan jî ji eşqa re dest davêje tîlêfonê, çend dostan vexwendî firavîne dike, lê rojê bêlî nake, çinkê ew "Destketina" ne we bi sanahî li bajarê heşt mîlyon mirovî bi cîh tê.

Berî projê weha bi serkeve, pêwîst e bi kêmanî heftek bergeh hebê ta amadekarî jê re bê kirin; rojêkê îsot bêne kirrîn, ya din li bencanên reş bê gerrandin, ya sîsya pîvazan di qunçekî bajêrî dûr de bêne dîtin, eger ta roja dawiyê kundir, şivît û hîrîmwîrên mayîn bi destneketin, divê tu bîrîka xwe ya hema vala valatir bikî û li Çeryomîşkî Rînok (Bazar e) bi sê çar qatî bikirî.

-3-

Ro derketibû... Em kurd ji nav dilî royê derketine, ew dêya me a pîroz e..., bayekî taştayî hunik radibû, di rojên we kêmmînayî de Xane-

dan nexwest li basê siwar be, bi kêmanî ta rawestgeha Mêtro Unîvêrsîtê peya biçê, ji alîkî de ê wî di basê de hilnepeknî, û ji aliyê din de, eger ew di ber Stêklaşkê * re herre, her nebê ewê du sê keçên cwan bibîne, bi dîtina wan dilê hîn geştir bibe.

Li hember Sîrka Mosko a nû basa 130' î rengê xwe yî zer rawestya û çavrêdar siwar kirin. Bas ne mişt bû, berî nîvrojê mirov kare di transpotan de rûne, eger pîrjin tune bin, lê ew hebin û te rûniştî bibîhînin, tevî ku tu dixwînî, an dalxê li te dayî; ne dûr e tu di şiketeke zeradeşî de li bermayên Avêsta yê digerrî, yê ji dûr ve ber te werin, didanan di te de biçirrikînin û ta digîhînin ba te devê wan nekevin hev, xwe bi ser te de dirrijînin û te ji cîh radikin û piştî cîh li xwe xweş dikin cinêwan bi ser gencan de dibarînin, ku ew qedra mezînan nagirin, li pîşa wan ranabin.

-4-

Di dawya basê de xortekî ji xwe razî, magnêtefonek (mûsecêle, tîp) bi dest xwe kiribû, we xavê dihat ku ji wî ye gencîna Qaron bi dest de ye, loma dengê wê bilind



kirîbû, haya wî di basê de ji tukeyî tune bû, bi kêf guh li Visotiskî digirt.

Pîreke tawî li ber deryê pêşin rûniştî bû, nerazîbûna xwe aşkere dikir: "Ez nizanim ev gencên îro çawan in, ne zanin li basan siwar bin, ne karin huner têbigîhnin.. Çi ye guh li Visotiskî digirn?!.. Hema tibê ew bi keviran li min dixîne gavê ez dengî wî dibîhsim û ez nikarim şîrên wî jî bixwînim". Jinik pîr enirî bû û hewl da vê hevokê jî bi yê din ve girêde: "Pûşkîn, Lêrmontov û Maykovskî hêştine, çûne bi dû Visotiskî ketine"!..

Ev raya hişk bala pîr lêniştîyan bi aliyê rayevanê de rakîşan din, jineke lihevhatî bi xwe nikarî, serê xwe ji rûpelîne li maşîne xistî rakir û hîn rûyê xwe ber hemûyan kir, xelkê we

fehmkir ku ji wê ye ew di holeke zanîngehê de ye, lêksîona xwe dixwîne: "Visotiskî dengbêjekî mezin e, şayîrekî bilîmet e, rola wî di huner de ji ya Maykovskî ne kêmtire, demek ê werê ê jê re peykeran (tîmsal) çêkin ê li cihên naskirî venin, em hînebûne rêzdariyê li hunermendên xwe yên zindî bikin, çî demê ew mirin û şûnda emê li pesnê wan bidin, hele we bala xwe dayî niha çiqas li ser Şûkşîn dinivîsînin û diaxivin".

-5-

Xanedan ji wê devjengê bêpar ma, gava bas gihîşte bazarê. Mixabin rê kurt bû. Rastî hat gotin, ne li cihekî resmî, lê di basê de, di nav gel de, û di çî serdemê de û hîn bê tirs.

* Stêklaşkê: Peyveke rûsî ye, ji avahiyên fakûltên zanyariyên miro vatîyê re tê gotin, çînkê ew pîr ji caman duristkirine.

*Bas ji bus a ingilizi tê, Kurdên binxetê bas bikartînin, lê Kurdên serxetê dibêjin: otobus.

NISÊBÎNÊ

Musa ANTER



Foto: Firat Ceweri

Nisêbînê yek ji bajarê kevintirîn yê Mezopotamya ye. Li gorî nivîsên bi Gotî û Sumerî yên li ser qehfikan ku îro di destên me de hene, Nisêbînê berî Miladê bi 2880 salan, di dema qiralê Sumerî, Luga Zegîsî ava bûye.

Lê belê Nisêbînê jî, wek hemû bajarên Mezopotamyayê, ji roja ku ava bûye û heya îro tu rehetî nedîtuye. Di nava xelkê de bobelatên ku bi serê Nisêbînê de hatiye, wilo tê ziman; "Nisêbînê heft caran şên û heft caran jî xerab bûye". Ev xerabûnên ha jî ne ku bi zezelan û bi bobelatên xwezayî bûne, lê bi zor û zilmê, tade û neheqiyê û îşgalên dijmin bûye. Xelk dibêjin "Nisêbînê heft caran binerd bûye" ê min ez dibêjim gelekî zêdetir.

Nisêbînê li ser erda Mezopotamya ya herî bi ber, herî bi av û li roavayê çemê cex-cexê ava bûye. Lê çem jî di navbera surên bajêr de dima. Piştî avabûna li du şûnên cihê, Nisêbînê li cihê xwe yê îro ava bûye. Berê Nisêbînê li goristana cihûyan, ku îro di sînorê binxetê de ye, ava bûbû. Nisêbîna niha jî li bakurrê Bûnisra (Bi latîni tê mana êş û janê) li ser Girnewaz (Navê wê yê kevin Mahîpya) ava bûye.

Nisêbînê ewqas hatiye wêrankirin û îşgalkirin, ku mirov 15-20 metreyan bikole, mirov ê xanî û rûniştgehên kevin di binê erdê

de bibîne. Bi vê kurtelîsteya jêr em ê îşgalên Nisêbînê, welatên ku Nisêbînê îşgal kirine û navê Nisêbînê ê kevin bidin.

Sumeran Nîrbo (B.M. 2880-2100)
Babilan Aramis (B.M. 2100-1850)
Hûrî-Mîtaniyan Nasî-pîna (B.M. 1850-1200)
Asûriyan Mepîn-sunu (B.M. 1200-300)
Selfkusan-Roman Antimosya (B.M.330)
Bîzansan Nisîbîs (P.M. 640)
Sasaniyan Nihîlas (B.M.230 P.M.640)
Suryaniyan Nîsa-dîna (B.M. 131 P.M. 192)
Ereban Nasîbeyn (P.M. 640-750)
Firansizan Nusîbîn (1920-1940)
Tirkan Nusaybin

Dîroka Nisêbînê dirêj û entresan e. Dîroka Mezopotamyaya jor e. Giringbûna Nisêbînê ji wêranbûnên wê tê fêhmkirin. Wilo ku Nisêbînê deh caran di navbera Firansizan û roman de dest guhertiye. Her carê Nisêbînê xera bûye û serê Nisêbîniyan bi şûran hatiye jêkirin. Heta îro jî li Mezopotamyayê derd û xemên Nisêbîniyan tewaw nebûye. Nisêbînî dîsa jî têkoşîna azadiya xwe didin.

Stembol, 19. 02. 1992

MEZOPOTAMYA

Edward Petêška

Wergera Ji Bulgarî: Loran CENGÎN

Elen'an (Yunaniyan) ew wusa binav kirine. Navê wê tê mana-xaka di navbera du çeman. Qraliyetên Mezopotamya yê kevnare li vir, di navbera du çemên navdar de - Dicle û Firat de, pêkhatine û hilweşiyane.

Em ji valayiya qamişên Firatê bikevin nav dîroka hezarsalan, ên ku me ji Mezopotamya ya mezin û kevnare dîr dixin.

Li ser rûyê şahik ê Firatê keştî digerin, ên ku ji darên çaman hatine çêkirin, bi çerm hatine jîlandin, her wusa keştîyên biçûk bi wan ve ne, yê ku bi çermên beranan ve hatine pêçandin, ji bo ku siviktir bibin. Li ser pêlên nêzîkê beravê, selikek ji qamişan hati çêkirin, bi vir û wir de diheje. Aliyê hundirû yê salikê bi xanişîstê çamê ve pêçaye ji bo avê derbas neke. Di selikê de zarokek şîrê heye. Dayika wî, bi lîzî ew teslîmê ava Firatê kiriye, ku wî ber bi çarenûsek nû ve bibe. Ji beravê masîvanê bi tavê Akkî, salika bi zarokê ve dibîne, lê meyze like. Ew bi darek dirêj dixwaze salikê derdixe û wîlind dike. Bi vî awayî li gor mîtolojiyê nasîvanê hejar dikeve dîroka welatê xwe de. Awê, ku ji ava Firatê digihe destê Akkî, li ba

wî mezin dibe û fêrî bahçewaniyê dibe û xortekî delal û zîrek jê derdikeve. Piştî Xwedêya Îstar dil dikeve wî û alikariya wî dike, ji bo derbikeve ser textê qraliyê û serfiraziyên mezin hemberê dijminan bidest bixe.

Îro, vêce em dizanin, ku qralê ev destan li ser tê gotin, bi rastî jî jiyaye. Navê wî Sargon bûye û împêratoriyek mezin saz kiriye. Îro em dikarin nîvîsên ji dema Mezopotamya ya kevnare jî bixwînin, yê ku bi hezarên salan ketibûne jîbîrkinê de, her wekî yê Egîpetê (Misir a kevn).

Gava em piştî xwe didin Firatê, emê bahçe û daristanên delal û bi plan ji darên xurman ên Fînikî bibînin. Di dema berê de, her wekî nuha dara xurme ya Fînikî danek tebiatê ya herî xweşik ji van cihan re bûye. Ji ava xurmeyên wê, ji hingê ve bi hostayî hingiv û ava tîrş çêkiribûne, ji dendikan xwarin ji bo heywanên xwe derxistine; pelên darê jî bikar anîne. Her çend di dara xurmeyan de nîmetên zêde nebin jî, li vê de li wan meyze kirine, ji bo ji darên wan feyde bibînin.

Em ji daristan a darên xurmeyan derbas dibin

û ji dîr ve bajêr dibînin. Dîwarên bajêr ên bilind û avayiyên parastinê li derdorê. Ji bajarê kevnare çê, em dikarin ji derî yê bi darên spîndaran çêkirî û bi baqir ve hatî jidandin, derbas bibin. Kolanên ji xelkê dagirtî, bi qîr ên bazirganan, bi derbên çakûçan ên hesinkaran, bi lédana dahol û zengilan, bi zivirandina dolaban (tekerlek) ji me re didin xuyakirin, ku em nêzikî dukanên esnafan dibin.

Gava em serî hildin em ê avayiyek bilind û ezîm bibînin. Bilind, bi ser hemû xaniyên bajêr ve, minareyên Zîkuratê diyar in, ên ku li kesên xwedî bawerî û îmanê tesîrek mezin dike. Lê mînare û avayiya herî navdar û mezin a li bajarê Babîlonê ye -Keliha Babîlonê. Li gor destanên herî kevn ev avayî ji alî Xwedêyan ve hatiye çêkirin, ji bo hurmet û rumeta Xwedayê herî bilind ê Babîlonê - Marduk re, ji bo ku ew di cihê herî bilind de bijî. Lê, di rastiye de ev avayî ji bal dîl'an (êşîran) ve hatiye çêkirin, ên ku di wê demê de di avakirina hemû avayîyan de hatine bikar anîn. Hemû karên zexmet bi wan hatine kirin.

Di derdora kelihan de, avayiyên din jî çêkirine, ji bo ku di rojên cêjnên mezin de bi mirîdan bîn dagirtin. Mirîd di van avayîyan de hatine bicîh kirin, li wir razane û xwe amadeyî pîrozîyên cêjnan kirin e.

Navdariya van bajarên ezîm, ji zûve derbas bûye. Ew hatine jibîr kirin û ew tiştên xwendevanên bi meraq lê geriyane û peyda kirine ji Zabûr, Tewrat, Încîl an Quran ên kerîm, an jî nivîsên nivîsvanên kevnare, dijbehin çîrokan.

Bi awayekî lêkolîniyek fereh û kur, di sedsala derbasbûyî (sedsala XIX-an) de arkeologên Ewropayî bala xwe dane vî cihê dagirtî bi dewlemendiyên senet, dîrok, arkeolojî û hwd. ên tevayîya insaniyetê, yên ku di erdên împatoriye kevnare yên Mezopotamya de bûne.

Bi alîkariya bi hezarên karkerên cih, arkeologan dest bi kolanên xwe kirin e, ji destpêkê de wan dîtiye, ku ev avayiyên ezîm û kevn ne tebîl ne. Li ser mainî (kahntî) yên dîroki, bi sedsalan qum û ax hatiye komê û ew di bin wan de man e.

Di rojên destpêkê de, pîsporên dema nû dilşad û kêfxweş bûne. Mainî yên heykelan, skulpturan, peykeran, çekan, kevirên bi qiymet, wêneyên li ser ferşikên ji xerîya sor (kevirê pehn û şahîk) peyda kirine. Bi vî awayî wan bi taybetiyekê bala xwe ne daye gelek ferşikên, ku li ser wan îşaretina ecêb nivîsandine. Ev îşaretan, wekî dewşê piyên çûkan ji wan re hatine xuyakirin û qet tiştêk ji wan fam nekirine. Kesên cara pêşîn ev ferşikan girtine destên xwe nizanibûne, ku di destên xwe de nivîsa kevnare ya ku bi awayê nameyên dîroki bû ne digrin.

Gelên ku di Mezopotamya de jiyane, nivîsa bizmarî ji Sumeran fêr bûne, yên ku runîştvanên xaka bakûrê Mezopotamya'yê bûne. Lê, xerîya sor (seramîk)?

Li Mezopotamya'yê gelek dar û text nebûne, lê xerîya sor hebûye û gelek jî bûye. Xerîya sor ji ber çemên Dicle û Firatê peyda kirine. Ji xerîya sor kerpîç û kiremêt çêkirine, ew li ber tava rojê hişkkirine û paşî jî ev li ser agir germkirine. Ji xerîya sor keramîk, teyfiq, cêr, lampa û gelek tiştên din ên pêwîst ji xwe re çêkirine.

Li ser xerîya sor nivîsandine.

Nivîsvanê Babîlonî yan ên Sumerî di destê xwe de kerpîça tenik a ji xeriyê sor çêkirî girtiye - bi taybetî jî yên ne mezin - û li ser nivîsandiye. Pênûsa wî jî qamîş a tujkirî bûye. Di destpêkê de nivîs wekî wêneyan bûye her çûye hatine hesanîkirin, heta ku ji nivîsa şeklê wêneyan derbasî şeklê nivîskî bûyê, lê dîsa jî mezinbûna cuda "nivîs" hatiye kirin. Ji van nivîsên li ser ferşikên bi mezinbûnên cuda cuda, diblotekên gelekî mezin ava kirine. Ji wan dewlemendiyên insaniyetê, sed xwezî jê re ku beşek biçûk maye, yên ku edebiyat, resim û heta hin jî wan rêziman û ferheng jî di nav wan de ye. Di Mezopotamya kevnare de nuha tê zanîn, ku destpêka ilmên giring - wekî matematîk, geometrî, medicin (TIP), û astronomî hatiye danîn. Veqetandina rojê ji bo dwanzdeh, ya şev û rojê ji bo bist û çar, her wekî veqetandina salê ji bo dwanzdeh mehan dîsa ji şaristaniya Mezopotamya'yê gihiştiye heta rojê

me.

Ji xwendin a nivîsa nameya bizmarî re sebr û hewldanek giring pêwîst bûye, ji bo vê jî pîsbor û zanayên ilmî bi hejmarek zêde hemû zanabûna xwe serfikirin e. Bi vî awayî, zanistîya li ser dunyayê ya ku heta nuha ji alî Incîlê ve dihat zanîn, şeklek nû girt.

Mîtolojiyên, ku hûnê di vê pirtukê de li ser Mezopotamyaya bixwênin, ji nivîsa nameya bizmarî hatine wergerandin, beşin ji wan xwendina wan gelek zexmet bûye, beşin xesar dîtine û nehatine xwendin. Zêdeyên wan jî Sumerî ne. Ev mîtoloji xwedî dîrokek gelek gelek kevn û xwedî giringî - yek mezin in. Navên ku hûn ê di wan de bibînin Akadî ne. Ev mîtolojiyan ji Şumeran gihiştina Akadîyan, paşî Babîlonan û Asurîyan û her çûne ev mîtoloji naverokê ferehtir girtine, her wusa jî bûne malê tevayîya Mezopotomyayîyan.

Xwedanên Mezopotomyayîyan ji zilma xwedanên din hatine kuştin. Şeklên wan wekî yê insanan bûye û kirinên wan jî wekî yên insanan bûne. Şer kirine, zewicîne, zarokên wan

çêbûne û ferqa wan ji insanan tenê di jîrbûn û zanabûna wan a "netebî" de bûye. Insanên tebîî li wan bi heyraniyek mezin temaşê kirine. Bi hêz bûne, mêrxas bûne, zana, xweşik û gelekê caran zalimên wan demên kevnare bûne, ewan karîbûne sehran bi xwe jî çêbikin.

Lê, ew dema dawî ji wan re jî hatiye - ew dema ku ne sehr, ne hêz karîbûne alîkariya wan bikin. Ew jî pîr bûne û wekî hemû insanan ji jîyanê koç kirine.

Gava hûn ê mîtolojiya Mezopotomî li ser Etan bixwênin, wê Ikar ê elenî (yunanî) werê bîra we.

Ev pirtuka han*, armancek wê ku deriyek di ilim de ji nû ve veke tune. Nivîskar daxwaz dike, ku bi keda xwe dixweşiyek bide xwendevanan, ku bi dewlemendiya insanîyetê û şarîstaniya Mezopotamyaya nasîn bibin. Ew dixwaze ji we re bibêje, ku zanistî bê sînore, xweşîkbûn bê sînore, daxwaz a wekhevî û edaletê bê sînore.

* : Pirtûka bi navê "Mîtolojiyên Mezopotamyaya" di demek nêzik de bi wergera Lorana Cengîl wê ji çapê derkeve.

ŞEV Û ROJ Û XOZÎ

B. AKREYÎ

Spêde têt
Bî pêngavêt hêdî
Min Siyar diket û dinêrte şolê wî
li cihê min dirazêt

Sîbera şevê
Destê min digirt
Nivînkêt xo nîşa wî didem
Dest dihelînit
Rojê dikete der
Min jî dinivînit

Çav hêlîna stêran e
Tejkêt wan jî
Du rondikêt herdu çava
Şevê were û pencerê bigire
Nehêle roj bê

Tehran !6 - 5 - 1990

BÎRHATIN

"Ji bo mijilank
Dayika hemû kovana û yek evînê"

Her wê rojê
Vî welatî
Birînên xwe vedialistin
Min di pencerka vîna te ra
Ber xwe dida vê dinyayê
 Li pişt rezê sofî yê gundî
 Destê te dihat
 Gulek didane ser pencerê
 Ku rengê wê
 Wek birîna ser dilê min bû
Piştî çend befr û baranên giran
Di pencera birînên xwe ra
Min mêzande vê dinyayê
 Hemû warên sortiyên gundî
 Lêvên te pêve bûbûn bişkoj
 Çi -ba- ne dişyan
 wan bilerizînin
 wan bilerizînin

15. 05. 1990

FÊRBÛM

Ez fêrbûm hemû rojê
Xemên xwe wisa veşêrim
Ku kes nebînit
Ez fêrbûm derewa bikim û bêjme xelkê î
dê her dem biserkevin
Fêrbûm bikenim
Fêrbûm negirîm
biçim
birevim
û rabime ve
Welê fêr nebûm
Xwe ji du tiştan xelas kem
Ya yekê xem
Duyê jî dayik e.

Stockholm 1991

VICTOR HUGO

Wergêr: Firat CEWERÎ

Victor Hugo (1820-1885). Hemû politîka Victor Hugo bi çend gotinan kare bête ziman : gel, azadî, wekhevî, aşî, pêşketin... Ne ideolojîyek Hugo a vekirî hebû, ne jî tu partiyên wî... Ew ne peyakî têkoşer bû, lê dengêkî wî yê sade, bi hêz, şerker û comerd hebû. Dîsan jî ew sirgûn bû. Di sala 1867'an de li Parîsê pêşangehek berpêş bû. Di nava yên ku kateloga vê pêşangehê amade kiribûn de, Paul de Kock, Edmond About û George Sand hebûn. Pêşgotina katalogê bi Hugo dane nivîsandin. Ew ê Hugo dîroka gelê Parîsê binivîsanda. Hugo di vir de berî ku behsa paşerojê bike, ew behsa pêşerojê dike û utopiyek Ewrûpî davêje ortê. Di vû metna ku pîr hindik tête naskirin de, Hugo wek pêxemberekî dipeyive.

Gaston Bouthoul

NETEWÉYEK DOSTANE Û AŞTÎXWAZ

Di sedsalên bîstan de ew ê neteweyek nedîtî çêbibe. Ev netewe, ew ê mezin be, lê wê mezinahiya wê ji azadiya wê re nebe asteng. Ev neteweya navdar, dewlemend, bîaqil, aşîxwaz, wê ji hemû mirovantiyê re bibe dost. Ew ê sergiranîyek biratiya mezin nişan bide. Ew ê ji listîna rola gullên topan yên berê ecêbmayî bimîne.

Ew ê tu ferqê di navbera generalekî û qesabekî de nebîne. Ew ê sorahiya bersdika yekî, ji sorahiya destê yê din veneqetîne. Ew ê şerekî di navbera Îtalyan û Almanan, Ingilîz û Rûsan û Prûsî û Fransizan de wek şerekî di navbera du herêmên me de bibîne. Ew ê ev netewe rijandina xwîna mirovan bêçih û nehewce bibîne. Ew ê tu carî dilbijokiya hejmara mezin ya mirovên kuştî neke. Em îro çawan engîzîsyonan dibînin, ew ê jî şer wilo bibîne.

EDALETA BILIND

Em îro çawan dêran dihesibînin, ew netewe jî ancax dewletê wilo bihesibîne. Dawên berê ku li hember bêdînan vedibûn, çawan ku îro em lê ecêbmayî dimînin, ew ê dawek weşanê jî ewçend jê re xerîb be. Ew ê cezakirina nivîskaran wek cezakirina astronomên berê bibîne. Ew ê Beranger û Galîle yek bihesibîne û wek Galîle ew ê hepiskirina Branger nekeve serê wê. Gotina ku "Dîsan jî dizîvire" ne ku dê wê bitirsîne, lê wê kêfa wê bîne. Edaleta wê ya bilind wê qencî be. Wê ji barbartiyê dûr be, wê jê biqehere. Ew ê sêpiyê (sêdarê) ji mirovantiyê re bêşerêfî bihesibîne. Bi perwerdikirina (hînkirina) ku bi pêş dikeve, ew ê sûc û ceze wek berfa ku li ber rojê dihele, bihele.

SÎNORÊN VEKIRÎ

Ew ê mirov bi tenê di cihekî de nemînin, ew ê ji gerr û dîtîne hez bikin. Sînorên ku nayên derbaskirin ew ê ji navê rabin. Ew ê cobarên sînoran bibin damarên xwîne yê hevbeş. Firandina pireyekê, ew ê wek firandina serê mirovekî bê îmkana bibe. Ew ê barûda topan ji bo vekirina riyan bêt bikaranînin. Perçe barûdên ku sîngan qul dikin, ew ê sibe bikêfî qulkirina çiyana werin. Hemû şiklên top û tîvingan wê bêt ji bîrkirin... Di sedsalên nozdehan de ji bo xistina Sîvastopol bi tenê li bajarekî Ewropa kuştina 85 hezar mirov herçiqas bi şeref be, ewê ew çend jî xerîb bête dîtî. Wê ev netewe kolandina tunelekê li Alper di ser kewarên Armstrong re bigire. Di vê mijarê de ew ê nezani ew çend bi pêş bikeve, ku haya wê ji çêkirina bombeyek 23 ton, 1866'an de çê nebe.

YEKÎTÎ Û WEKHEVÎ

Dengên mirovên ku şiyar dibin û vir de û wê de baz didin, wê dengên kewarên mêşên hingiv bînin bîra mirov. Çiftlikek bijarte ji bo gundan çî be, neteweya ku ji nav dinyayê şewqê dipijiqîne neteweyên din jî wê ew be. Ji netewetiyê jî bilintir ew ê medeniyet be. Ew ê ji medeniyetê jî bilindtir, malbat be. Ew ê yekîtiya ziman, yekîtiya pere, yekîtiya pîvanê û yekîtiya qanûnan hebe. Ew ê pere bê rawestan dest biguhere. Wê wek xwedî milkekî ku di bêrika wî de bîst frank hebe, dewlemend



VICTOR HUGO

be. Bi ji navê rakirina kedxuran ew ê bilindbûnek qîmet ya bêdawî çê bibe. Şûr li piştê û vala rûniştin wê qedexe be. Ew ê perên pîrr li ordiyên neyên xerckirin. Ew çar milyarên ku ji bo xweparastinê diçin, ew ê di bêrika hemwelatîyan de bimînin. Unîformayên bi şan ku dest û lingên çar milyon xort girê dide, wê ji navê rabe û van xortan ber bi kar, ticaret, erd û fabrika de bikişîne. Hesinên ku rengê şûr û

zincîran girtine wê li her derê bêne helandin û rengê gîsin bigirin. Xwedêyaspehîbûnê ya bi heyşt çiçik wê bi wê mezinahiya xwe di nava mirovan de rûnê. Wê kes kesî nepelçiqînî; ne biçûk mezinan, ne jî mezin biçûkan... Wê li her derê, herkes her kesî wek mirovên bikêrhatî û qenc bibîne. Wê karkirin ji pevgirêdana kole-tiyê biqete.

POLÎTÎKA KU ILIM DAQURTANDIYE

Wekhevî wê ji perwerdekirina mecbûrî û bêpere bizê. Cihê cezayê wê perwerdekirin bistîne, girtûgeh jî wê bibe dibistan. Nezaniya ku belengaziya herî mezin e wê ji navê rabe. Hejmara kesên ku xwendin û nivîsandina wan tune ne wê bi qasi kesên ku kor têne dinyayê hindik bin. Li hember qanûnan wê maf bête fêhm kirin; wê ilim polîtîkayê daqurtîne. Bi sivikbûna berberiyê ku bûyer jî sivik bû, wê hêlên bûyeran yê ne rast jî ji ortê rabe. Şûna qanûnan wê rastiyek bêhempa, şûna seneto jî wê Institut û zanebûn bigre. Karê hukûmetê wê bi tenê ragihandin be. Ew du zahmetiyên wê hebin, gerr û muhafeze. Wê dewlet bi tenê minak û projeyan bide. Hertîştên kê m û kurt wê bi şikla xuyayî re têkeve qayîşê, bi wî awayî wê şûneriya pêşketinê veke. Wê li tu cihan kostek nemine, wê li her derê norm di giraniyê de be. Wê dibistana normal, cihê karê normal, tiyatroya normal, çandiniya normal, weşana normal û li ba hemû tiştî jî wê azadî hebe. Wê azadiya dilê mirov û azadiya mêjiyê mirov yek bête girtin. Ji ber ku hezkirin bi qasî fikirandinê bi qîmet e. Ordiya ramanê ji tabûra êqil bi rê dikeve.

HEBÛN

Gava gerrîn deh qat bilind bibe, wê hilberîn û berxwarin sed qatî bilind bibe. Pîrbûna nê nê wê ji pehîbûnê derkeve û bibe rastî. Wê av bîn bend kirin û pêşiya lehiyan bîn girtin. Di wan avan de wê masî bîn gihandin û bi vî awayî wê jiyan erzantir bibe. Ew ê endustrî endustriyê bizêne, her kesê mil bidin hev, wê kar li her derê şax bide, her tişt di bin bivîrê bereketê de

li her derê bê rawestan dest pê bike. Her ku serê ejderhayê kar yê pîroz jê bibe, wê ji nû ve bizê.

WÊ NAVÊ VÊ NETEWÊYÊ BIBE EWRÛPA
Di şûna şer de aşî. Li hember spîde hevkelîna zeka. Bêhedaniya ghiştina qenciyê, wê ji heq cangiranan û çavtirsonekan bê. Ji bilî vê bêhedaniyê wê tu hêrsbûn tûnebe. Ev gel wê ji bo fêda mirovan sînga tarîtiyê veke û madenên şewqê derêxe. Ev e, netewa pêşerojê wê ev be. Wê serbajarê vê netewê Parîs be û wê ne Fransa lê wê Ewrûpa be. Di sedsalên bîstan de wê Ewrûpa bimîne, paşê jî wê bê guhertin û bibe mirovanti. Ev neteweya dawî ku navê wê mirovantiye, ji niha ve peyayên fikrê, ku çavderiya şevtariyê dikin, dibîne; lê ya ku niha sedsala nozdehan dijî, hê destpêka pêkhatina Ewrûpa ye. Ev xuyabûnek berz e. Wek çêbûna benderuhan, di çêbûna gelan de jî biranînek zelaliya bilind heye. Wê çaxê sirra xuluqandinê bi çavan tê ditin. Di vê dema em dijîn de, wek em benderuha ku ji malzaroka medeniyetê amadeyê zayinê ye, dibînin. Ev benderuha ku wê çêbibe, yekîtiya Ewrûpa ye. Fransaya berz e. Xelkek li ber zayinê ye. Hêka meyyayî ya pêşketinê bi vî dirivê xwe yê xuyayî ji pêşerojê re avis e. Di gurê xwekaşok de benderuha bi bask çawan veşirtî be, Ewrûpa îroyîn jî qolincên neteweya pêşerojê tîne. Di sedsala bê de ew ê ev netewe du baskên xwe veke; wê ev baskên ha yek azadî, ya din jî xwestin be. Welatê biratiyê Ewrûpa ev e, pêşeroj wê ev be. Bila her kes bi qedera xwe razî be, ev dilşahiya ghiştî nayê rawestan. Bila êdî gelê Ewrûpa çêbibe, bajarê wê ji niha ve heye. Paytextê vî gelî ji niha ve amade ye. Ev yeka ku hê nezaye û weka ku wê nebe dixuye, bi xwe qanûnek hebunê ye. Zîgota neteweyan jî wek zîgota mirovan pêk tê; mezinbûn û pêkhatina dendîka jiyane ya ne diyar hertim bi serî dest pê dike.

Parîs, 1867

Sirra karîna bilind ew e, ku ew çiqas siberojê tevî îro bikin. Her karê ku hûn dikin hertim siberojê tevî bikin, lê bizanibin bê hûn çiqas tevî dikin.

ŞERÊ AZADIYÊ

Bareş BETTÊ

Tîrêjên rojê,
Pêlên avê,
Bayê sar,
Li hev û dû diketin.
 Bi dijwarî,
 Bi qêrînê,
 Bi germî.
Lê pêl bi ser diketin bixurtî.
Tîrêj û ba,
Dihatin û diçûn.
Pêlan ew dişkandin
Dûr dûr dikirin ji erdê.
 Ewrên ezmên
 Bi alîkariya bê
 Tev kom dibûn bo hêrîşê.
Pêşî sipî wek pembû
Paşî reş û tarî dibûn.
 Bi baran û bi teyrok
 Barê xwe û bela xwe vala dikirin,
 Ser erdê û behrê.
Lê, dûr dibûn tîrêjên rojê
Geş û har dibûn pêlên behrê
Dibûn mîna kaş û newalan
Dikirin qêrîn û hewar.

Teyr û çûk, mar û masî,
 Diketin qulên erdê.
 Dar û devî dilerizîn ji hêrsa
 Av dibû cenewar
 Bilind dibû, fereh dibû
 Derdor didan ber xwe.
 Ewrên reş û tarî
 Biçûk dibûn, vala dibûn.
 Pêlan ewr dadiqurtandin
 Ba êdî hew dihat, ewr direviyan.
 Pêlên behrê
 Hêdî hêdî sist dibûn
 Roj bi pêlan re dikenî
 Tîrêjên germ rêdikirin
 Dinê dibû xweşî.
 Gul û kulîlk geş dibûn
 Çûk û çêlikan dixwend
 Pêl êdî rawestabûn
 Şerê ewrê reş, bayê cemidî
 Bi ser neket, zora wan çû.
 Mirovên bazdayî
 Mar û mişkên di qulan de
 Derdiketin ji binê erdê
 Hew xwiya dikirin
 Ewrê reş û tarî.
 Bayê cemidî êdî nedihat
 Pêlên behrê hêdî bi nermî
 Tevî tîrêjên germ dibûn.
 Gul û kulilkan dikir tebayî
 û bi hev re digotin: Merşa "azadiyê"
 Didane hevûdû mizgîniya "Serxwebûnê"

MÊŞA HINGIV

Ez mêşa hingiv im
Difirim, digirim li derûdor
Datînim li ser gul û çiçekan
Dimêjim û dikêşim şerbeta wan
Radimûsim, dalêsim nerme pelên wan
Ez im mêvanê biharê
Dikim kara zivistan û adarê
Ava dikim şanên ji şimayê
Da ku bixwin jê çêliyên min yê gewr
Dom dike gera min bi rojê
Berhev dikim heta dawiya payizê
Paşê dikevim xewa zivistanê
Dixwim hingê hingivê şanên şimayê

8 / 3 / 1990

EHMEDÊ XANÊ

Zeynelabidîn ZINAR

Ev 65 sal in ku bihişta çanda kurdî, torre û nivîsa wê hatine serobinkirin û kirine mîna dojah. Ew dojah jî bi awayekî wisan bêteşe çêbûye, ku tê de tu çirîskeke ruhniyê nayê dîtin. Ha wisan dema nifşên nûhafî çavên xwe vedikin, dibînin ku di dinyayeke tarî de dijîn û di nav êgir de têne qelandin. Ha ji ber wê yekê ye ku ew pêşiya xwe nabînin.

Erê, ew nifş ne ku pêşiya xwe nabînin, her tiştî dibînin. Lê mixabin nahêlin ku ew tiştêkî bibînin û çavên xwe vekin. Bêguman ew kiryarên bê ser û ber, ji bo ku nifşên nûhafî ne-kevin kûrayiya dîrokê û xwe nas nekin. Lê belê gotineke pêşiyên me heye, gotine ku: "Dinya dem e, geh petêx e û geh jî lem e!" Û pêşiyên me ev jî gotine: "Rim di têrrê de nayê veşartin" û "Roj bi perdê nayê vegirtin!"

Ev yek êşkere ye dema ku mirov xwe berdide kûrayiya dîrokê gelek rewşenbîrên Kurd, dûrbîn, zana, xwenas, hozan, hunermend, pispor û gwd. têne xwiyakirin. Erê herçiqasî ev 65 sal in ku berhemên kurdî, belge, destnivîs, pirtûk, bermayiyên dîrokî û tiştên wisa hemû hatine şewitandin, li Kurdan hatine cûmucelakirin û ew ji wan bêxeber hiştine, lê bereketa Xwedê li arşîvên welatên demokrat be, ku ji zû ve ye, refên xwe ji nivîsên kurdî û yên li ser rewşa Kurdan dagirtine.

Çewa em dibînin, hêj ji serê Sedsala Yazdehan ve ye, ku gelek tişt bi zimanê kurdî hatine nivîsandin. Lê mixabin, ew li Kurdistanê pir kêm peyda dibin û piraniya Kurdan ageh ji wan nînin. Îcar gelek Kurdên welatparêz ên dilovan di van salên dawî de ji ber zordestiya dijminan

ku welêt hiştine û reviyane derve li dormedarê dinê belav bûne, bêsekan digerin û ji pirtûkxane û arşîvên biyaniyan yeko-yeko wan berhemên kurdî derdixînin holê û pêşberî çavên dinê dikin.

Îcar ez ê bi dilşadiyeke germ, dê ji gelê xwe re, rewşenbîrekî bêhempa di rûpelên kovara NÛDEMÊ de, rêberê nemir, bapîrê zimên, çand, folklor û rewşena kurdî, herweha mamosteyê demokratiyê Ehmedê Xanî bidin nasandin.

Her çiqasî Kurd hemû ji nêz ve Xanî dinasin û bi hiskirina xwe, wî di nivê dilê xwe de dihêwirînin jî, lê mixabin di îro de gelek cuwanên Kurd hene ku jê ne agahdar in.

Ehmedê Xanî di 1651'ê de li Xanê (Hekarî) ji diya xwe re çêbûye. Navê bavê wî Ilyas e û ji eşîra Xaniyan e. Ew, di 1707'an de li Bazîdê çûye dilovaniya xwe. Gora Xanî ya pîroz niha li kêleka mizgefta wî dimîne û ji Kurdan re devereke pir pîroz û giranbiha ye. Herweha gelek kes gora wî ziyaret dikin û jê daxwaza gihastina mirazên xwe dikin.

Eşîra Ehmedê Xanî ji herêma Hekariyê koç kiriye û çûye li Bazîdê bi cih bûye. Îcar hinek dîroknas dibêjin ku di 1562'an de bi koçemalî ji Hekariyê çûye û li hawîdorê Bazîdê cîwar bûye. Lê tu kesî sedemê koçkirinê beyan nekiriye.

Ehmedê xanî di çardesaliya xwe de, dest bi nivîsandina zimanê kurdî kiriye û di nozdesaliya xwe de, dest bi bilindkirina alaya serxwebûna Kurdistanê kiriye. Wî di sîsêsalîya xwe de NÛBAR nivîsiye û di çiluçarsaliya xwe de ji MEM û ZÎN nivîsiye.

Pêşî em ê li vir bo xwendevanên kovara NÛDEMê, jêderkekê ji pirtûka Basili Nikitin bikin, ku li ser vî rêberê me çewa nivîsiye. Nikitin di pirtûka xwe ya bi navê "Kurdan" (r: 489) de gotiye, ku:

- Çewa di gelek deverên pirtûka me de navê Ehmedê Xanî hatiye nivîsandin, bêguman wî di mesela netewî de de vera xwe ya ku layiq bû vegirtiye. Lewra hazirkirina haziriya nijadê, pêşî di helbestên wî de peyda bûye. Pirtûka wî ya "Mem û Zîn" ne ku tenê peyda kiroke girîng ya helbestên "epîk" e, bêhempa ye û gelek bi şan e. Ehmedê Xanî hiskirina xwe bi xebata xwe ya ji bo zimên û girîngbestina pê, bi zanîna xwe ya kûr, bi kultura xwe ya dewlemend, xasma di helbestvaniyê de, nişandana riya azadiyê bi her kesî daye qebûl kirin... Ha ji ber wê yekê, piştî Xanî gelek kes rabûne û xwendegeha wî dane meşandin, herweha wan di rêça helbestvaniyê de jî xwe pê dane şûfandin.

Bêguman gelek zana û pisporên biyanî, xasma Rojhilatnasên Ewrûpî û hinekên Rûsistanê, lêkolînine berfireh li ser Ehmedê Xanî kirine. Wan piraniya naveroka "Mem û Zîn" a wî bi zimanên xwe di gelek kovar û rojnameyan de weşandine. Û di radyon û televizyonan de jî li serê pir peyivîne. Hin ji wan Rojhilatnasên biyanî yên menşûr ku zêde-zêde pesnê "Mem û Zîn"ê dane ev in: Alexandir Jaba, konsûlata Rûsistanê M. B. Rûdenkoyê, R. Leskon, T. Bua û I. A. Orbîlî. Herweha gelek zana û rewşenbîrên Kurd jî, di derbareya Ehmedê Xanî de lêkolînine giranbiha kirine û li ser wî pir nivîsine. Hin ji wan yên menşûr ev in: Pr. Qanadê Kurdo, Ziya Xalidî, M. Emîn Zekî Beg, Şerko, Celadet Elî Bedirxan û kekê wî Kamûran Bedirxan, mamoste Elaêdîn Secadî, Huznî, Givî Mukriyanî, Seydayê Hemze Beg û namoste Sadiq Behaêdînê Amêdî.

Profesorê nemir Qanadê Kurdo di pirtûka xwe ya bi navê "Tarîxa Edebiyata Kurdî-1" û pêla 105'an de, weha gotiye:

- Mem û Zîn, ensiklopediya jiyana miletê Kurd e. Ew, destaneke kurdperwerî ye û tê de tyîn, jiyân, rewş û tevgera neteweyê Kurd a di navbera sedsala 16-17'an de tîne ber çavên

mirov. Mem û Zîn li ser çend binyat û binaxan hatiye nivîsandin. a) Evîniya camêrî û maqûltî, hevhezkirina jin û mêran. b) Mêrxasiya bo destebiratiyê. c) Barandina nifir û afirana li xêrnexwaz û zikreşan. d) Welatperwerî û netewetîya kûr û fireh.

Rêberê Kurd, Ehmedê Xanî, li Bazîdê xwendegehek vekiriye û ji kîsê xwe şagird dane xwendin. Herweha wî çar berhem jî, "Mem û Zîn, Nûbar, Eqîdeya Îmanê û Eqîdeya Îslamê" nivîsine. Tê gotin ku wî li ser tebiatê jî pirtûkek nivîsiye û diwaneke wî ya helbestan jî heye.

NÛBAR: Ehmedê Xanî di 11'ê Adara 1683'an de, ji bo têgihîştina zarûkan di rêça zimanan de, herweha ji bo axaftina rast û hêsanbûna xwendinê bo wan, ferhengoka kurdî-erebî û bi helbestkî, Nûbarê nivîsiyeye. Her beşeke wê, bi jimareke kifş ya kiteyan dikîşe û helbest hemû bi qafiyê ne, gelek jî rewan in. Di pirtûkê de 14 beş û 217 malik hene.

NÛBARa Xanî, bi awayekî wisan xweş û bikerametî hatiye nivîsandin, ku heta niha jî li dinê hempayeke wê nehatiye dîtin. Tenê Şêx Mihemed Kerbela di 1914'an de pirtûkek di şûfê wê de, lê bi kurdî-farisî û bi navê "Mîrsad-ul Etfal" (Amadegaha Zarûkan) nivîsiye. Kerbela bi xwe gotiye, ku min ev: Weke wê Nûbara Ehmedê Xanî nivîsiye.

Belam NÛBAR gelek caran û li pir deveran, wek Stembolê, Misirê, Berlinê û Stockholmê hatiye çapkirin. Lê cara pêşî min ew ji tîpên erebî wergerande tîpên latînî û weşanxaneyê Roja Nû di 1986'an de ew li Stockholmê (Swêd) çap kiriye. Û çapa diduyan ya latînî, min ew li Stembolê di nav weşanên FIRAT de daye çapkirin.

Me van çend helbestan ji NÛBARê jêderk kirin û bo xwendevanan li jêr nivîsî:

*Bismûllahîrrehmanîrrehîm
Mebdeê her îlmekî navê 'Elîm*

*Hemd û sena û şukranî
Ji bo wî xaliqê rehmanî*

*Ku fesahet û beyan daye lîsanî
Lîsan daye însanî*

.....
*Vêk êxistin Ehmedê Xanî
Navê "Nûbihara Biçûkan" lê danî*

*Ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêt kurmancan*

.....
*Arîfê ku bi qencî me' rûfî bit
Dê helîm û sabir û mewqûfî bit*

.....
*Herçî bi 'ilmê cehlî kir mubedel
Sîfrê xwe wî kir bi zêr mukelel*

.....
*Ger te divêtin bibî mîr û ser û mu' teber
Kîzb û xûlafê mebêj, ger te bikin ker bi ker*

EQÎDEYA ÎMANÊ: Ehmedê Xanî, ji bo têgihîştina oldaran û danasîna baweriya ola îslamê, Eqîde nivîsiye. Zarûkên Kurd tev di piçûkiya xwe de EQÎDEyê dixwînin û hemû helbestên wê jiber dikin. Di Eqîde de 73 malik hene.

Mele Ehmedê Qoxî, li ser Eqîdeya Ehmedê Xanî şerhek nivîsiye û hin bêjeyên ku bi hêsanî nayên zanîn, bi zaravayê kurmançî mane kirine û navê wê daniye "Rêberê Sanî".

Di 1986'an de, min vê berhemê jî digel şerha seydayê Qoxê ji tîpên erebî wergerande tîpên latênî û Dengê Yekîtiyê ew di 1990'î de li Elmanyayê çap kir. Pirtûk bi temamî, 174 rûpel e. Destpêka Eqîde ev e:

*Li ba te muheqeq bitin ev cewam
Duhî gote min hatîfî bêhîcab:*

*Se Ehmed sena ke bi qewlê sehîh
Li tewhîdê Barî, bi lefzê fesîh*

*Xwedê yek e, bê hevrî û bê heval
Ne me'zûlî ye, ne mirin, ne zewal*

*Ne esl û, ne fest, û ne da, û ne bab
Heyin wî, heyîna wî nabî hîsab*

*Ji bo wî çu nîne cîhat û mekan
Ne manend û misl û ne hemta, nîşan*

*Mekanan mebine ji bo wî rewa
Nîhayet 'etel 'erşî qed îstewa*

.....
EQÎDEYA ÎSLAMÊ: Heta niha kesî zêde behsa Eqîdeya Îslamê ya Ehmedê Xanî nekiriye. Ev berhem çend rûpelên nivîsa pexşan e û neha tiye çapkirin.

Belam di 1901'ê de, çaxê ku A. von Lecoq li Kurdistanê lêkolîn kiriye, wî gelek berhem û destnivîsên kurdî berev kirine û birine li Elmanyayê di 1903'an de, bi rewşa wan ya orijînal kirine du cild û çap kirine. Ew herdu cild niha di bin parastinê de ne û tenê ew kesên ku xwedîdestûr in ji bo lêkolîna zimanan dikarin bibînin.

Îcar çaxê ez li Pirtûkxana Qiraliyetê (Kungliqa Bibliotek- Swêd) dişixulim, min cildê pêşî bi emanet stend. Beşeke wê hemû destnivîs mele Mihemedê kurê Ehmedê Wanî ye. Di wê beşê de ev berhem hene: Nûbara Ehmedê Xanî Eqîdeya Îmanê ya Ehmedê xanî, Eqîdeya Îslamê ya Ehmedê xanî û Mewlûda Mele Ehmedê Bateyî. Mele Mihemedê Wanî, ew di 1887'an de (Sene: 1305, fi şeh-îl Zilqe'de-9, yem-sulesa) nivîsine. Îcar min ew Eqîde wergerand tîpên latênî û di paşîya Nûbarê, çapa diduyan cîh kir.

Di 1985'an de, çaxê min dest bi berevkirin destnivîsên kurdî kiribû, di nav çend mehanê 250'î rûpel destnivîs bo min berdest bûbûn. Di nav wan de heşt bend helbestên Ehmedê Xanî hebûn. Îcar min ew tev wergerandin tîpên latênî û di pirtûka xwe ya bi navê "Nimûne J Gencîneya Çanda Qedexekirî(rûpel: 89)" de çap kirin. Di nav wan de helbesta herî ku bal mirov dikişîne, çarîneya bi navê "Çargoşe Ehmedê Xanî" ye, ku rêza pêşî bi zimanê erebî ye, ya diduyan bi zimanê farisî ye, ya sisiyan bi zimanê tirkî û ya çaran jî bi zimanê kurdî ye. Ew bend ev e:

"Çargoşeya Ehmedê Xanî q.s."

*Fate 'umri fî hewa ke, ya hebîbî kulle hal
Ah û nalem hemdemşod der fîraqet mah û sal
Ger benim kanim dilersin, çoktan oluştir helal
Dîn û ebter bûm ji işqê min nema eql û kemal*

*Ente fikrî fî fuadî, ente rûhî fîl cesed
Leşkerê xemhayê to mulkî dilem wiranî kerd
Dade geldim işq elinden, isterim senden meded
WanTetaran birne yexma eqlû dîn û mîlk û mal*

*Tale xemmî, zade hemmî, şa'e sirrî fîl mela
Teşneyê camê wîsalem, çun şehîdê Kerbela
Yokse sen diwane oldun, nice halim ey dila
Ya ji nû ve işweyek da min hebîba çavxezal*

*Bûte hîcranen hebîbî leste mînnî alîmen
Her dem ez derdê fîraqet xafîlî ez halî men
Can û dilden erzi kildim halimî canane ben
Erzîhala min tu xafîl qet nepîrsî erzîhal*

*Hel lena mîn nî'metî west-îl hebîbî mîn nesîb
Ûftadem ber derî bîçare sergerdan xerîb
Derdimiz çoklikasinden ona yok hiç bir tebib
Ey tebibê min dewayê derdê XANÎ her wîsal.*

Malikên helbestê ji ya pêşî hetanî ya dawî, sîroveya rêzên biyanî ev e, ku me li jêr nivîsîn:

- Ya evîndara min, bi her awayî temenê min bi evîna te bihurî. Axîn û nalînên min, bi cudabûna ji te ya bi meh û salan e, ku hergav bi min re hevdem in. Lê eger ku tu xwîna min divêyî, jixwe ji zû ve ye ku te ew rewa dêra ye.

- Amaca dilê min tu yî, giyana gewdê min jî dîsa tu yî. Leşkerên te yên xeman dilê min wêran kirine, ji te alîkarî divêm. Çimkî ez ji destê evînê bi hewar im.

- Xemên min yên dirêj û evîna zêde ya bi êş, nihênîyên min ên tije belav kirine. Ez mîna şehîdên Kerbelayê, ji gihastina camê re tihm im. Yan jî, dilo tu dîn bûyî? Wê rewş çewan be?

- Ji min re, bi dûrketina ji evîndarê zanîn tune. Ji derdê cudabûnê, ez timî ji xwe bêageh im. Min bi dil û can rewşa xwe, ji canê re pêşber kir.

- Bo min, qismetê gihastina evînê xweşî ye. Ez bêçare û sergerdan ketim ber deriyê te. Ji pîrbûna derdê me re, hiç doktor nînin.

MEM û ZÎN: Ehmedê Xanî vê pirtûka xwe di 1695'an de nivîsiye. Pirtûk gelek caran bi tîpên erebî hatiye çapkirin. Lê li gor agahdariya zimanzanê Kurd M. Emîn Bozarşan, cara pêşî di 1919'an de li Stembolê hatiye çapkirin. Piştê di 1958'an de li Şamê hatiye çapkirin. Û di 1962'an de li Moskovayê jî bi tîpên latînî hatiye çapkirin. Ji van zêdetir gelek beşên pirtûkê, bi wergerandina zimanê rûsî û yê elmanî jî hatine çapkirin. Herweha di hemû ansiklopediyên îslamê de behsa Mem û Zîn'ê û xwediyê wê hatiye kirin û gelek pesnê wê hatiye dayin. Li welêt cara pêşî M. Emîn Bozarşan, ew ji tîpên erebî wergerandiye tîpên latînî û di 20.10.1968'an de li Stembolê, digel wergerandina bi zimanê tirkî çap kiriye. Îcar ew çapa latînî ev siyemîn car e ku tê çapkirin. Herweha di van demên dawî de, bi berpirsariya Fuad Elçî, li ser Mem û Zîn'ê filim jî hatiye çêkirin û di gelek sînemayan de hatiye leyiztandin.

Mem û Zîn, bi tevayîya xwe 61 beş e û tevî rûpelên bi zimanê tirkî 491 rûpel e. Ew, di nav pirtûkên bêjeyî yên dinyayê de, li rada yekemîn cihê xwe girtiye. Herweha bi babet û naveroka xwe, hemtayê Romeo û Jûliyet'a Shakespeare (Şekspîr) û Leyla û Mecnûn'a Fizûlî ye. Pirtûk çewa ku di Rohhilata Navîn de, herweha li piraniya dinyayê rind hatiye naskirin. Îcar ew, tenê ne ji bo kesên zana û xwendevan, eynî wisan ji kesên nezan û nexweneda re jî rind hatiye naskirin.

Çiroka Mem û Zînê, ji berê Mîladê ve ye ku di nav kurdan de heye û bi navê "Memê Alan" hatiye naskirin, herweha ew bûye destaneke Mîtolojî. Ehmedê Xanî jî ew çîrok bi awayekî hevdemî nûjen kiriye û bi helbestkî nivîsiye. Xanî di pirtûkê de qencî, rastî, bêgunehî, jarî, bindestî û belengaztiyê di şexsê Memê û yê Zînê de civandiye. Herweha Xanî di şexsê Beko de jî xirabî, şalûzî, fesadî, dirûtî, duezmanî û gelek finazkên neçak civandine.

Birastî eger Ehmedê Xanî ne Kurd bûna, ew ê di dinê de bapîrê edebiyatê û mamosteyê demokratîyê hatibûna qebûlîkirin. Lê mixabin ji ber ku di îro de torinên wî bindest in, welatê wî dabeşkirî ye, zimanê wî, folklor, torre, berhem û bermayên dîroka wî hatine taromarokirin, tava roja wî jî germiyêke xweş nade welatê wî. Heta di îro de ew lewheya ku li ser gora Xanî ye jî, bi zimanekî biyanî wek "Ahmet Efendi Turbesi" hatiye nivîsandin!

Me van çend malikan, ji Mem û Zîn'a Ehmedê Xanî jêderk kirin û li jêr bo xwendevanên dilovan nivîsîn:

BEŞ-V

DRDÊ ME

*Saqî tu ji bo Xwedê kerem ke
Yek cur'ê meyê di Camê Cem ke*

*Da camê bi mey, cîhannuma bit
Herçî me îrade ye, xuya bit*

*Da keşfî bit li ber me ehwal
Kanê dibitin muyesser îqbal?*

*Îdbarê me wa giha kemalê
Aya bûye qabilê zewalê*

*Ya her wehe dê li istîwa bit
Heta weku dewrê munteha bit*

*Qet mîmkun e ev ji çerxê lewleb:
Tali' bibitin ji bo me kewkeb*

*Bextê me ji bo me ra bibit yar
Carek bibitin ji xwabê hişyar*

*Rabit ji me jî cîhanpenahek
Peyda bibitîn me padîşahek*

*Şûrê hunera me bête danîn
Qedrê qelema me bête zanîn*

*Derdê me bibînitin îlacê
İlmê me bibînitin rewacê?*

*Ger dê hebuya me serfirazek
Şahîbkeremek, suxennuwazek;*

*Neqdê me dibû sikke meskûk
Nedma wehe bêrewac û meşkûk*

*Her çendî ku xalis û temîz in
Neqderne bi sikkeyê ezîz in*

*Ger dê hebuya me padîşahek
Laiq bidiya Xwedê kulahek*

*Te'yîn bibuya ji bo wî textek
Zahîr vedibû ji bo me bextek*

*Hasil bibuya ji bo wî tacek
Elbete dibû me jî rewacek!*

*Xemxwarî dikir li me yetîman
Tînane derî ji dest le'înan*

*Xalib nedibû li ser me ev Rûm
Nedibûne xirabe yîê di dest bûm*

*Mehkûmê eliyê û sealik
Mexlûb û mutî'ê Tirk û Tacik*

*Emâ ji ezel Xwedê wisa kir
Ev Rûm û Ecem li ser me rakir*

*Teb'iyetê wan eger çi 'ar e
Ew 'ar e li xelkê namîdar e*

*Namûs e li hakim û emîran
Tawan çi ye şair û feqîran*

*Herçî bire şûrî, destê himmet
Zebt kir ji xwe ra bi mêrî dewlet*

*Lewra cîhan wekî 'erûs e
Wî hukmî di destê şûrê rûs e*

*Lê eqd û sîdaq û mehr û kabîn:
Lutf û kerem û eta û bexşîn*

Pirsî ji dinê mîn ev bi hikmet:
"Mehra te çi ye?" gote mîn: "hîmmet"

Hasil, ku dinê bi şûr û îhsan
Texsirî dibit ji boyî însan

Ez mame di hikneta Xwedê da
Kurmancê di dewleta dinê da

Aya bi çi wechî mane mehrûm?
Bîl cumle ji bo çi bûne mehkûm?

Wan girtî bi şûr-i şehîrê şuhret
Texsirî kirin biladê hîmmet

Her mîrekî wan, bi bezlê Hatem
Her mêrekî wan, bi remzê Rostem

Bîfkar ji Ereba heta ve Gurcan
Kurmancîye bûye şîbhê burcan

Ev Rûm û Ecem bi wan hesar in
Kurmanc, ê hemî li çarkehar in

Herdu terefan qebîlê kurmanc
Bo tîrê qeza kirine amanc

Goya ku "li serhedan kilid in"
Her taife sedek in, sedid in

Ev qulzemê Rûm û behrê Tacik
Hindî ku bikin xurûc û tahrîk

Kurmanc dibin bi xwîn muletex
Wan jêk vedikin misalê berzex!

Ciwamêrî û hîmmet û sexawet
Mîrîni û xîret û celadet

Ev xetm e ji bo qebîlê Ekrad
Wan dane bi şûr û hîmmetê dad

Hindî ji şecaetê xeyûr in
Ewçende ji minnetê nefûr in

Ev xîret û 'uluwwê hîmmet
Bû mani'ê hemlê bar ê minnet

.....

(Mem û Zîn, çapa latênî, rûpel: 52-58)

BEŞ-VI

SEBEBÊ NIVÎSÎNA PIRTÛKÊ BI ZARÊ KURDÎ

Xanî ji kemalê bê kemal î
Meydanê kemalê dût xalî

Yanî ne ji qabil û xebîrî
Belkî ji teessib û eşîrî

Hasil: ji înad, eger ji bêdad
Ev bid'et e kir xilafê mu'tad

Safî şemirand vexwarî durdî
Manendê durê lîsanê kurdî

Înaye nîzam û întîzamê
Kêşaye cefa ji boyî 'amê

Da xelq-i nebêjîtin ku: "Ekrad
Bê ma'rîfet in, bê esl û binyad

Enwa'ê milel xwedankîtêb in
Kurmanc-i tenê di bê hesêb in"

Hem ehlê nezer nebên ku: "Kurmanc
Işqê nekirin ji bo xwe amanc

Têkda ne di talib in, ne metlûb
Vêkra ne mihîb in, ne mehbûb

Bêbehre ne ew ji işqebazî
Farix ji heqîqî û mecazî"

Kurmanc-i ne pir di bê kemal in
Emma di yetîm û bê mecal in!

Fîl cumle ne cahil û nezan in
Belkî di sefil û bêxwedan in

Ger dê hebuya me jî xwedanek!
..... (?)

(Mem û Zîn, çapa latênî, rûpel: 61-62)

YÊN BAWERMEND Û "HINDIYÊN SOR"

Şahînê B. SOREKLÎ

Min pirtûk dixwend, lê tiştêk ji maneyên wê di mêjîyê min de çih nedigirt. Ji hêlekê de çavên min ji xwendinê westiyabûn, li milê din ew bûyera şeva çûnî hişemîn bi tevayî di xwe de mijûl kiribûn:

Ber nivê şevê bi nişkekê ve dengê şora hin peyan û qîre qîra jinan ketin guhên min û pê re min xwe ji şeltê çekir, pantilonê xwe kişanda xwe û ber bi deriyê hewşê reviyam. Diya min xwe li paş derî veşartibû û di qelşa navbera herdu beşên wî re dinihêrî. Dûvre min dît, ku bavê min û cîranek me, ew jî li pêş dêrî sekinîne. Ji hewşa hember ya me du polisên bi kincên medenî, Hemê di navbera wan de, derketin û berên xwe dane trimbêla li pêş derî, di kî janê de du polisên din cixareyên xwe dikişandin. Dema cîp bi rêket dengê giriyê jina Hemê û keça wan, Fatmê, êşkere digihîşt guhan. Bê hemdê xwe ez ber bi deriyê hewşa wan çûm, lê bavê min xwe ji paş ve gîhand min û ez li mal vegerandim. "Peyayê malê ne li mal e", bavê min got "bila diya te here serîkî li wan xe." Bavo li min û Fatmê ketibû gumanan û ta ji dest dihat ez û ew ji hev dûr dihiştin. Carekê ji min re gotibû: "Qîza Hemê

ne layiqî te ye; bavê wê serseriyak e. Li mekteba xwe miqayit be û tevdêr mevdêrên boş di qafê xwe de çêmeke. "Lê bavo ne dizanibû, ku dilên me herduyan ji rojên çelrojkiya me de ketibûn hevûdu. Di wan rojan de dayikên me em di qundaxan de li ber hev datanîn û wer dizanibûn, ku yên çelrojki tiştêkî ji evînê fêhm nakin. Di roj û êvarên zarokiya me yên pêşin de min navê Hîva li Fatmê kiribû, ji lewra wê di bin şewqa hîvê de li şer stiranên dayka xwe diaxaft, yên ku di xwe de çîrokên bi darxistina camêran, şewitandina gundan û sitemkariya neyaran didane jîyandin; hin caran jî dibûn çemê evîna xort û keçan, dilanên govendan, meqamên koçer û şivanan. Ez jî ji wê re li ser derd û kulên cotkaran, li ser êldefiyên mirûdên şêxan, li ser melayike û neysiziyên pirhebok û pêriyên ji me çêtir diaxaftim. Dûvre me biryar stand, ku em xwe êdî di van pirsan de mijûl nekin, wan ji yên ji xwe meztir re bihêlin. Hevalbendî û yariya me bi hevûdu re domand, ta heftsaliya me, dema bav û dayên me pê hisiy-an, ku nêzikbûnek zêde di navbera me herduyan de heye. Wisa tirs û sama namûsê biryar bi wan standin da, ku me ji hevûdu bi dûr xin û



dîwarekî, ku bi çavan nayê dîtî, di navbera me de lêkin.

Dayka min vejeriya û got, ku kesekî li Hemê ixbar kirîye û polisên sîyasî ji bajarek din hatine, mal velo kirine û pirtûkek Elifbê girtine. Tev ku Hemê berê jî pîr caran hatibû girtin, carekê ji lewra wî di serxweşiya xwe de stranek Kurdî di meyxanê de kiribû; carekê ji lewra wî kincên Kurdî li xwe kiribûn û tev hevalek xwe êvara Newrozê du şûşe araî vexwaribûn û dûvre herdu tev li pêş mizgefta bajêr, dema azana berbangê, tergê, dîlanek Kurdî, bazdabûn û du-sê carên din jî bo xwendina belavokên li ser Kurdan; dayka min dest pê kir bavêje Hemê, digot: "Xwedê te di erdê ke Hemê! Ev çiqa mirovek ketiye û salê sê çar caran dikeve destên eskeran. Ne îş, ne kar! De malabata wî ê nuha bê wî çi bike?! Gelo îcar çend heftan di girtîgehê kin? Fatmê digot kitabek Kurdmancî îcar girtine. Belkî tew bi mehan û salan jî di girtîgehê de bimîne...."

Bavo şora yadê di nivî de birrî û got wê, ku bila ew mējîyê xwe di mersleyên wisa de mijûl neke, ji ber ku ewa tiştêkî ji wan fêhm

nake. "Here ji me ra çayak xweş bike," domand bavo, "û zû were, ez ê ji we re çîrokekê bibêjim, ku mirovek dîwane ber çend rojan ji min re gotibû."

Me misîne çayî di navbera xwe de bi cîh kir û bavo dest bi çîroka xwe kir: "Li welatekî pîr dîr gelekî azad û serbilind dijî, ku hê tiştêk li ser Xwedê û olên wî ne bihîstibû. Bo wan peyvokên wek musulman, xirîstiyân, cihû, yan katolîk, diruzî, sunnî, yan hembelî, heneffî, elewî,... ji maneyan vala bûn. Welatê wan ji cîhana kevin bi gellek hawan cuda bû û her weha erf û edetên wan. Lawirên wek hesp û ker û qatîran jî li wir ne dihatin nasîn.

"Rojekê ji rojan gemîyekê nêzikî li warê wan kir û komek peyayên çerm-gewr li wana bûn mēvan. Mazûbanan qedrê biyaniyan bilind girtin û li şûna çîşkek caw neynikekê, yan îtîkekekê zêr û yaqût dan wan. Dû derbas kirina hejmarek rojên wek di xewnan de, yê çerm-gewr li welatê xwe vejeriyan û gotin xelkê, ku li şûna ew berê gemiya xwe bidin rohilat, dane roava û xwe gîhandin Hindistanê, ya ku li rohilata Ewropa ye, û li merovên "Hindî" bûn mēvan. Wisa şênîyê Ewropa navê "Hindiyân"

li xelkê wî welatî kirin, tev ku ev welat û Hindistan pîrr ji hev dûr bûn û ji rengê çermê her du gelan bigir ta toreyên wan ne yek bûn.

"Ji lewra keştîvanan li serzêrê pîrr, keçikên tazî û zevîyên dewlemend şor kiribûn, qeralên Ewropa biryar dan, ku ew ê yên bawermend bişînin wir, bona ew li wir rêya Xwedê bi kar wînin. Wisa komek ji bawermendan berên xwe dan roava, bo herin "Hindistanê." Dema "Hindiyan" ew li ser hespên wan dîtî, tirsîyan û ji wan re secde kirin, ji lewra wan wer texmîn kir, ku hesp û siwêr her du yek in û her yek jio wan xudayek mêvan e, yan nûnerê Xwedê ye. Dû demekê yên "Hindî" pê hisîyan, ku beşê bi seriyê mezin ji paşîya xwe pîstiyê dixê der û beşê bi seriyê piçûk, ew jî peya dibe û bi tenê xwe dirrî. Wisa "Hindiyan" tê derxistin, ku beşê serî mezin lawîrek çar ling e û yê serî piçûk merov e. Her weha ew tê gihîştin, ku kes ji yên çerm-gewr ne xwedê ye û ne jî kesek bimbarek e, ji lewra pîsî ji Xwedan û yên bimbarek nayê der. Lê Ewropîyan bi ser hişkî domandin, ku ewana bimbarek in û bi navê Xwedê, kurê wî û ruhê bimbarek dest bi kujtina "Hindiyan" kirin. Ezman li jor weqa fedûkar derket, ku royê çel rojî xwe veşart û xwe raber nekir, lê mêvanan wer texmîn kirin, ku ezman û ro li wan nikaribûn di demek kurt de ev şênîyê kafîr û hov wînin ser rêya rast. Bi vê baweriyê wan stemkarî û zordariya xwe du qat û sê qat kirin.

"Serdariya Ewropîyan domand û ji welatên wan hejmarên mezin dest pê kirin berên xwe bidin" Cîhana NÛ. "Rojek hat, ku mêvan ji mazûbanan bêtir bûn, lê "Hindî" pîrr dereng bi merselê hisîyan; wan nuha bi tîr û kevanan li dijî tîfing û topan ber xwe didan; camêrî û fêdebûna wan bi agirê barûdê dihatin şewitandin.

Dûvre hat dema "peyman," lê peymanan di rûpelên xwe de bêjeyên wek derew, pêkenîn, dubendî, ûhd dihewandin, ku xwebêjeyên wan bo yên "Hindî" biyanî bûn. Wisa ew car din hatin xapandin, yan bi rihetî, yan bi zorê ketin

şûnên nemaze, "xaniyên nûjen." Ji vir û şûn ve mirina neteweyekê dest pê kir û endamên gelek fêde û mêrxas, yên wek baz û Sahînan sînor û dîwar nedinasîn, bûn wek dewêr. Rojek hat şivanên wan jî mirin û "hindiyan Sor," ji lewra Ewropîyan dîtî, ku ev warê nû ne Hindistan e, bûn qurbanên medeniyet û pêşve-çûna Ewropîyan. "Dema yên Ewropî rojekê pê hisîyam, ku ev cîhana nû ne tenê giravek e, lê erdek fireh û pahn e, bi hebûna ser û binê xwe zor dewlemend e, wan dest pê kirin ji xwe re li kolayan bigerin, bo wan tîxin ber kar û bi hêza piyên wan û dayîna zevîyên bi xêr û bêr xwe û hebûna xwe qelewtir bikin. Tev ku Xwedê pêxemberê wan koledarî qedexe kiribûn, wan biryar dan, ku ji beşek cîhanê din zarokan, xortan û keçan birevînin, wan jî merî û malbatên wan bidizin û bo xwe ta roja mirinê bikin kole û azep.

"Dibêjine, ku "Cîhana nû" dûvre bû du beşan û di her beşekî de welatên cuda hatin holê û dibêjine îroj li eir beşek serdest û yek bindest heye. Di beşê duwem de, dîsa çînen cûr bi cûr hene, ango hinên bindest xwe li ser hinên din kirine serdest û ew kirine bindestên bindestan". Bavo ji bêriya xwe destmal derxist û bi ser eniya xwe re xuşand, wek xuyê paqîş bike, lê ti şopên xuyê li ser eniya wî tunebûn. Bawer nakim diya min tiştek ji çîroka bavo fêhm kir, lê bona wî dilşa bike, pîrsî, ger çîroka kesê diwane rast be. "Nizam," bavo bersîv, da "Yê diwane nuha li bajarekî mezin di girtigêhê de ye, ji lewra dawîya çîrokên wî ne dihat, çîrokên ku şênîyê me ji wan fêhm ne dikirin."

Ez çûm razem, lê çîroka yê diwane, bejna Fatmê, wêneya Hemê yê ku bê berxwedan xwe di destên du polîsan de bera dabû û imtîhana xwendegehê, hemî ketibûn nav hev, bibûn melaxme û xew ji çavên min dizîbûn. Ne dizanim çima bi nişkekê ve pîrsekê xwe di mêjiyê min de hanî holê: Gelo mebesta yê diwane bi gotina çîroka Hindiyan Sor li bajarê me çî ye? Min sond xwar, ku ez ê li bersîva vê pîrsê bigerim.

BAYÊ PAYIZÊ

Arjen ARÎ

Evqa asak û şîn û girî
evqa hepsê tije kirî
bayê payîzê ma çi nekir
ma çi hişt ne xera kirî.

Ji wê sibê heya niha
nesekinî li tu cîha
kesek bi me ve ne giha
ma çi hişt li devê derî ?

Geh bi girtin û kuştinê
berê me da tim mirinê
li pêş çavê vêqa dinê
em xistin nav şîn û girî,

ev du sale, bi roj û meh
yeka me kir, li me kir deh
li vî welatê mêtîngêh
ma çi hişt ji me ne birî ?

Dewran e dem wilo nare
geh payîze, geh buhar e
zordarî qet nebû çare
di dirokê de, ya bihûri...

JI AZADIYÊ RE ÇARÎN

Heya gorrê tu hisret e
ji dil re tu bereket e
gelek şa bûn bi navê te
ji me re tu hîn aqûbet e.

DI REŞAYA ŞEVÊ DE

Rûyê heyvî hat ber çava
ketme xeyala evînê
min keserek veda, bi axîn
keserek
di reşaya şevê de...

Pel di şaxa de li ber ba ne,
çûk
di hêlina de kerr
payiz e,
nîvsermak,
li derve gur-gura tava
peşkê baranê
tev li fikra min dibin,
beledî
te tînin bîra mi

Bi tenê me.
tenê
bi serê xwe
ser bi fikra te tiji,
dil
bi evîna te
ezê çawa kim ?
rûheyvê,
porkulikê.
şîn û kûr
binê bahrane çavê te
vê şeva payizê meyla te
mîna gur-gura tava
birûska vedide di laşê min de.

ÇARÎN

Hîv ber bi sibê de dire
şev ber bi rojê de
ez ber bi te de tîm,
li dû hîve di şevê de...

SALA NÛ

Nîvê şevê seet duwazde
şevê şeva zivistanê
salek nû tê bi ser me de,
salek nû tê Kurdistanê,

Bo sala nû me neqîşand
darek çama, xemilandî
tev bi qeseb û zêrina
Hêvîya me pêv daliqamdfî,

Pîroz be li me ev sala nû;
ê li hundir, ê li derve
em tev bijîn bi jînek nû
fêkî û team tev li ber me

Zarok diçin nava mala
pîroz dikin serê salê
dirin lep û rûwê hevdû;
"Xwedê kurkî bidê malê"

Her ro wilo wek sersalê
kêf û xweşî pahra me ba;
li ser dinê ev bindestî
û zordarî jî qet neba,

Cîhanek bê hêsir û girî
me divê ji te bavê Noel,
zarokê tîr î nemirî
me divê ji te bavê Noel.

KURDINO, BI KURDÎ BIXWÎNIN !

İbrahim AL

Berî bi dîroka vê nivîsê bi şanzdeh salan, gava ez cara pêşî çav li nivîsa kurdî ketibûm, ez şaş û ecêbmayî mabûm. Erê min dixwend, lê min bi çavên xwe bawer nedikir û aqil nedikir ku wê alfabe kurdî û zimanê kurdî yê nivîskî hebe. Dibû ku ew ji kêmaniya min ya nezaniya tarîxa welat û zimanê min dihat.

Min ew nivîsa ha di rojnameyekê de dîtibû. Cara pêşî gava min ew nivîs xwendibû, min tu tişt jê fêhm nekiribû. Ji bo min weke zimanekî xerîb hatibû. Gava min ew nivîsa kurdî dixwend, tiştên ku min jê fêhm nedikir, ez di ser re derbas dibûm. Mersele min qet ji tîpa "x" fêhm nedikir. Min nizanibû wê tîpa "q" û "w" çawa bê xwendin. Gava di wê nivîsê de tîpa "x" û "w" dihatin ba hev, ew weke "ekswe" dixwend. Lê gava mirov "xwe" bi "ekswe" bixwîne, bivê nevê mirov tişteki ji naveroka nivîsê fêhm nake. Şansê min yê xerab jî di wê nivîsê de tîpa "x" "q" û "w" pirr bûn.

Min ew rojname li çayxaneyekê li ser maseyekê dîtibû. Wilo xuyabû ku hinan ew rojname li ser masê jî bîr kiribûn. Piştî ku min çend caran ew rojname di ser hev re qulupand, min

ew li hev pêça, xist bin çengê xwe û bire malê. Êvarî, piştî şivê, min ew ji dê û bavê xwe û ji zarokan re xwend. Bavê min pêşî tişt ji xwendina min fêhm nekir, bi tiqê-tiqê kenîya û ji min re got:

-De here lo, ma ev ji ku bi kurmancî ye ?

Zarokan jî tişt ji min fêhm nekiribûn, lê diya min, ya ku hertim ez diparastim, wê carê jî ez parastim û xwest ku bi endamên malê yên din bide qebûl kirin, ku ew bi kurmancî ye.

Ew nivîsa ku min dixwend û bavê min guhên xwe mûç kiribûn û lê guhdarî dikir, xwest ku ez careke din jî jê re bixwînim. Min ew nivîsa xwe dîsa ji bavê xwe re xwend, zimanê min li hev digeriya û ji kurmancî wêdetir ji min re wek zimanekî xerîb dihat.

Bavê min carekê ji nişkê ve peyva min birrî,

-Hela ka tu wê rêzikê carek din jî bixwîne.

-Kîjan rêzikê ?

-Ew rêzika ku te niha xwend.

Min ew rêzika ha dîsa ji bavê xwe re xwend.

-Piştî min pezê "ekswe" av da, ez çûm...

-Ka tu bisekine, bisekine, tu bi xwedêki te bi xwe çî jê fêhm kir ?

Min ew rêzika ha carek din, lê bêdeng xwend. Min ji pirraniya rêzîkê fêhm dikir, lê min ji "xwe" fêhm nedikir, min ew weke "ekswe" dixwend.

Bavê min dîsa ji min re got :

-Hela ka tu dîsa wê rêzika ha ji min û diya xwe re bixwîne.

Min ew rêzika ha dîsa xwend :

-Piştî ku min pezê "ekswe" av da, ez çûm bin siya darê û min nanê "ekswe" "ekswar".

Bavê min bi dengê bilind kenîya :

-Ekswe çi ye lawo ? Ew ne "xwe" be.

Êdî min hew ew nivîs ji wan re xwend. Min rojnameya xwe girt, ez çûm odak din û min ji xwe re ew bend û maqaleyên di wê rojnameyê de xwendin. Gav min "xwe" bi "ekswe" dixwend, tu tişt jê nedihat fêhm kirin. Lê piştî xwendina çend caran ez ji ber xwe ve têgihîştim ku ew "xwe" ye. Piştî wê bi demek kurt ez li dû alfaba kurdî geriyam. Bi alîkariya hevlekî xwe, min alfabeya nivîskarê kurd Mehmet Emîn Bozarslan bi dest xwe xist. Ew roj ev roj e, hewesa min ji xwendina kurdî re çêbûye. Bi alîkariya xwendina kurdî, bi alîkariya hevdana berhemên kurdî min şexsiyeta xwe bi dest xist. Îro, di gel ku em li bajarekî mîna Ankarayê rûdinin û karê min karekî resmî ye jî, dîsa jî ez zarokên xwe hînî xwendin û nivîsandina kurdî dikim. Em hemû bi vê yekê serbilind in. Ji bo ku em wek gel serbilind bibin, divê em bi zimanê xwe bixwînin. Ziman şexsiyet e, ziman huwiyet e,

ziman xweparastin e. Ancax em bi zimanê xwe, bi edebiyat û kultura xwe bikaribin, wek neteweyekê behsa hebûna xwe bikin, bi gel û neyeweyên dinyayê re bi biraft û dostanî bijîn.

Niha hûn ê bêjin xwendina kurdî zehmet e, giran e, em jê fêhm nakin. Rast e, xwendina kurdî zehmet û giran e, lê ji bo kurdekî xwende yê kurdistana Tirkiyê, hînbûyina xwendina kurdî kar û xebata deh rojan e. Û hînbûyina nivîsandina kurdî jî ne zêdeyî xebata çend mehan e. Gava ez wan rojên berê tînim bîra xwe, ez dibînim ku em çiqas belengaz bûn. Ez mamosteyekî kurd û lawê mamûrekî, min nikaribû bi zimanê xwe bixwenda. Îro, ez dibînim bi sedan pirtûkên kurdî çap dibin. Bi dehan kovar û rojnameyên kurdî derdikevin. Ji bo hînbûyina zimanê kurdî îro îmkanên me ji yê hertim bêtir in. Lê rica min ji hevalên Ewrûpa ew e, ku berê xebata xwe bidin welêt. Ger her yek ji hevalên Ewrûpa deh kurdên welêt bi xwe re bigihînin, û her yek ji kurdên bi alîkariya kurdên Ewrûpa gihîştine, dehên din bi xwe re bigihînin, hûn wê çaxê bi xwe hesab bikin, bê salê çend dikarin bigihên.

Ez hêvîdar im wê kovara we "NÛDEM" di vî warî de roleke berbiçav bileyize û di warê hûner, edebiyat û kultura kurdî de bibe çavkaniya nivîsê pêşerojê. Ez ji niha ve we, hevkarên kovarê pîroz dikim û ji we re pêşerojek rohnî, jiyaneke azad û dilşa daxwaz dikim.

Ankara 1992

HEVPEYIVÎN BI

ETNOGRAF Û FOLKLORÎST

FARÛK HAFÎD RE

Dilower MÊQERÎ

Li nivîsgeha Komela Uppsala, karmendekî çil û heşt salî her tim serê wî di nava pitûkan de ye û dixwîne, carinan bersivên silavên xelkê dide û dîsa xwendina xwe domdike. Farûk hafîd, ji kurdistana başûr, ji bajarê Nalî, Mihoyî, Salêm, Kurdî, Goran û Bêkes. Vî bajarê ha bandorek (tesîr) li ser jîyana wî kiriye. "Bapîrên min Tariqa Qadirî damezirandine û ta niha li mizgefta Şêx Ehmed, li Silêmaniyê meqamên wan hene. Wek tê zanîn nakokî di navbera wan û Tariqa Neqşebendî de hebû û di zemanê Babanî de wan Mewlana Xalîd mecbûr kirin ku koçî Şamê bike. Ez ji malbateke dînî û berz im, ku di dema Şêx Mehmûd Hafîd de (Berzencî) rola wê ya neteweyî zor mezin bû. Di salên bîstan de Şêx Mehmûd bi navê Şahê Kurdistanê hikma welêt dikir." Ew herweha dom dîke: "Bav û kalên min weke Şêxên Tariqa xizmeta zimanê Quranê kirine, lê, min bi eksa wan kir, ez xizmeta ziman û çanda kurdî dikim, ji ber ku ji bo min ji her tiştî pîroztir e."

Ji ber ku jiyana vî kurdê pîrhêl, pîrgerfayî û zana bala min dikişîne, ez jê dipirsim:

Gelo tu dikarî bi kurtî ji me ra behsa jîyana

xwe bike?

Farûk Hafîd devê wê pitûka stûr ya di dest xwe de digire, hebekî difikire, paşê hêdî hêdî dom dîke:

-Ez di sala 1943 an de, li bajarê Sulêymaniyê, li Kurdistana başûr ji dayik bûme. Min xwendina xwe ya destpêk, navendî û lîse li Sulêymaniyê tewaw kir. Paşê, ji bo xwendina unîversîte ez çûme Macarîstanê. Di navbera salên 1964 - 1971 ê de min unîversîta beşe Îranî û kurdolojî (ziman û edebiyata Farisî û Kurdî) tewaw kir. Di vegera min a welêt de, ez li zanîngeha Sulêymaniyê, di beşa folklorê de bûme mamoste. Pê re min li gel mamoste Şamal Saîb ji bo damezrandina merkeza çandî û hunerî li zanîngeha bajêr me nameyek pêşkeşî serokê zanîngehê kir. Me di nameya xwe de daxwaz kir, ku em bikaribin merkezek wilo ava bikin. Di salên 1985 - 1986 an de min wek serokê Muduriyeta Çandîya Gelerî ya Sulêymaniyê kar kir. Lê, ji ber ku wan dixwestin ez bibim endamê partîya rejîma Baas, min karê xwe dom nekir. Di sala 1987'an de ez di gel malbata xwe hatim Swêd û niha wek tu dibînî ez li nivîsgeha Komela Uppsalayê kar dikim.



Foto: Şoreş Zîrek

Par li Swêd pirtûkek te bi navê "Hilbijartin ji Çirokên Folklorê Kurdî" çap bû. Gelo tu dikarî me di derbarê kar û barê xwe de agahdar bike?

-Belê, ev pirtûk di sala 1991 ê de bi zaryavayê soranî derket. Berî wê min li Kurdistanê du kitêb li ser folklorê çap kirine û hevî dikim ku beşa dawî ya herî mezin (1050rûpel) bê çap kirin. Ev kitêb di derbarê komela çirokên gelerî de ye, ku di nav salên 1965 - 1986 an min kom kiribûn. Dema min dest bi amadekirina çirokan kir, min dixwest ez bi rîya zanyarê almanî Oskar Mann herim û min ji xwe pirs dikir: Baş e, Oskar Mann di zemanê Şah Muzaffardîn, çû Îranê û pirtûka xwe li ser zargotina netewa kurd pêşkêş kir. Çima em nikarin pirtûkek weha bi qîmet ji bo xizmeta miletê xwe amade bikin?

Ev pirtûk derket û ya din jî ji bo çapê hazir e. Wextekî li zanîngeha Sulêmaniyê, min pêşkêşî mamostên kurd yê beşa dîrasetê edebî kir. Ew mamostên ha ev bûn; Dr. Kemal Fuad, Dr. Kurdistan Mukiryani, Dr. Şukriya Resûl, Dr. Nûrî Arîf û Dr. Omar Sadiq. Van mamostên kurd lê nihêrîn û mohrên xwe ji bo çapkirina pirtûkê lêxistin. Ew ên ku hatin weşandin min

gelek pêşkêşî xelkê kir. Lê mixabin, li Swêdê hindik hatin firotin.

Axir ev pirtûk gihîşt armanca xwe ya ku bibe dokumenterek ji bo dîroka zargotina me.

- Belê rast e.

Baş e, dema tu dîsa li ser vê pirtûka ku min ji li orjîna wê nihêriye, dixebite, tu çi bandora , sensura rejîma Baasê tê de dibînî?

- Nexêr, ew ya ku bi pênûsa sor hat qedexekirin maf neda min ku ez çap bikim. Belem, min digel guhartina hemû naveroka wê ew li Swêdê çap kir.

Bi baweriya te, beşa mezin ya zargotina kurdî hatiyê nivisandin, an jî hatiye ji bîrkirin?

- Bi baweriya min, zargotina kurdî gelek dewlemend e û samanê wê zor in. Di kar û barê vê pirsê de xebatek dîr û dirêj çêbûye. Ji wexta Mele Mahmûdê Beyazîdî û Oskar Mann, ta Marûf Cawik, Îsmail Haqî, Tewfîq Wehîfî, Şex Mehemed Xal û ta dema me wek Îzedîn M. Resûl , Qanatê Kurdo, Celîlê Celîl û hwd... Û li Kurdistanê başûr di derheqa vê pirsê de xebatek baş bûye. Bi taybetî salên 60-90 gelek pirtûkên li ser folklorê çap bûn û di salên 70 an de sendîka mamostên kurd cildeki gewre derxistin. Belem zor mixabîm, bi raya

min beşa mezin ji folklorê kurdî ket bin axê. Çend sedemên ku zargotina me nehatîye komkirin nivîsandin heye, wek; Hukumetên kolonyalist nehiştine mîletê me bi folklorê xwe şa bibin. Wek nîmûne ku em bêjin li Kurdistana başûr rejîma Baasê faşîst hemî erd, gund bajar û eserên dîrokî wêran kirine. Êdî gelo wê çawa rewşa çanda kurdî û bi taybetî rewşa zargotina kurdî baş be?

Tunebûna merkezê çandî ya berz li Kurdistanê pîrranîya xelkê me nezanin, ev pîrsa girîng bala wan nekişandîye. Lê, niha em dixwazin bala xortên kurd bikişînin ser vê pîrsa girîng. Divê xortên me li folklorê xwe xwedî derkevin û beşa ku maye ji mirinê biparêzên.

-Niha em dibînin ku folklorê bala gelek xortên kurd dikişîne, ew bi alîkarîya hevdanê û komkirina li ser kasetan û nivîsandîna dixwazîna wê bermaya pêşîyên me biparêzin. Nêrîna te wek folklorîstêkî di derheqê wê yekê han de çîye? Tu çi şertan davêjî ber van xortan û çi şîretan li wan dikî?

-Ez zor şad dibim gava ez dibînim, an dibihîzim ku genc û xortên kurd meyl û hezkirina xwe berdane ser zargotina xwe û dixwazin beşekî ji vê samana dewlemend kom bikin. Girînge ku xortên îro bala xwe bidin zargotin, şîrok, metelok, meqam û destanên kurdî. Ji ber ku hemû dewletên dinyayê li ser esasê çand û folklorê xwe rabûn. Ew yekê ha ji bo mîletê me yê bindest pêwîst e. Ez bi mijûlbûna xortên me ya bi pîrsa zargotinê ve kêfxweş im. Ê, belê ez dixwazim ku xortên me vê xebatê îmî û zanistî bikin. Tişteki xweş e ku mirov ji folklorê xwe hez bike, belem şertên zanistî jê ne, divê mirov ji bîr neke. Gerek xebata wan jêdî hêdî be. Ew lêkolîn, bi pîrîn, meteryalan bidin hev. Divê ew demên dîrokî, tesîrên civatî, ferehengî, siyasî û girametîkî bizanibin. Zanî gelek baş e ku entresa xortên kurdan ji zargotina wan re çêbûye. Lê, divê wê jî bêjin, ku gelek girîng e xortên kurd hînî xebata zanistî bibin û hewl bidin ku di zanîngehan de jî wê pîrsa girîng bikolin. Ji ber ku ez bi xwe li wê riyê de çûm, min li ser zargotinê di zanîngehê de xwend û niha jî ev karê min e.

Niha pirtûkeke te li ser muzexana Etnografî

ya li Silêmanîyê amadeyî çapê ye. Gelo tu dikarî ji me ra bêjî bê te kengî dest pêkir û behsa etnografîya kurdî kirîye?

-Belê, dema ez ji Macarîstanê vegeyîyam û bi taybetî salên 1971-73 an min pîranek da ber xwe ku beşekî çûda li ser pîrsa etnografîyê li zanîngeha Silêmanîyê çêbikim. Paşê em li gelek ciyên Kurdistana başûr gerîyan û bi taybetî jî li der dora herêmên Silêmanîyê, Hewlêr, Dihok, Zaxo, Amedî û Kerkûkê ta ku me der û dorên etnografî bi kamerayê sînemayê û bi foto kişandin. Ew salekê berdewam bû. Berhemê xebata me bû filmekî taybetî, ku me ew pêşkeşî serokê zanîngeha Silêmanîyê kir. Di sala 1975 an de, gava şoreşa Mele Mustefa Berzanî destpêkir ez jî bi pêşmergan re çûme serê çîya. Ez di herêmên rizgarîkirî de bûm berpîrsiyarê Komîta Folklor û rêçkirinek nuh ava kir.

Herêma rizgarîkirî wê çaxê ji Dihokê ta derûdora Kerkûkê bû. Û i wê navê de jî xabatên me li ser avakirina muzexaneyekê hebû. Mele Barzanî mala xwe da me ji bo ku em bikaribin wê weka lokalek muaqet bikarbînin. Û di vê mala dîrokî de me tiştên etnografî rêzkirin, wek; cil, xalf, çîk û hwd... Di van serdanên muzexana me de gelek rojnamevanên ereb, fransîz, rûs û emerîkî hebûn.

Sala 1976 an, piştî ku şoreşa kurdî sekinî, ez vegeyîyam Silêmanîyê. Lê, li zanîngeha Silêmanîyê kar nedan min, loma ez çûm Hewlêrê û ji bo merkeza otonomîyê min wek mamoste û lêkolînerê beşa folklorê li zanîngeha wê kar kir. Piştî demekê serokê zanîngeha Silêmanîyê jî min re nameyek şand û xwest ku ez herim Silêmanîyê. Ez hingê vegeyîyam bajarê xwe. Wê çaxê serokê zanîngehê welatên ereban hatin dîtina karên me yê çandî û nemaze muzexaneya me ya etnografî. Hingê rojnameyên erebî û radyoya Monte Carlo gelekî behsa wê kirin.

Sala 1977 an min xwe ji karê muzexanê re amade kir û me lokala wê ji xaniyekî kevin yê zanîngehê ava kir. Herweha karê me li gel alîkarîya serokê zanîngehê û mamoste Azad Şewqî dom kir. Karê sazkirina wê muzexanê li ser milê hunermendê mezin mamoste Kamêl

E. Marûf bû, ku arjitek, neqîş û rêzên hunerî bi pîlanên wî çêbûn.

-Ev cara yekem e ku pirtûkek li ser muzaxana kurdî dertê; gelo tu dikarî bi kurtî behsa naveroka vê berhemê bikî?

-Di destpêkê de min dixwest ku ev berhem bibe weke rêberê ji muzexaneya kurdî ya etnografî re. Lê, ji ber ku ev demek dirêj e ku ez ji welêt dûr im û haya min ji guhartinên nû tune, min navê pirtûkê kir "Muzexaneya Etnografîya Kurdî." Naveroka vê berhemê di derheqa avakirina vê muzexanê, lokala wê, materyal û beşên wê de ye. Li gel behsa analîza tiştên etnografî û têkiliyên wan yên bi pîrsa dîroka huner û sembolen mîtolojî, me hemû tiştên di muzexanê de di gel wêneyên wan jî pêşkêş kirin. Niha ew pirtûka tewaw bûye û ji bo stendina alîkarîya çapê min ew pêşkêşî "Kulturâdet" ê kirîye.

-Piştî serhildana adara 1991 ê, ku ji bo gelê me bû trajedîyek, gelo te tu nûçe di derheqa muzexanê de bihîst? Ger ew muzexane wêran bûbe û hatibe sûtandin, ew ê ev berhema ha karibe çi roleke mêjûyî bileyize?

-Ez dixwazim bi kurtî bêjim, ku ev serhildana ji bo gelê kurdî karekî zor pîroz bû. Piştî wêrankirina beşekî gewre ji bajarên Kurdistanê, min bawer nedikir ku wê muzexanê bimîne. Lê hin biraderên ku ji vir çûbûn, piştî vegeftîyan mizgîniya ku muzexane tu tişt pê nehatiye da min. Ji ber vê yekê ez niha dilşa me. Lê em bêjin, ku siberoj tiştê bi vê muzexaneyê were, ew ê ev pirtûka ku bi gelek wêneye, bikaribe bibe dokumenterek mêjûyî ji bo etnografîya neteweya kurd.

-Pîrsa me ya dawî; nêrîna te wek folklorist û etnograf li ser pêşeroja ziman û edebiyata kurdî, ya ku xwadî sê-çar zarava û sê-çar alfa-

beyên cihê ye çî ye?

-Wek tê zanîn sê-çar zaravayên kurdî hene û edebiyat wan di nav du beşan de par dibin; beşa nivîsê û beşa folklorê. Beşa yekem ji me re di salên 1000 î, zemanê Baba Tahêr Hemedanî de hat ku bi zaravayê lorî helbest dinivîsand. Pêra helbestvanê mezin wek Ehmedê Xanê, Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran û hwd, bi zaravayê kurmançî nivîsandin. Van du sed salên dawî jî zaravayê soranî bi helbestên Mihoyî, Salê, Nalî û hwd. xurt bûye. Di vê dema dawî de jî zaravayê hewramî û zazakî dest bi nivîsandinê kiriye. Ta niha li Kurdistana başûr û rojhilat tiştên erebî bikartînin. Lê, li Kurdistana bakûr û rojava tiştên latînî bikartînin û herweha kurdên Sovyetê tiştên kirîlkî bikartînin. Lê tiştê herî giranbiha ew e, ku kurd xwe wek neteweyekê û xwedî edebiyatekê dizanin. Tiştêkî pîr normale ku çend zaravayên me hene. Ev yeka ha li ba miletên din jî heye. Bi bawerîya min hebûna zaraveyan kultura me dewlemend dike. Lê ger kurd rojekê bikaribin zimanê xwe bikin zimanekî yekgirtî, tiştêkî gelek baş û pîroz e.

Kurd neteweya herî kewn e li Rojhilatnavîn. 20-30 milyon serjîmara (nifûsa) wan heye. Ew ê di rojê nêzîk de di nav dewletên serbixwe de cihê xwe bigire. Ji ber ku rûpelekî nû li cihanê vebûye, ew jî aşî, wekhevî û sembola mafên mirovatîyê ye.


Divê genc û xortên me samanê folklor, edebiyat, huner û etnografîya xwe di muzexane û pirtûkan de biparêzin da cihan bizanibe ku nerxa samanê me pêşkêşî medeniyeta mirovatîyê ye. Ji ber ku meteloka kurdî dibêje: "Nerxê zêr, zêrker nasdike".

Sibat 1992, Uppsala

QAMÎŞLOKA BAVÊ FELEK

(Dîsa û tim ji bo B. Felek*)

Mervanê KELEŞ



Qamişlo :
Serçokvana cewşenbazyîkê
Yê ku derbasî rûtiya te nebûye
wê qirr bibe
Yê ku tilîyên xwe di ser memkên
Keçkanîya te re ne buhirandîye
ne mêr e
Yê ku xwe dirêj nekiryê
di qîçîna nîro de
li ser kevrên rexriyên te
nizane bîna bîriye
û
tekiyan...

(2)

Qamişlo :
Toza berfekê
Dibare weke rokek vemirandî !!!
Kurdên te mijekin
Bêbextî kir li wan çiyê
Lê deşta te himbêzkirina wan bû

Barana leylana te
Pûngek bejî
Qamîşin dişkên ji bo ahoyên ku
wan
xwarin kuliyên
pêxwas
û
xweynên tozgirtî
weşiyar

Kevokên te buxbux diki
mêja sibê
dixilmaşekê
ji hajênabûna
bengavan de
Kîjan hajênabûn derdewam dike ...?
hezar ... hezar sal ...!!!

(3)

Qamişlo :
Keçkên te qeflek binefş
û
malzarokek tî ne

Zavê te yê cela kirî
Nebûye dema vegera wî
Hîn qîvaran fermo nekiryê
jê re
û

Ne jî cexcexê* bejna te
govendê dike hîn

(4)

Qamişlo :
Firoşkarin gerok
û
Terazûnin sifir dikin çingîn
û
Şaş dikin buhayê xwe tim
Payebûna pirtiqalan ku nizanin
herikandina mayina

(5)

Qamişlo :

Bê bexteke

Bergor dike evîndarên xwe

bê bêdengî

Bavê Felek

Yê xwe windakir di nav

qermişokên te de

çawa esmanê te çawa ...

ne barand ...!

li wî

xwelî

û

zîv

û

te ne dayê bilî nalînek

û

ax

û

çend hewarên pîr û kal

(6)

Qamişlo :

Hevraziya qîzekê

Diyar nekiriye qîzaniya xwe

û

Ne jî şimamok û mewîjên xwe

Di bendemanajêbûyê

sedî°

yê tê

ji

gola wanê.

25-11-1990, Siwêd

*Xelkê Qamişlo binavê " Bavê Felek" bandikirin hunermendê dilovan MEHMED ŞEXO.

*Cexcex; çemeke di nava Qamişlo re derbasdibe.

*Sedî; piştî şokandina şorişê dêrsimê rejîma Turkiye sed zanevanên kurd ci-vandin li qiraxa gola wanê û her yekî xistin çewalkî û avetin gola wanê.

YILMAZ GUNAY

Koyo BERZ

Welatê ma di zaf edetî estê ki, ti nînan bê welatê ma cana di nêvînenê.

Nînan mîyan di jew jî noyo ki dimilîyan mîyan di zaf ravêreno.

Ê ki wêrê dişmenî yê wexto ki ci rê lajek (lacek) beno, lajek kerd qundax tebey a anê bêşîyda ci di derg kenê û şine tifingi yan jî dabança anê kişt a derg kenê.

Qandê ki, wexto ki o girdbo sîlah ra hesbikero û sîlah kar bîyaro.

Do ey ra bo, Yilmazî jî zaf sîlah ra hes kerdê

Kistê ra kes şeno vajo caêlamat sîlah kar ardê. Kiştê ra, jî kes şeno vajo sîlah heyecan dano merdimî û fiyaqeyê ci esto.

Tay-tay jî estê qandê coy, qandê çalimî girêdanê xo ver a, yan jî kenê xo mûndî, xo qayîştî ver a û winî geyrenê.

Ê Yilmazî jî tim dabança ci ci paştî ver o bî. Labrê ê Yilmazî ne qandê fiyaqî û ne jî çalim kerdeni bî. Ê Yilmazî ca êlametey ver û mecbûrî bî. Bişîya yê koti do dabança xo girêdayê xo ver û winî bişîyayê. Kes şeno vajo dabança jî parçeyê jîyanê (heyatê) ey bî û bê ê parçî nêbîyê.

Bê sîlah nêgeyrayê, qandê coy jî zaf meseley ameyê ci sere di û ci rê zaf kêberî (qapî) abiya-yayê. Yilmazî tersan ver xo di sîlah çarnayê. Ê Yilmazî tersê ci jew, jû kiştî ra nêbî, ê ey zaf kiştan ra bî.

Kiştê ra dewlet a Tirkan ra, bolis û eskerandê înan ra, kiştê ra însanandê xirab û bênamûsan ra, kiştê ra raqîbandê xo ra, kiştê ra gebadayiyan ra û kiştê ra jî dismenandê xo ra xo pawitê. Qandê coy, qandê nê sedemî sîlah çarnayê û sîlah jîyanê ci bî. Yilmazî nan wêrê dismenî bî, înan û dişmenandê ci ya pê ra zaf merdimî kiştî bî û bi seran a pîyê Yilmazî ded Hemîd koyan ser o mahkum bî.

Wexto ki dewda Sewregî Dêsmar ra keyê xo bar kenê Yenê Adina, Yilmaz pîzedê marda xo di beno.

Dişmenanê Yilmazî înan ra dedê Yilmazî kiştî bî, qandê heyf giroteni Piyê Yilmaz î Ded Hemîdî jî dişmenan dê xo ra zaf merdimî kiştî bî û dest nîyame bi. Qandê coy mecbûr manenê bar kenê, welatê xo ra remenê yenê Adina. Dewa ma û dewda Yilmazî ya pê ra zaf dûrî nîyê û bi seran a kalikê mi û pêrdê Yilmazî ya



Yilmaz Güney

pîya koyan ser o mahkumey kerda û nezdî ra ma pê sinasnenê û dostê pê yê.

Di serda 1946 an di dişmenê ci şopda ci ra yenê Adina, Pîyê Yilmazî dewda Yenîce di vînenê û qerşûn kenê. O wext Yilmaz new sere beno û çimandê ci ver o pîyê ci qerşûn beno û dîndeyêno êrd. Çend ca ra beno dirbetin. Bi ê dirbetan a ey hewadanê nêweşxanedê Adina yê qarşiyaka. Huma (Ella) nêkişo nêkişeno. Bi çabadê diktoran û yardimê dewij û axlerandê Yenîceya pîyê ci emeliyat beno û kardîyan ver a û qerşûnan ver a reyêno. O wext axlerandê Yenîce ra Huseyn axa vano qandê reyayenda Hemîd axay ez heme çîyê xo feda kena. Zey birardê xo ey ra hes kerdê.

Qandê coy jî Yilmaz zaf tersayê. Çimki qeçkîni di bi çimendê xo ya heme çî dibî.

Zey filimî heme çî çiman ver a ravêrd bî.

Welatê ma di, hele hele ma dimilîfyan mîyan di hergi deqîqe dişmeney û pê kîştîni est a û hewna jî ca ca di dom kena.

qandê coy jî merg însanandê ma ra zaf dûrî nîyo. Ê ki wihêrê dişmenîyê hergi deqîqe qerşûnan fek di di rê. Wexto ki rastê pê bîrê,

jewî ra rew do bimiro yan jî dirbetin bimano, yan jî wirna do ya bimirê yan jî dirbetinî bê. O ki maneno jî kîşt a hukmatî ra yeno tepîştîni û şino bi seran a tepîştixane di (zindan, hepis) tepîşte maneno, rakewno. Ya do tepîştixane di umrê xo pir kero, ya werembo bimiro, yan jî nîm merdim bivijî yo teber.

Ma sûcî, gunay nêşenê înan di bivînê?

Çimki wendexaneyê ma çinîyê, yan jî îmkanê ma yê wendeni çinîyê, yan jî îmkanê ma yê wendeni çinîyê ma şîrê biwanê û zane bê. Qandê coy heme cahîl manenê.

Dewa ma pancas (50) şeştî(60) keye bî, hendik ma zanê kes tey wende çinê bî, fina sifteyêni ez û birayandê xo ya ma şî wend. O jî pîyê ma ancax heta lîse şa ma bi do wendeni. Zey dewda ma hezaran a dewî winî bî. Dewda Yilmazînan di jî wendeyo sifteyên rehmetî Yilmaz bî. Wendeni û wendexaney dewandê ma di çinê bî, bes dişmeney û pê kîştîni estîbî. Qandê coy Yilmaz tersayê û xo di dabança çarnayê.

Yilmazî nêwaştê na dişmeney, no xinc, no kîn, na şopi, nê heyfî bidomno. Ey tim waştê

bîrê werey û na dişmeney werte ra werzo. Yilmazî hewl da xo, tay bo jî dişmeney a miyabeydê xo werzanê. Werîştenda Yilmazî ya pîya dişmeney a inan jî werte ra werîşti.

Yilmaz zaf biaqil, camêrd û zane bi.

Qandê coy şopda kiştenda dedandê xo ra û dirbetin kerdenda pêrdê xo ra nêşî. Qandê coy jî mesela cîya dişmeney pûç bî û awi di şî. Ê dirbetî amey giroteni û a gûnî (gonî) amê vinderdeni.

Yilmaz Guney (Yilmaz Butun) di serda 1937 an di dewda Yenîce, qeza Qarataşi wîlayetê Adina di ame dinya. (Marda xo ra bî). Pîyê Yilmazî ded Hemîdî dewda Yenîce di evdecîni (aşxanecîni) kerdê.

Yilmaz ame dinya tepey a Ded Hemîdî xo rê soz da ki, çiçi rê mal beno wa bibo do Yilmazî bido wendeni. Beden û destandê xo ya bigirweyo, nengûyandê xo ya komkero do ey bido wendeni, û winî jî kerd. Qandê ki meselan ê dişmeney nînan sere di tak vati bî û kulê girdî peyda kerdî bî û dirbetê xorî akerdî bî.

Wexto ki şîbî eskerey nêzanayê herfê biwano û enbazanê eskerey ci rê vatîbî «kiro ame, kiro şî» cîya delxa ravêrna bî û pa kusatê (henekê) xo kerdî bî û ci huway bî. Qandê coy vatê se beno wa bibo, çiçi rê mal beno wa bibo ez do Yilmazî bida wendeni.

Yilmaz wenden a xo ya sifteyêni û werteyêni bî rihatey û çimankewtanda mahlîmandê xo di û çalişqaneya qedîno.

Nê wirna wendenan di, hima hima kes şeno vajo beno jeweyîne sinifda xo.

Labrê jîyanê cîyê Lîse winî nêravêreno.

Lîse di, sinifta hîrîni di mahlîmandê xo di dano pê ro û kewno disîplîn. O wext newewewe meraqê sinema pêşîyabî ci ro.

Qandê ki bişo şîro sinema û seyrê (temaşeyê) filman bikero, yan jî peranê şîyayenda sinema qezenç bikero, afîşê sînemayandê Adina çarnayê. Qandê coy a seri çend dersandê xo ra sinifi di maneno. Qandê ki sinifo xo nêravêrneno, miyabeynê ey û ê pêrdê ey abiyêno.

O wext pîyê ci jî maya ci Gulê xanimi verdê bî, jûna cinî xo rê ardî bî.

Wexto ki Yilmazî lîse di wendê çimê ci tim artisteyo bi. Qandê coy jî filimê nêravêrnayê, şîyê dîyê, temaşê kerdê.

Sînemayandê Adina di girweyayê, filimê sinema berdê û ardê. Hewesê ci zaf estbî sînema û artistey ser o.

Şîrketandê filmandê Adina ra And filim, Kemal filim û Dar filim di girweyayê.

O wext kovarandê (dergîyandê) Adina ra, SALKIM di meqaley nûşnayê.

Di serda 1956 an di di kovara edebiyatî ya bi namedê des û hîrî (hêrês) (on üç) di, meqaleyê bi namedê hîrê sistemê nêzanayenda neheqey (üç bilinmiyenli eşitsizlik sistemleri) Wijiyêno, yeno vilakerdini, weşanayeni. (Yeno nûşnayeni)

No nûşte bela akeno Yilmazî rê. Derheqê nê nûştî di dawa abiyêna û na dawa di (2) seran vêşêrî ramena. Bahdê di seran tepey a qandê nê nûştî ci rê ser û nîm ceza yeno biryayeni. Yilmazî genê benê kenê hepis. Mahkema derheqê nê nûştî di nê qerarî dana û wina vana; «Yilmazî nê nûstedê xo di piropagandaya komînîstey kerda, qandê coy jî ser û nîm ceza werdo»

Ser û nîm tepey a hepis ra yeno viradayeni. Labrê ey rihat nêverdane, ey rişenê Konya sirgûney. Şeş (6) mengî Konya di sirgûn maneno. Wexto ki ci rê no ceza biryêno, o wext ey bi namedê Bela yo şîrinî ya (Tatli Bele) filimê viraştê, antê.

Sirgûney ra ame tepey a fina dest bi filim anteni keno. Labrê kes ci nêşinasneno û filimê ci sînemayandê Stanbol, İzmîr û anqerî di nînê kaykerdeni. Bahdê sirgûnî di serda 1963 an di bi namedê wirna jî cesûrî bî (İkside cesurdu) Samî Meriç, Semra Sar û Yaşar Tûnalî ya pîya filimê ancênê.

Senaryoyê nê filimî Yilmaz Güney û Atif Yilmazî ya pîya nûşnenê. Rayberdoxê (yönetmenê) ê filimî Ferîd Ceylan beno.

Bes name û imza Ferîd Ceylanî bena.

Heme çîyê ê filimî Yilmaz Guney virazeno û ray beno, ray fineno. Tay şehneyê ê filimî Adina di ancênê.

Filimê wirna jî cesûrî bî di Yilmaz rolêdo zaf

gird virazeno û erzeno werte.

Ê filimî ser a hebê yeno sinasnayeni.

Hetan ki Yilmaz Güney nêbi aktar, nêbi meşhûr û weş nîyame sinasnayeni nêva ez Sewregij a, yan jî keşî o Sewregij nêsinasna.

Ey mileti ji o Adinafî zana û sinasna.

Belkî jî o wext nîyameyê hesabdê ci vajo ez Sewregij a. Bahdo akêrde akêrde va ez Sewregija û filimandê xo di jî kar ard.

No filimê wirna jî cesûrî bî di serda 1963 an di sînemayêda Stanbolî di yeno kaykerdeni û kişt a zaf merdimandê sînema heskerdan ra yeno tepîştani.

Se ra se yê qeçkan no filim ra ci sinasnenê ci ra hes kenê û namey Yilmazî vijyêno. Tay artîst, rayvistey, îdarekerdox û zengînê sînema vanê: No çiçî yo, no bêtîp.

Ma qe nê merdimdê bêtîpî ra artîst beno. Beno, hem jî winî beno ki, zey rojî ya heme ca ra vila beno.

Ma do bivînê do senî bo. Do winî bibo ki qet tarîx û mêjîyan ra sîl nêbo, neviştyo û nîro vîrakerdeni.

Ci ra winî aktur vijiyêno, winî vijiyêno, nameyê ci, şanê ci sînoranê welatdê xo dirneno, akeno û kewno welatandê Awrûpa.

Winî beno ki, qe tarîx û mêjîyan ra sîl nêbeno û ravêreno pelikandê tarîxdê dinyay. Wa bivînê senî vijiyêno.

Yilmazî di azîm estbî, azîmê do zahf gird. Çiyê rê bivatê ez do ey bikera, bizaneyê do lete-lete bo û sereyê ci do şîro, fina o kerdê. Şewi hewndê xo di jî rojê verî, rojê ki do bîrê, rojê ki ma vernî di rê, ê rojan fikiriyayê û pirojeyê xo viraştê. Xo ra, cesaretê xo ra, aqil û zekadê xo ra zaf emîn bî. Zanayê do ser kewo û ravey şîro. Qandê coy engelê ki kewtî vernî, bendê ki vernî di roneyay, dêsê ki ci ver o dês bî, heme xilnay, pay kerdî û ser a ravêrd.

Bombay a sifteyêni di serda 1965 an di teqêna. O wext rojnamey qeçkan kerdê vila. Rojnamey şanî (Akşam Gazetesi) dûr û derg Yilmazî ser û filimandê Yilmazî ser nûşneno.

Ê meşterî Rojnamey Şefaqî (Sabah gazetesi) jî dûr û derg bahsê Yilmazî û ê filimandê ci keno. Him şan di, him Şefaqê rojnamey

qeçkan deşti û qeçekî kewnê çarşi, mahla û kuçandê Stanbolî û qîjenê> Nûşneno, nûşneno, rojnamey o Yilmaz Güney nûşneno û pê pey ra remenê, geyrenê û rojnamanê xo roşenê. O şan û o şefaq di wirna rojnamey rekor a rotenî şiknenê. Rojandê verênan ra di qat rojnamey yenê rotenî. Zengîn û fikirê Stanbolî, ê ki aşnawenê remenê şinê rojname herînenê. Heften a bahdê rojnaman, no fin kovara Vengî (Ses mecmuasi) çihar pelikî (rûpelî) ca dana Yilmaz Güney û bi teferûatê do dûr û derg, Yilmazî û aktoreyda Yilmazî ser nûşnena. Bombaya girdi teqêna û Yilmaz sînişda jûyemîndê akturan. Ê ki vati bî ma nê sûret û nê dewijî ra aktur beno, ê heme winênê xo ver û lewanê xo gaz kenê.

Molekulê bomba heme cadê Tirkîye û Kurdistanî ra vila benê.

A seri (1965) 21 filim a rekor şikneno.

Qandê misnayış (nîşandayeni) û kaykerdişdê filimandê Yilmazî, sînemayê Rojaway, Rojakewtî û ê werteyê Tirkîyê û Kurdistanî kewnê sire.

Veng yeno Rojawara, rojakewtera, Anadolî. O veng vengê mileto, vengê sempatizanê heskerdandê sînema û ê Yilmazî yo. heme ca di, heme koşe di, heme sûk û û cayan di, Yilmaz Güney vijiyêno.

Filimêdê ci şîno jew yeno. Bi heftana sînemay filimanê Yilmazî misnenê, danê kaykerdeni. Roj hîrê makîney danê kaykerdeni. û hergi fini jî ca nêvîneyêno, ca nêmaneno. Heta fek sînemay benê pîrî. Bilêtê filimandê Yilmazî Borsada sîya di roşenê. Eger bilêta şiyayenda sînema jî pankinotê, (qaxidê) bî se, ê filimandê Yilmazî borsaya sîya di hîrê / çihar pankinotî ya ameyê rotenî, roşiyayê. û mîleti sînemayan di ca nêdîyê.

Bombaya didini di serda 1966 an di teqêna.

No fin Riha di bi namedê qanûn a sînoran a (Hudutlarin Kanunu) filimê ancîyêno û no filim rekor şikneno.

Yilmaz Güney di serda 1962 an di Can Unal a jewjiyîno û ay ra keynekê da ci bena û nameyê ci Elif i nanê pa.

Di ser da 1964 an di senaryoyê Kamalî

Zeybekî nûşneno û no filim di Nebahat Çehreya pîya ser rol di kay keno.

Nebahat Çehre jî o wext sinasneno û cîya en-bazey keno, ronano, virazeno.

Di serda 1962 an di hepis di bi, qandê coy jî a seri, qe filimê nêviraşt bî û filimê cîyê serda 1962 an çinîyê.

Senaryoyê Yilmazî yo sifteyên, senaryoyê filimê Ala Geyikîyo. O senaryo di serda 1958 an di Halit Refik'î ya pîya nûşnayo.

Senaryoyê Qeçekê nê welatî (Bu Vatanın Çocukları) di jî xeylê emegê ci ravêro û yarmetey a ê senaryoy kerda.

Filimê cîyo sifteyên o serrol filimê Ala Geyikî yo.

Verê coy Orhan Günşiray a pîya filimê Qeçekê nê welatî di kay keno.

Di serda 1967 an di (30/1/1967) Nebahat Çehre ya zewjîyêno. Veyveyê ci Hilton di beno.

Di serda 1966 an di qandê roportajî şino birodê rojnamedê miliyetî. Tarık Dursunî do cîya roportaj bikerdê. Qisandê roportajî miyan di, Yilmaz vano: «Ez Krala, kiralê Sînemaya» Tarık Dursun vano : Yilmaz ê mi, ma winî beno, sînema di jew Kral esto, o jî Ayhan Işık o ? Hem jî zey şekerdê qelîya xasek o, xasekê camêrdano.

Yilmaz bi hêrs û sinîra hol beno xo ser, werzeno pay û vano: Ez o vana ez Krala, Kralê Sînemaya. Eger Ayhan Işık kralo, xaseko, ez jî Kralo Çirkin a. Ez Krala, Çirkin Kral.

Ey ser a rojnamedê Milliyetî di Çirkin Kral yeno nûşnayenî û nameyê ci çirkin kralê sînema neyêno pa.

Di serda 1968 an di, mengda Gulanî di Yilmaz'î tepşenê, gêne benê eskerey. Heta o wext qaçaxê eskerey bi.

FATOŞ Û YILMAZ GUNEY

Fatoş= Kilm kerden a namedê Fatma ya.

Fatoş ; Fatma Süleymangil.

Yilmaz Güney û Fatoş a pê senî sinasna. Yilmaz hewna nêşîbî eskerey, bi namedê Azrafil Benim î ya di serda 1968 an di filimê antê. Cîniya Yunetmen Savaş Esici, Arden Eşici û Fatoş a pîya yenê setê ê filimî ziyaret kenê. O

wext Fatoşî 17 serê bena. Fatoşî o wext heyranê Yilmaz û filimandê ci bî. Mîyabeyndê nînan di heskerdenê da zaf xorî virazêna û zerfya înan kewna pê.

Nê wazenê pê ya bijewjîyê. O wext Yilmaz nebahat Çehre ra abirya bî. Labrê may û piyê Fatoşî razî nêbeno ki, nê pê ya bijewjî yê û hemberê nê jewjinayiştî vijyayê. Miletî senî kerdê nêşayê înan razî kero ki, izin bidê, Fatoşî Yilmazî ya bijewjî yo.

Înan nêwaştê keynera xo bidê Yilmazî, çimki jîyanê Yilmazî macerayan a pir bî.

Rojê tebir di, rojê linga ci hepis di bî. Qandê coy malbata Fatoşî nêwaştê. Malbata Fatoşî xeylê Zengînî bî û waştê ki keynara xo bidê jêwdê zey xo zengînî.

Yilmaz eskerey ra ageyreno tepey a, ey û Fatoş a pîya kenê û qerarê xo yê jewjinayiştî danê. Roja xo ya jewjinayiştî rojnameyan di îlan kenê. Miletî hend winêna rojnameyan di nûşneyoyo û dawetîya ci ameya çap kerdeni. Çîyo ki miletî pa mat manena, ne nameyê malbatê Yilmazî û ne jî ê malbatê Fatoşî dawetîye bin di ameyo nûşneyano.

Dawetîye di tenîya nûştô 27/6/1970 an di roja seme seat 16.00 di Lalezar di veyveyê ma esto. Heme dost û enbazî dawetê nê veyvîyê; Bin di jî Yilmaz Güney û Fatma Süleymangil ameyo nûşnayen.

Jewbî dawetîye bin di çîna nîyame bî nûşneyayo. Ne may û ne jî piyê Fatoşî yeno veyve. Tenîya maya Yilmazî em Gulê veyve di hazir bena. May û piyê Fatoşî ne veyve û ne jî nîkahdê înan di hazir benê.

19 mêngda sibatî ya 1972 an di, sûcdê sîyasî ra yeno tepîştênî.

Qandê ki vanê: Mahîr Çayanîyan rê yarmetey kerda û ca dawo înan, ey tepşenê.

Qandê coy deyêno sikiyûnetimî. Vanê 12/3/1971 an di milîtanê şoreşgerî Mahîr Çayan, Huseyîn Cewahir û Oktay Etîmanî ya çatîdê keydê xo di nimîtî bî.

Qaydê coy yenê ey tepşenê benê. Wexto ki tepîştanê Selimî ye di tepîşte beno, rakewno, kiştê ra senaryoy nûşneno, Kiştê ra jî xelatî gêno.

Romanê ci yê Mil Çewtî (Boynu Bükük öldüler) xelat a Romandê Orhan Kemal î gêno.

Di serda 1972 an di, kişt a kovara sanatiya ê Mîliyêti ra sanatkare seri yeno weçinayiş. Eynî seri filimê Bavo, Keko(Baba) filim şenlixiyê Adina di kKozaya Altûnêni (zêrêni) gêno. Di serda 1974 ê menga Gulanî (20/5/1974) di hepis ra viradeyêno. Di serda 1974 î di Qanûn a êfi vîjyêna. A qanûni ra îstifade keno û yeno viradayeni. O wext bi namedê Yilmazî ya lacêdê ci estbî. Nameyê xo dabî lajdê xo jî. Wexto ki hepis ra viradeyêno lacê ci di sere beno.

Roja ki viradeyêno, şandê a roji di civînê do basiniyo gird virazeno û ê meşterî qiseyê ci dûr û derg rojnameyan di yenê nûşnayeni.

Hepis ra viradey a tepey a fina dest bi anteni û viraştenda filiman keno. Labrê no fin ne zey verî filimî virazeno. No fin diha filimê bi qalîtey, gelirî û giranî virazeno.

A seri di di(2) filimî virazeno. Filimo sifeyên Enbazo (Arkadaş) o bin jî Endîşe yo. Nê wirna filimî jî rekorê a seri şiknenê. Senaryoyê Filimê Endîşî jî bi xo nûşneno. Çiçî beno, çiçî yeno ci sere di, wextê antenda filimê Endîşî di beno û yeno ci sere di.

Hewna filim nîyanciya bî bela yeno, Yilmazî vînenno. A seri bena serê da bêşansi, qandê Yilmazî.

14/9/1974 an di xeber a bêxeyri radiyo, televîzyon û rojnameyan ra yena aşnawiteni. Vanê: Yilmazî Guney hakîmê qeza Yumurtalik î Sefa Mutlu bi dabançaya kişt o. Sefa Mutlu M.H.P li bi. Yumurtalik di jî kampê da M.H.P li yan a girdi estbî.

Ceyhan di jî çepî biquwet bî. Verî Ceyhan jî înan desti bî. Labrê şoreşgeran destandê înan bin ra veti bî. Qandê coy mesela kiştên da Sefa Mutlu y xeylê tarî û tê mîyan a. O wext şoreşgeran jî newe-newe dest esti bî Yumurtalikî û waştê ki Yumurtalik î destandê înan bin ra vejê. Hereket ê çepî yê Maocî zahfî bî.

Şoreşgeran Yumurtalik di newe newe xo rê ca viraştî bî û kewtî bî wica. Sefa Mutlu jî merdimê Turkeşî yo zaf muhîm bî. Ey quwet û paştî dayê înan.

Sefa Mutlu mileti mîyan di, însanan ser o qebedayîni jî kerdê û vatê: Ez kralê Yumurtalikî ya û mi ser a merdimna çinîyo û zilim û tahda kerdê merdimandê çepan, û feqiran.

Qandê coy ê lejî di, o munaqaşa yo ki mîyabeyndê Yilmazî û Hakîmî di ravêrdo, o munaqaşe di Sefa Mutlu kişt a kê ra ame kiştêni tarîyo. Kes nêzano Yilmazî Sefa Mutlu kişt yan jî taynan.

Sefa Mutlu kişt qebedayiyandê Yumurtalikî ra, ê soreşgeran ra, ê mileta Yumurtalikî ra yan jî ê Yilmazî ra ame kiştêni, kes nêzano û tarîyo.

Wêrê otêl, Gazino, Qahwexanan û ê aşxanan jî ey ra hes nêkerdê û gefî werdê ey di. O wext ez Adina di karê Awdan' da dewleti di Teknîker bîya û sekreterê sendîqada awî û elektirî (Yenî Ges İş) bî ya. Qandê coy ma sîyê Ceyhan û Yumurtalik. Wexto ki Yilmazî amebî Yumurtalik û filimê Endîşî antê, xebera ma bî û ma waştê ki şirê ey bivînê. Labrê qismet nêbî.

Çendna rojî ma asnawitî ki Yilmazî tepişto. Ez rehmetî Yilmazî Adina ra sinasnena serda 1969 an ra heta serda 1983 î ez Adina di teknisyen bîya. min û ey a ma çend finî jî Adina di pê dî. Wexto ki Fatoş a pîya ame Oymakli ez qahwedê oymakli di ronîşte bîya. Qandê coy mi zaf waştê ez şira ci bivîna. Wexto ki Yilmazî vejenê mahkema, dezayê ci Ebdûllah Putun vano: Hakîm Sefa Mutlu mi kişt o û xo erzeno werte. Lakîm beyanê Ebdûllah Putun î nîno qebûl kerdeni. Rapora jewbîyayeni di vanê: Mermiyê ki erzîyayê, ne dabançada Yilmazî rê, ne jî ê Ebdullah rê benê. Ê mermî ê dabançana nêcrziyayê, jîna dabança ra erzîyayê.

No babet a rapori mesela nînan ra fêna dûrî û bena hetnaya. Labrê rapora Adlî Tipî di winî nîno nûşnayeni. Rapora Adlî Tipî di vanê: Nê mermiyê ki erzîyayê dabança Ebdullay rê benê. Netîceyê nê wirna raporani pê nêtepşeno. Welhasil Yilmazî nêviradanê û gêne benê erzenê hepis.

Wextê do dûr û derg mahkemeyê Yilmazî dom kenê. Qandê a mesela heyetî ronayênê, resimê ca dê hedîsî ancênê, fina sifeyên a Tirkîye di sistemê do newe romanê û o sistem a

mahkeme kenê. Hetê kotiya erzenê nêşenê mesela Yilmazî ra Dûrî finê. Qandê ki hukmat jî paştîda Sefa Mutluy di heno. Wazenê ki Yilmazî na meselay a hepis di verdê û bidê çirniş kerdeni û tarîx ra sîl kerê. Labrê zey înan nêbeno. Yilmaz finê mileti mîyan di, qelbdê mileti di cayê xo gênê û hetan jî nêvijêno. Wexto ki hepis di beno, senaryoyê Boli (Sürü) û ê Dişmenî (Düşman) gêno panûşî (qelem) û nûşneno. Fina o wext, hepis di senaryoyê Ray (Yol) nûşneno.

Di serda 1981 an di dest bi antenda filimî ancênê. Bahdo hepis ra Yilmaz Guney ra emrê, tafimatê yeno û antena filimdê Ray yena vinderdeni. Bahdê vinderden da filimi Yilmaz senaryoyê ray di tay virmayîşê muhîmî virazeno. Texmîndê mi Yilmaz o wext wazeno filimê ray bikero filimê Kurdan û winî banco. Qandê coy dano vinderdenin û tay cayanê ci vimeno.

Sifte antena filimdê ray dano Erden Kralî. Bahdo ey a pîya nêkenê. No fin antena filimdê Ray dano Şerîf Gören î. Antena filimdê ray zeredê hepsî ra dano îdare kerdeni. Zeredê hepsî ra îdare kerdena Yilmazî ya filimê ray ancêno, beno tamam. O wext jî Yilmaz hepsê ra sirgûnê hepisna biyê. En bahdo hepisdê Îmralî ra sirgûnê Îsparta beno. Qandê roşandê Qurbanî Yilmaz îdaredê hepsî ra şeş rojî îzin gêno ki, şiro geçkanê xo û Mûş di maya xo zîyaret kero. 9-10-1981 di hepis ra vijêno îzin û diha pey di nûyageyreno hepis. Xo ra verî ra heme çî plan bibî û antena Filimê ray jî qediyê bî. Filimê ray jî gêno û remeno teberdê Tirkîyê, welatê Swîsre (Îsviçre).

Yilmazî verê coy cinî ya xo Fatoşî û lajê xo Yilmaz o werdêk rişt bî Îsviçre. Cezayê Yilmazî do serda 1984 dê mengda payizo peyên (menga 11) di biqedîyayê. Hukumatê Tirkan nêzana Yilmaz senî û kamcî ray ra remayo, yan jî vijyayo teber. Rayvistan, partî yan jî şexsan ci rê yarmetî kerda, heta ewro zelal nêbiyo û tarî mendo. Rema tepey a bahdê çendna mangan Îsviçre di aseno. Îsviçre ra xeber a ci vila bena. Bahdê coy bombaya herî girdi Fransa di teqena. Qandê ki, wexto ki rema bî teberdê welatî filimê xo yê Ray û çendna filimê xo xo

di remnay bî, ardî bî.

Di serda 1982 an di Filim şenlixîyê Cannesî di filimê Ray xelati gêno. Îşte bomba o wext teqena û molekulanê xo heme cadê dinyay ra vila kena. Filimê Ray bi hefteyan a sînemayan û televîzyonandê dinyay di yeno kaykerdeni. Îlgîyê basindê xerîbî anceno xo ser û derheqê filimî di û derhqê Yilmazî di zaf çî yeno nûşnayani.

Ez nêwazena dûr û derg qalê filimdê Ray bikera. Qandê ki zaf çî filimî ser ame nûşnayani û vila bî. Yilmaz Guney di serda 1984 an di, 9 mengda îlonî di, nezdî şefaqlî, qanserdê pîzî ra Parîs di mireno, şino heqeyda xo ser. Nay rind bizanê, bes beden û rihê ci mireno. Yilmaz bi xo nêmerdo û nêmireno jî. O hergi wext û hergi deqîqe vîrdê ma di û ma mîyan di ro.

Tirkîye û Kurdistan di, hewt serî ra tepşî heta hewtay û hewt serî Yilmazî sinasneno, ey ra hes kenê û ey xo vîr a nêkeno. Yilmaz tenîya ê keydê xo, malbat a xo, geç û quldê xo, dost û enbazandê xo nêbî.

Yilmaz ê milyonan, ê hewtay-heştay milyonî bî. Hukmatê Turkan waşt ki Yilmazî di serda 1974 an di hepiskerdena bikişê. Hetan kes şeno vajo înan Yilmaz Guney di serda 1974 an di kişt. Labrê Yilmaz nêmerd, destandê înan a, destandê înan bin di nêmerd.

Xo ver da weş xo ver da û tekoşîne xo domna. Teslîm nêbi û nêbiyê jî.

Jîyanê Yilmazî bi qêrîniya ravêrd. Lê na qîrîni qêrîniya teslîmey û acizey nêbî.

Yilmaz qandê ki, vengê xo biresno dinyay hemî. Jîyanê ci bi qîrîniya ravêreno.

FİLİMÊ KI YILMAZ GUNEY VIRAŞTÊ, ANTÊ Û TEY KAYKERDO.

<u>Ser a viraşteni</u>	<u>Namey Fîliman</u>
1958	1-Bu Vatanin Çocukları
1959	2-Ala Geyik
"	3-Karacaoğlanın Kara Sevdası

"	4-Tütün Zamanı	"	47-İnce Cumali
1961	5-Yaban Gülü	"	48-Kurbanlık Katil
"	6-Dolandırıcılar Şahı	"	49-Kozanoğlu
"	7-Tatlı Bela	"	50-Balathlı Arif
1963	8-Ölüme Yalnız Gidilir	1968	51-Seyyid Han
"	9-İkiside Cesurdu	"	52-Aslan Bey
1964	10-Hergün Ölmektense	"	53-Öldürmek Hakkımdır
"	11-Kamalı Zeybek	"	54-Azrail Benim
"	12-Koçero	1968-1969	55-Bir Çirkin Adam
"	13-Halimeden Mektup BVar	1969	56-Güney Ölüm Saçıyor
"	14-Karacaoğlan	1970	57-Asılacak Adam
"	15-Kara Şahin	"	58-Umut
"	16-Mor DEfter	"	59-Piyade Osman
"	17-10 Korkusuz Adam	"	60-Yedi Belalılar
"	18-Parangasız Mahkumlar	"	61-İmzam Kanla Yazılır
"	19-Zumba Gibi Delikanlı	"	62-Sevgili Muhafızım
1965	20-Kasımpaşalı	"	63-Şeytan Kayaları
"	21-Kasımpaşalı Recep	"	64-Çifte Yürekli
"	22-Konyakçı	"	65-Kanımın Son
"	23-Krallar Kralı	"	Damlasına Kadar
"	24-Ben Öldükçe Yaşarım	"	66-Onu Allah Affetsin
"	25-Beyaz Atlı Adam	"	67-Kızgın Adam
"	26-Dağların Oğlu	"	68-Zeyno
"	27-Davudo	1971	70-Vurguncular
"	28-Gönül Kuşu	"	71-İbret
"	29-Sayılı Kabadayılar	"	72-Yarın Son Gündür
"	30-Kan Gövdeyi Götürdü	"	73-Umutsuzlar
"	31-Kahreden Kurşun	"	74-Acı
"	32-Haracıma Dokunma	"	75-Ağt
"	33-Kanlı Buğday	"	76-Baba
"	34-Korkusuzlar	<u>Ser a virasteni</u>	<u>Namey Filman</u>
"	35-Silaha Yeminliyim	1971	77-Çirkin Ve Cesur
"	36-Sokakta Kan Vardı	"	78-Namus Ve Silah
<u>Ser a virasteni</u>	<u>Namey Filman</u>	"	79-Zavallılar
1965	37-Tehlikeli Adam	1972	80-Sahte Yar
"	38-Torpedo Yılmaz	1974	81-Arkadaş
"	39-Üçünüzüde Mihlarım	"	82-Endişe
"	40-Yaralı Kartal	1975	83-İzin
1966-1967	41-Hudutların Kanunu	"	84-Bir Gün Mutlaka
"	42-Zalimler	1978	85-Sürü
"	43-Kızılırmak Karakoyun	1979	86-Düşman
"	44-Çirkin Kral (1966)	1982	87-Yol
"	45-Çirkin Kralın	1983	88-Duvar
"	Dönüşü (1966)	Serê ci ninê mi virî	
"	46-Benim Adım Kerimo		89-Hamido

- " 90-Allah Afeder
Ben Affetmem
- " 91-Hekimo
- " 92-Aç Kurtlar
- " 93-Yiğit Yaralı Olur
- " 94-Kargacı Halil
- " 95-Kızım İçin
- " 96-Canlı Hedef
- " 97-Yedi Dağın Aslanı
- " 98-At Avrat Silah
- " 99-Eşrefpaşalı
- " 100-Eşrefpaşalı Kudret
- " 101-Sahtekar
- " 102-Azrailin
Ben Olacağım
- 1967-1968 103-At Hırsız Banuş
- " 104-Kuduz Recep
- Serê ci nînê mi vîrî
- " 105-Eşkiya Celladı
- " 106-Belanın Yedi Türüstü
- " 107-Son Pişmanlık
Fayda Etmez

Zewbî bê Nînan Filimê ci estê bê jî nînê mi
vîrî û cana di jî ez rastê ci nîyameya.
Texmîndê mi ra do 110 ser a filimê ci
bibîyayê. Labrê ê binî nînê mi vîrê. Ewro
îmkanê mi jî Çiniyo ez kovaranê xo yê welatî
têvda û tey bivîna.

Ji bo Yilmaz Guney
Çûçikek bû xortanî,
Nikaribûm bigrim, revandim.
Qumaşek bû kaltî,
Gerandim,
Min nikari bûm bifroşim
Hadê de were te ra bixortayî
Hinek wext, rûyê avê zaf zelale.
Wekî bîyî sirûçtê nîşan dide.
Wexta ku kevîrek davêjî, bibîne
Pêl dide av.
Tevî sirûçtê pêl dide, şiloq dibe.
Di wê wextê efsane, jîyan dest pê dike.
Bavê çîrokvan qisan dike.
Nizanim çi dibêje, çi rûnkirdin dike?

Yilmaz Guney, bo ku dengê xwe bigihîne
dinê hemû. Jîyan a wî bi qêrînî ve derbas dibe.

Sirûçt = Tebîet

Şiloq dibe = Ser û bin, tev û li hev dibe.

Rûnkirdin = Îzah

Bixortayî = beleş, bê per

J.P.SARTE Û EST- BÎYAYENI (EXÎSTENSÎALÎZIM)

Faruk YAKÛP

J.P.Sartre, ser 1908 di, Franse di ameyo dinya. Sartre hîrê serî biyo, pî yê ci merd o. Dima pî yê ci, mêrde kerd o. Pîlixê Sartre, Sartre key xu di nêwašo. O çax xalê ci, êy gîno xu het. Xalê Sartre profesôrê ziwani Almanî bî yo. Xalê ci qerar dano û Sartre riseno niwistani (Qoleji). Qolejê Sartre, niwistanê heri westir û Paris di biyo. Niwistanê ci zeydê Oxfordê İnglistani û qandê qeçekê birokrat a biyo. Sartre diploma yê xu, derece yê jewin giroto. Ger merdim biwazo jîyanê Sartre bizano, merdim seno pirtûkê ci yê "Words" (Herfi) bûwano.

Pirtûkê ci "La Nausée" (Qicix) 1938 di, Paris ti Éditinos Gallimard di ameyo çapkerdeni. Pirtûkê ci yê gird û êy kerdo gird û filozofê Est-bîyayeni (Exsistensîalizim) "L' être et le Néant 1943" (Esbîyayeni û estnêbîyayeni)o. 1964 di xeletê Nobel danê ci. Labirê o nêşino Swêd û xeletê Nobel nêgîno. Qestê ci yê nêgiroteni xeletê Nobeli o bi xu wûni vano; "Xeletê Nobel zeydê kaykerden a qeçek a no û no xelet, niwiskarî pêra abirreno. Yanîm, niwiskarî rindî û niwiskarî nêrind. "Fikrê ci nobîyo" Heme niwiskarî tenya ser çî yê nêniwisnenê û merdim nêşeno heme niwiskarî

û niwiskarey biyaro jew heti (cixizi) ser." Verê Sartre hînsano politîk nêbîyo. Lejê dinya yê didi (2) di ci rişenê lejkerê (eskerey) û lejkerê di beno metrolog. Rojê, lejkerê Hitler atax kenê û Sartre kewno destê lejkerê Hitler û ci rişenê kampê hesîrey. Kampê hesîrey di întrese (İlgî) yê ci û xebatê ci yê politîkî, wûca di dest pê keno. Dima kamp ra zivirêno û yeno Firanse beno endamê P.K.F (Partî yê Koministê Firanse.) Partî di Sartre bol aktîv biyo û bol zî niwisnayo. O wext a na pirtûkê xu' yê "Estbîyayeni û Marxîzim" niwisnayo. Sartre, bi xu komunîst û îdolojî yê Marxîzim parez ya yê. Dima Sartre, partî ra yeno eşteni (ci îhraç kenê). Sebebê eştenê ci, vanê Sartre "radîqal" biyo. Yanîm, enbazrayê ci, qandê Sartre wûnî vatê. Enbazrayê ci bawer kenê ki, fikrê Sartre ameyo virnayiş. Raştî, o fikrê xu ra qe tavîz nêdayo û her wext zî vato "ez îdolojî yê Marxîzim parêzêna" niwisê êy û her çendi "estbîyayen o zî" o her halû kar di filozofî ya yê Marxîzim ardo kar. Tenya, giraney a ci ser piskolojî (îlmê nefsi), sosyolojî (ilme gel), moral (mantiq), filozofya (felsefe) û ser o pirtûkê xu niwisnayo û ekolê newe akerdo. La



Jean-Paul Sartre 1965 Foto: LΣfi Çezkaek

merdim seno vaco ki ekolê "ESTBÎYAYENI - EXÎSTENSÎALÎZIM" akerdo.

Enbaz a Sartre, Simone de Beauvoir bîyo. Simone û Sartre niwistanî (Qolej) pîya wendo û pîya zî qedandê. Jîyane Sartre di Simone rolê bol gird kaykeno û bol zî yarmeteya Sartre keno. Merdim seno vaco "qirîtkê" pirtûkê ci Simone kerde. Simone bi xu zî filozof bîyo û Awrûpa di cinya, pirtûkê ci zey încîl û quren

wendê. Simone de Beauvoir qande mafê cinyan "femînîzim" bol niwisnayo û rolê bol gird giroto ser qolincê xu.

Simone jîyan a xu di sexî hînsanê no "bîsexuel" bîyo, hem merdekan ra hem zî cinya ra hezkerdo. O jîyanê di sexî zî azad bîyo.

ESTBÎYAYENI: Sartre vano, hînsanî mîyanê jew kaos ti jîyêno. Hînsanî tenya çîyên zanê. O zî merdenê hînsan a yo. La se bo se nê bo, wextê hînsan çi wext bîro, o çax hînsan mireno û tenya o rašto û merdim zano ki, her çîçî bi bo jew roj merdim mireno. Sartre vano qe çî yê xelet û rast nîyo. Merdim nêseno vaco, no çî rašto û no çî rašt nîyo. Beno ki çî yê, qandê mi rašto û qandê jewnê rašt nîyo.

Wûta di Sartre, jew nimûne (qanit) dano, qandê îdolojî yê xu "Bîfikire, jew gemî esto. "Gemî qandê Sartre, jîyan o û tiya di Sartre vano, senîn ez şena rota yê gemî rašt kera. Kompasi çîniyo, harîta çînyo û ma tenya yê û ramanê ma zî, zelal nêbîyo û heme çî, rew yeno virnayîşî û wûcadi, ser awi di ma mejbûrî yê kaptanê gemî bê û ma mejbûrî yê rota bide gemî yê xu. Wûca di merdim nêşeno gemî verado û biremo. Mesûlîyêrê (berpîşîyarî ya) merdim esto û o mesûlîyêti (berpîşîyarî ya) merdim didi qat o. No yeno no mehne, o çî yê

ki ez kena, mesûle ci zî ez a. Ez wazena ney nîsanê hînsan a bida ki, hînsanî zî wûnî bikerê. *Nimûne!* Ez jew merdim kişena û no yeno no mehne ki, o çî yê ki ez kena, raşto û ez êy çî nîşanê hînsnadana. Zey ez îzare vana "şîma zî wûnî bikerê".

Hînsanî jîyane xu di tenya yê. No yeno no mehne, heme hînsanî ger e bi xu biryar (qerar) bigîrê. (Îna, çî wazenê û çî newazenê). No zî xu di poşmaney ano û no poşmaney a ma mejbûrî yê bijî yê.

O ki, xu gemî bin di waşereno, çî wext gemî yê înan rota û ray virmeno, o çax ûna zî şîne û xu kenê zeydê "çî" jîyanê hînsanî di. Sartre vano hînsan ki heme çîrê "beno, zeydê şîma yo". Vano û kar nêkeno (xebat), o Hînsan tenya pîslîxey o, bare gel o. Sartre pirtûkê pîsey "Qicix" (La Nausée) qandê êy niwisna yo. Sartre vano "Ma tenya yê o çî ma kenê, ma mesûliyet gînê û kenê û ma nêşenê xu bi-xapeyno.

KAREKTERI HÎNSANI :

1- Îhtîyace yê bîyolojîk (rakewteni, şamî, nan werdenî û sex.)

2- Azadî ya hînsanî.

a) Ma tameşe yê xu kenê û ma, mîyanê jîyan di rê.

b) Analojî (ramanê, verî pîya ardenî), wûta di Sartre wûnî vano "mehne yê ez, zeydê çî, mîyanê estbîyayeni di nîno qabûl kerdênî, zeydê hînsanî. Merdim nêşeno çî (meteryal) bîyaro vernî yê pê.

c) Wûta di Sartre diji Freud qîsey keno. Wûta di Sartre wûnî vano "Eger ma mejî yê xu di çî

binimnê, no yeno no mehne, ma bi xu biryar giroto û o çî o ameyo nimneyeni" Freud vano "Ma qûrbani yê, ma ma nêşenê bi xu biryar bigîrê."

d) Azadî = jîyan a verney (qandê meştî, rojê ki yeno) = îmkanî. Jîyan a verney zeydê îmkanê hînsanî yo.

Sartre vano "Merdîm bi xu biwaştaney û ramanê xu di hepis (girotê) o." û ma nêşenê şîrê ramanê (fîkrê) jewna...

Ma şenê ram bikerê, ser ramanê înan. Ma şenê taxmîn bikerê ser ramanê înan. Ma nêşenê weş bizanê înan çî ram kenê. Çî wext merdîm nezdî yê jewê no û pîya zî rakewno û hez keno. Vîna zî merdîm weş nêzano o hînsan çî fikirê no, çî raman keno. Qandê to û ma şene vacê qandê ma.

JÎYANO, BÊXELET : Jîyano weş, jîyano bêzûrî. Zûrî qandê jewna, bi xu xapnayen û qandê xu zûrî kerdeno. Ger e hînsan raşt bo û bêzûrî bo. Zûrî qelîte yê merdîm nizim keno û çîmê enbazan di û dostan di merdîm kewno. Merdîm beno bêqalîte. Heme çî ra muhîmtîr ger e merdîm xu nêxapeyno û zûrî qandê xu nêkero.

Hînsan xu peyda keno. Hînsan xu senîn peyda keno? Hînsan xu, bi xupeyda keno. Çî wext zûrî yê ma, bin awî di marê ray nîşan bido, no yeno no mehne ma zey hînsanî, ma nêameyê mertebe yê hînsanî. Ma o çax, hînsaney veredanê jewna qedema. Ma hînsanî kenê zeydê "çî". Hînsanî benê zeydê "çî", o çax, ma sekerê; qandê wûnî nê bo? Ger e ma bi xu biryar bigîrê o çî ma kenê û wazenê bikerê.

KARÎN BOYE

Vergemayîşî: Faruk YAKÛP

Karîn BOYE 1990 di UPPSALA di ameyo dinyaya û Uppsala di uniwersîte qedando. Famîlye (aîle) ci bûrjûwa yê gird bî. Karin bi xwe çepê radikal bîyo. Karin, qandê çepê radikalê Swedî û qandê rojname û kowarê înan zî bol niwisnayo û bol zî aktif bîyo. Karin, heta bî 18 seri, bi dîyaneti problemê ci est bîyo. Yanî nêzana bîyo bikewo kamcîn dîni. Verê Karin bî Bûdî, dima bî hîrîstûyan, çi wext 20 serî bî temami dîyanet vereda. Jiyanê Karin, her wext tez û antî-tez bîyo. Yanî her wext mabênê didi waştên bî. Nêy, çi çax merdim hondirawa (şîr) yê ci wanêno, wûca di merdim nêy daha weştir vînenno. Kirîzê ci her gird no bî, "bî xu cinya yo, yan zî merdek o" no êy wûnî ke ki, jîyanê ci êy rê heram bî. Karin BOYE, bi xu "bîsexuel" bî yo. Yanîm hem merdekan ra, hem zî cinya ra hez kerda. Zaten merdim wazeno jîyanê ci bizano, o wext merdim şeno pirtûkê ci yê "Kriz" bûwano. Wûca di Karin jîyan û kirîzê jîyan niwisneno. No pirtûkê ci 1934 di ame yo çapkerdeni.

Karin BOYE, îlhame ci filozofê Almanî Nietzsche bî (Nietzsche pirtûkê xu "Wûnî va Zardeşt" êy a bî meşûr) û hozanwanê Swedî Edith SÖDERGRAN no.

Pirtûkê Karin Boye nîna yê. Yanî pirtûkê ci yê hondirawa (şîr).

- 1-Mijê ezmani 1922 (Moln)
- 2-Welato nimnaye 1924 (Gömda land)
- 3-Adir 1927 (Härdarna)
- 4-Qandê dari 1935 (För trädes skull)



Karîn BOYE didi kowarê edebî û kulturî zî zey redaktör (redaksiyon di) kar kerdo. Name yê no kowarê edebî û kulturî nîna bî.

1- Clarté (Kowarê edebî û sîyasî bî.)

2- Spektrum 1931-1933 (Rengê optîk). No rojname, yanî kowar, kowarê bol gird bîyo û no kowar di hozanwanê gird Gunnar EKELOF, Harry MARTINSON û Eyvind YOHNSON zî redaksiyon di bîyo. Nîna pîya rayê newe nîşanê Swedî day. Yanî rayê newe akerd û modernîze kerdê.

1927 di jew hondirawa yê Karin, "Clarté di" ame çapkerdeni û no hondirawa yê ci mîyanê gencan di rayê newe akardo. Qandê sîyasî (polîtîk) û qandê şexsî. No hondirawa (şîr) qandê gencan bî serwerzayeni.. Name yê hondirawa yê ci zî no bî "Rörelse" (Serwerzayeni). Karin BOYE hondirawa yê xu di, daran kerd bî xu rê sembol. Qandê Karin dar, tarî ra vîcyayeni roji bî. Jiyan û merdeni bî. Girtî bîyayenî û azadî bî. 1941 di menga Nisani di Karin BOYE bin jew dari di, meytê ci vînay. Vanê ki Karin, serda ra merdo. No vateni raşto ema nêy zî gerek merdim vîra nêkero ki, Karin bol îlaci werd bîyo û waştê xu bikşo. Yanî jîyanê xu ra eciz bî. Dima Karin merdi jew pirtûkê ci vînenê û o pirtûkê ci zî temami nêbîyo. Yanîm nîmçe bî yo. Name yê pirtûkê ci yê nîmçe no bîyo "7 döds synderna" (7 xeletê merdeni). No pirtûkê ci zî, name yê xu mîtolojî yê Yûnanî ra giroto.

HÊŞ I DANO



Êê, wûnî yo hêş dano çî wext gulovero nêakerde akeno
qandê çiçî yo o çax, bihar qeleşey keno
qandê çiçî yo o çax germey a hesretey a ma
grêdanê bi serdey a tamê Tûjey ?
qab bî gulovero nêakerde heme zimistani
çiçî yo newe, zey qedya yo û teqya yo ?
Êê, wûnî yo hêş dano çî wext gulovero nêakerde abêno
hêşî qandê çiçî beno gird
û çiyê yeno giroteni.

Êê, zehmeto çî wext gulovero nêakerde kewnê
lerzayen a tersey a gran, bî yo bar
teşşeno xu bi dari di, maseno, rijêno-
giraney a înan, îna anceno cêr û senîn înan xu teşşenê
zehmet o bêqerer bîyayeni, tersey a û parçe
zehmet o naskerden a anceyayeni kûrey û serd
fina zî, nêşiyayen û tenya lerziyayeni
zehmet o waştênî vinderdiş
û waştên, kewno.

o wextana o çax, her xirabo kes alîkarî nêkeno
zewqî qelişêno mîyanê yaqût û mircan di
gulover o bêakerde yê dari, zewq ra abêno,
zey mîyanê yaqût û mircanî di.

O çax tersey nêşeno xu teşşo,
mîyani jew biriqayayeni di kewno diropê (damle yê) dari
vîra kenê, senîn înan tersay newey ra
vîra kenê, senîn înan tersay sefer kerden ra
jew sanîye di hîs kenê, bawerî ya xu girdi di
zey wûca di dinya ameyo viraştayeni.

Welat geş dibe

Her tişt ji bo jiyaneke nuh!



Xwedî
Zübeyr Aydar

Berpirsiyare Gîşt
Abdullah Keskin

Berpirsiyare Nivîsaran
Mazhar Gûmbîr



Nawênkan
Bamnûşîp Sok
Yelaz Hûm No: 16
Kat: 3. No: 301
Çigaloğû / Istanbûl

Tel-Fax: 512 12 87

Mîrîskar
Mîqa Antec
Sara Akao
Evin Aydar
Ismail Beşliçî
Hatip Dîele
Mustafa Demîr
Hüseyn Demîr
A. Dîkilî
Dî Bîrîwîn
Ayteî Dîgîr
Abdullahman Dîrte
Ismail Gîldîr
Talat Inanc
Yasar Kaya
Amed Tîgîr
Fîqîr Hüseyn
Leyla Zana

Rojnameya
Holteyî

welat

derdikeve

Pirtûkên

Weşanxana Xanî & Bateyî

1. Masîvanê Kal û Masîyê Sor
PUŞKÎN
2. BÎLBÎL
H.C.ANDERSEN
3. Zimanê Çiya
HAROLD PINTER
4. STÊR
Rojnama Mîr Kamiran A. BEDIRXAN
5. Nivîskarekî Welatparêz E. Rehmîyê Hekarî
HAZIM KILIÇ

Navnîşana Xwestinê :

Weşanxana Xanî&Bateyî
Postboks 39
2660 Brøndby Str.
DANMARK